



Weşana
ENSTÎTUYA KURDÎ YA AMEDÊ
Kovara Dumehane
Hejmar - 20
Gulan-Pûşper 2008

Xwedî û Berpirsiyariya Nivisanan:
Semra OZBEY

Editor:
Enise Şirin ÇAGER - Azad ZAL

Sererastkirin:
Semra OZBEY - Serwet DENİZ

Mizanpaj û Berg
Enstituya Kurdi ya Amedê

Wênayê Berga Pêşin:
Koçer (Selmet Guler)

Şewirmendê Hiqûqê:
Av. Muharrem Erbey

Çapxane:
Berdan Matbaasi:
Davutpaşa Cd. Güven Sanayi Sitesi C
Blok No: 239 **Topkapı/İSTANBUL**
Tlf: 0 212 613 12 11

Navnîşan:
Kalem Sk. No: 32 Huzurevleri
DIYARBAKIR

Tlf:
(0412) 237 43 16

E-Mail:
kovaraw@yahoo.com
kovarawe@hotmail.com

WEB:
www.kovaraw.com

Şertên Abonetiye:

Nava Welat, salek: 25 YTL
Welatên Dereke, salek: 70 EURO

Banqe & Nimroya Hesabê:
Semra OZBEY
Türkiye İş Bankası 8300 Diyarbakir
YTL: 8300 195 27 89
EURO: 8300 071 16 47
USD: 8300 071 16 52

Nimroya Hesabê PTT'ê:
Semra Ozbey - 5426215

■ *Nivîsên ku ji bo
weşanê ji kovarê re
tên şandin, li
xwediyên wan nayên
vegerandin.*

■ *Her nivîskar ji
nivîsa xwe
berpirsiyar e.*

NAVEROK

■ Ji Edîtor.....	2
■ Di wêjeya osmanî de kurdekî serhişk: Nef'î / <i>Dilxwaz HERDEM</i>	3
■ Mêrdîn bi şev stêrk in / <i>Fewzî BÎLGE</i>	5
■ Qelî... û serê çivîkan / <i>Arjen ARÎ</i>	8
■ Refa şîn / <i>Receb DILDAR</i>	9
■ Mohra mirinê / <i>Behlûl ZELAL</i>	11
■ Xem / <i>Ronî War</i>	13
■ Xapînok / <i>Reyhan SARHAN</i>	14
■ Periyên çiyayan / <i>Halîl UYSAL</i>	15
■ Mirin / <i>Amed Çeko JIYAN</i>	17
■ V For Vendetta Guy Fawkes û anaşîzm / <i>Ferzan ŞÊR</i>	19
■ Gul û bilbil / <i>Oscar WILDE</i>	22
■ Mîrze û stî / <i>Ernest HEMINGWAY</i>	25
■ Ji Isaac Babel re rêzdarî / <i>Doris LESSING</i>	27
■ “Muzîka kurdi behreke bêbinî ye” <i>Heypeyîn: Enîse ŞÎRÎN – Azad ZAL</i>	31
■ Çemê Stewrê û Zelxo / <i>Feratê DENGİZÎ</i>	37
■ Jîn / <i>Selahattîn ÇAM</i>	41
■ Kengî mirim / <i>Tewfîk YAŞLI</i>	42
■ Tîr di dil de ji bîr bû / <i>Kamran S. HEDİLÎ</i>	43
■ Dilê min ne dîn e / <i>Rizoyê XERZÎ</i>	44
■ Êdî bes e / <i>Îlhamî OZER</i>	45
■ Serbûriyên te dixwînim / <i>Nesrîn NAVDAR</i>	47
■ Şanaz im bo dayikên delal / <i>Sîpan XIZAN</i>	49
■ Helbestên der barê gotinên pêşyan de / <i>Abdulkadir BÎNGOL</i>	50
■ Dengbêjek û stranek; Bavê Selah / <i>Evdirehman UMER</i>	52

BERHEMÊN KU DI PÊŞBAZIYA FEQÎ HUSEYN SAGNÎÇ DE KETINE DERECEYÊ:

Beşa Çîrokan

■ Em ê bi gora kalikê wan de birîn / <i>Dijwar ÎSKAN</i>	53
■ Dadweriya Xwedayî / <i>Şevger ÇIYA</i>	54
■ Bextewarî û Mirin / <i>Azad RONAKBAR</i>	56

Beşa Fablan

■ Merganê / <i>Rezoyê OSÊ</i>	60
■ Daristana bêqral / <i>Emîn SARI</i>	60
■ Mih û bizin / <i>Îdrîs GOKSUN</i>	63

Beşa Helbestan

■ Dilopek / <i>Şevger JAKAW</i>	63
■ Hebûn û tunebûn / <i>Xecê OMERÎ</i>	64
■ Netirsîn / <i>Welat DILKEN</i>	64

Ji edîtor...

Ji pêpelûka 20'an, ji rêçûna kurdewar a wêjeyî, berxwedana li hember têkçûna kovargerîya kurdî merheba, Xwendevanên hêja;

Em bi hejmara 20'emîn dîsa derketin pêşberî we. Kovara W(e) fêtleke din da xwe û berê xwe ber bi deryaya wêjeyê ya kurdî û ya dinyayê ve kiriye û her dimeşe... Her çiqas li vî welatî zagonên daristanî rewac bin jî, her çiqas ji çend hejmaran pê ve kovarên kurdî û kurdewar di temenê nîvco de bimînin jî; her çiqas ji aliyê nelihevkerinên navxeyî ve kovarên kurdî temendirêj nebin jî; her çiqas ji aliyê xwediyê zagonên daristanî ve kovarên kurdî bîn qurmiçandin jî; û her çiqas heman astengî û hewldanên ku pêşiyê li Kovara W(e) girtin hebin jî bi hejmara 20'an êdî ev fetlok hatiye derbaskirin. Em ê bi hêvî û aramiyê li benda gelek bîst-hejmarên din bin...

Xwendevanên me yên hêja,

Di weşangeriyê de hinek kêmasî û çewtî çêdibin, rexne û pêşniyar têne kirin. Ji bo me ev rexne û pêşniyar her girîng in û rîya me zelal dikin û her vedikin. Di hejmara 19'an de me ji ber sedema şaşiyên teknîkî hinek kêmasî kirin. Wêneyên rêzdar Lokman DAYAN bi çewtî li ser navekî din hatine weşandin. Wêneyên ku di rûpelên 3, 20, 44'an de hatine weşandin wêneyên Lokman DAYAN in, em vê kêmasiya xwe rast dikin û ji rêzdar Lokman Dayan û xwendevanan lêborîna xwe dixwazin.

Her wiha ji bo çend nivîsên din jî rexne ji kovarê re hatine. Li ser naverok û kesayetiyên ku bûne mijarên nivîsên Aram Gernas û ya Hilmî Akyol ji xwendevanên me rexne hatin. Em ji xwendevanên xwe re vê yekê dibêjin ku wekî ku me di hemû hejmaran de di rûpela yekemîn, beşa kunyeyê de diyar kiriye "Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e." Lê em viya jî bibêjin bi taybetî di çîroka bi navê "Kurmê şîrî heta pîrî" de "boşatî" bi tevahî wek kesên nebaş hatine xuyakirin. Ev yek hem ji derveyî niyeta me û hem jî ji derveyî niyeta nivîskar e û ne mumkun e ku em herêman jî gundekî xwe bi tevayî bi neyînî nîşan bidin. Ya din ji gelek herêman nivîs û berhemên wêjeya devkî têne şandin. Bêguman ne gengaz e ku em di der heqê her herêman û her dengbêjê de xwedî agahî bin. Ji ber vê yekê di nivîsên wisa de berpirsiyarî bi piranî dikeve ser milê yê/a berhevkar.

Xwendevanên hêja û delal,

Bi naverokeke xurtir û bi dosyeyeke taybet dîsa em dibin mêvanê dilê we yê kurdîhez, hiş û ramana we ya kurdewar...

Me di vê hejmarê de ji bo dosyeyê mijareke taybet hilbijart. "Di Wênekêşîya Dokumanter de JIYANA KOÇERİYÊ". Wênekêş Selmet Guler bi hunera xwe ya fotografkêşiyê çend sal di nava koçeran de xebata dokumenterî meşandiye. Li ser "Jiyana Koçeran", "Jinên Koçer", "Têkçûna Xeyalan" ên koçeran ji bo temamkirina vê dokumenterê nivîs nivîsiye.

Ji derveyî dosyeyê Dilxwaz HERDEM bi lêkolîna xwe ya bi navê "Di wêjeya osmanî de kurdekî serhişk: Nefî" Fewzî BÎLGE bi pexsana xwe ya bi çêj ya bi navê "Mêrdîn bi şev stêrk in" Arjen ARÎ bi çîroka xwe ya "Qelî... û serê çivîkan, Receb DILDAR bi "Refa şîn" Feratê DENGİZÎ bi "Çemê Stewrê û Zelxo" Behlûl ZELAL "Mohra mirinê" Ronî War bi "Xem" Reyhan SARHAN bi "Xapînok" dibin mêvanê we. Wênekêş û hunermendê warên azadiyê Halîl UYSAL "Pariyên çiyayan" Amed Çeko JIYAN bi "Mirin" Ferzan ŞÊR jî bi hêçana li ser "V For Vendetta Guy Fawkes û anaşîzm" rûpelên hejmara 20'an xemilandiye. Ji aliyê wergerê ve jî me ev hejmar xurtir kir. "Gul û bilbil" a Oscar WILDE "Mîrze û stî" ya Ernest HEMINGWAY û "Ji Isaac Babel re rêzdarî" ya Doris LESSING bi cihêrengiya xwe ciyê xwe vekirine. Ji bo Kovara Wyê Azad ZAL û Enîse ŞÎRÎN bi hunermenda navdar û dengzelal Aslîka QADIR re hevpeyvîna bi navê "Muzîka kurdî behreke bêbinî ye" pêk anîne. Bi helbestên xwe Selahattîn ÇAM, Tewfik YAŞLI, Kamran S. HEDİLÎ, Rizoyê XERZÎ, Îlhamî OZER, Nesrîn NAVDAR, Sîpan XIZAN, Abdulkadir BÎNGOL rûpelên kovarê xemilandine. Di beşa zargotinê de jî Evdirehman UMER li ser dengbêj Bavê Selah nivîsek amade kiriye.

Her wiha me cih da berhemên ku di "Pêşbaziya Feqî Huseyn Sagniç" a ku ji aliyê TZP-Kurdî ve hatibû lidarxistinê de ketine dereceyê.

Heta hejmara 21'an her bimînin di xweşiya wêjeya kurdî de...

Di wêjeya osmanî de kurdekî serhişk:

Nef'î

Dilxwaz HERDEM

Nef'î di sala 1572'yan de ji dayik bûye. Bi eslê xwe ji Hesenqeleya navçeya Erziromê ye. Kurd tê hesibandin. Bavê wî spahî ye. Ango leşkerekî xwedîmilk e. Ji ber vê jî derfet çêbûye ku perwerdehiyeke baş biqedîne. Bi taybetî wêje û zimanê farisî û erebî pir baş hîn bûye. Ji ber peywira bavê xwe derfet dîtiye ku têkiliyan bi qesra osmanî re deyne û di biçûkahiya temenê xwe de bikeve bin hîmayeya padişahên osmanî. Nef'î heta dawîya temenê xwe jî di bin vê hîmayeya padişahan (ev padişah: Ahmed I, Mustefa I, Osman II û Murat IV in) de maye.

Nef'î, mezintirîn helbestvanê hîcvê (helbesta rexneyî) tê qebûlîkirin. Di heman demê de baştirîn helbestvanê sedsala 17'an û tevahî wêjeya osmanî (bi gotineke din wêjeya klasîk, wêjeya dîwanê) ye.


Navê wî yê esasî Omer e. Di biçûkahiya xwe de dest bi helbestê kiriye. Helbestên wî yên peşîn jî xwerû rexne ne. Ji ber vê jî mahlasa wî 'Zarri' bû. Wateya vê peyvê jî 'zîrar û ziyan dayîn' e. Lê, dostê wî defterdarê Erziromê Gelibolulu Muverrih Alî ev mahlas guhert û mahlasa wî kire Nef'î. Wateya vê peyvê 'bi feyde' ye.

Nef'î helbestên xwe hem bi şêklê qesîde hem jî bi şêklê xezel nivîsandiye. Lê ew hostayê qesîdeyê ye[1]. Di qesîdeyên xwe de hem pesnê mirovên derdora xwe daye hem jî ew bi zimanekî tund rexne kirine. Tu sînor jî wî re tune ye. Di pesindayîna wî de mubalaxa pir zêde heye. Ango pesnek bêbingeh e.

Nef'î, di qesîdeyên xwe de gelek caran jî pesnê xwe dide. Lê balkêş e ku di qesîdeyên xwe de qet rexne (hîciv) li xwe nekiriye.

Zimanê Nef'î yê rexneyê jî mîna xwezaya Erziromê hişk û tûj e. Ji ber vê yêke zimanê hîcîva wî pir giran û bêrehm e. Mewkî û meqama tu kesî li ber çavan negirtiye û bi wî zimanê xwe yê mîna tîreke serjehr bi nava dilê wan xistiye. Gelek caran soz daye padişahan bo ku dev ji rexneyê berdê lê mixabin nikaribûye zimanê xwe bigire. Di soxîna de jî ber vî zimanê tûj serî daye.

Tiştêkî balkêş e ku Nef'î pêşî bavê xwe Mehmet Bey hîciv kiriye. Bavê wî alîkarê padişahê Qirimê ye. Lê li



Nef'î (1572-1635)

gorî dilê Nef'î pera naşîne ji wî re, lewre rewşa Nef'î pir xirab dibe. Li ser vê yekê wiha rexne dike:

*Ma bav e aceb an jî sirgûnê Xan e ez bizanim
Ne bav e ev belayek reş e li serê min*

*Peder mi aceb misâk Han'da mi bilsem
Peder değil bu bela-yi siyahdur başüma.[2]*

Nef'î, di demeke pir kin de helbestên pir pêşkêti dinivîse û digihîje mertebeyeke baş. Lewre di qesrên osmanî de zû ji xwe re cih dibîne û alîkariyeke baş ji wan dibîne. Ew rewş bala pir kesan dikişîne, li xweşa wan naçe û dibe sedem ku gelek kes bela xwe li Nef'î bidin. Yek ji van kesan helbestvanê hemdemê wî Şeyhulîslam Yahya ji bo ku pesnê wî bide vê çarîna bi rexneyî (hîciv) dinivîse:

*Niha di nava ew qas gotinxweşan de
Ma heye helbestvanek mîna Nef'î
Gotinên wî mîna muallâkat-i seb'an in[3]
Imre-ul kays xwe be kafir[4]*

*Şimdi hayli sühanveran içre
Nef'î menendi var mı bir şair
Sözleri seba-ı muallakadır,
İmre-ül kays kendidir kâfir.[5]*

Bersiva Nef'î pir balkêş bû. Bi gotineke sivik derbeyeke giran li hemdemê xwe Şeyhulîslam Yahya

dixist:

**Miftî efendî ji min re gotiye kafir
Ez ê jî, ji wî re bibêjim Misilman
Lê belê dema em bigihîjin roja mahşerê
Li wê derê em ê her du jî derkevin derewîn.**

*Müftü efendi bize kâfir demiş.
Tutalım ben O'na diyem müselman.
Lâkin varıldıktan ruz-ı mahşere,
İkimiz de çıkarız orda yalan."*

Dîsa, wê demê kesek bi navê Tahir Efendî ji bo Nef'î dibêje kelb angos kûçik. Nef'î bersivê pir zarîf dide:

**Tahir Efendî ji min re gotiye kûçik
Îltîfata wî di vê gotinê de eşkere ye
Ji xwe mezhebê min Malikî ye
Li gorî baweriya me kûçik tahir e**

*Kelb demiş bize Tahir Efendi;
İltifadı bu sözde zahirdir.
Maliki mezhebim benim zira;
İtikadımca kelb tahirdir.*

Yek ji wan kesên ku zêde zêde bela li Nef'î daye jî Mehmet Paşayê bi eslê xwe gürçî ye. Nef'î bi zîmanekî tund û bi zîmanekî jî helbestê dîr bersiv dide. Ji bona wî peyva 'kûçik' bi dehan caran bi kar anîye. Kî nê nefretek bi eşkere li holê ye:

**Berazê gürçî, kûçikê xwerû jehr
Tu li ku yî li ku, nobedarê alemê ey kûçik!**

*Gürçü hunzırı a samsun-ı muazzam a köpek
Kande sen kande nigehbani-i alem a köpek
... ..*

**Tu kerê bêesil, ew orispiya qirêj li te tê
Ku li piştê te siwar bike, te pê teşhîr bike kûçik**

*Sen soysuz eşek ol kirli orospu yaraşur
Bindürüp sırtına teşhir edersem a köpek*

Neyar û dijberên wî carna jî êrîşî kurdûna wî dikin û wî weke dijminê ûlemayê nişan didin:

**Nef'îyê rûşê çî be em tev dizanin
Ew bi xwe qereçî ye lê bavê wî kurdê rezîl
Niha wê Resulê mezin jî bizanibûya nefreta te
Berazê dijminê ulemayê yezîd kurê yezîd**

*Nef'î-i rûsiyehin niyduğünü hep bildik
Kendi çingenedir amma babası kürd-i pelid
Şimdi bilirdi dahi Âl-ı Rasul'ün buğzun
Ullema düşmeni hunzir yezid ibni yezid*

Me di sernivîsa xwe jî de jî bo Nef'î gote kurd e; çimkî çavkaniyên heyî wîsa dihesibînin. Li vir em

nikarin îdîa bikin ku Nef'î kurdûna xwe parastîye yan na. An jî em nikarin bibêjin sedî sed ew kurd e. Çimkî peyva "kurd" di wê demê de gelek caran bi wateya "diz, xirab hwd." têtê bikaranîn. Peyva "kurd" û peyva "qereçî" bi wateyeke nêzî hev hatiye bikaranîn. Gelek romanên ku bi mijarê dîrokî hatine nivîsandin jî bi vî awayî nêzî bûne. Ev mînak helbestê ya li jêr jî vê nêrîna me nişan dide:

**Em têgihîştin ku dawîya zemên hat
Merhametê xwe vekîşand çû asîmanan
Heçî xwedî hêz dişêlîne yê ku bikariyê
Papak ne diyar e kurd ne diyar e**

*Fark eyledik âhîr vaktin yettiğîn
Merhamet çekilip göğ'e gittiğîn
Güçü yeten soyar güçü yettiğîn
Papak belli değil Kürt belli değil*

(Âşık Ruhsatî)[6]

Dema ku mirov behsa Nef'î bike divê ku tîkiliyên wî yên bi padîşahê osmanî Muratê IV. re jî binê zîman. Tîkiliyeke xurt di navbera her duyan de heye. Pir samîmî ne. Padîşah, ji bilî carekê her dem li Nef'î xwedî derdikeve.

Nef'î, bi zîmanê xwe yê tûj dihat nasîn, bi wî zîmanî kete qesra, bi wî zîmanî debara xwe kir, bi wî zîmanî dost û dijmin jî xwe re çêkir û bi wî zîmanî dawî li jiyana xwe anî. Ew padîşahê ku her dem li wî xwedî derdiket, bi tenê carekê neqencî lê kir: Fermana daliqandina wî da.

Piştî mirina wî pir tişt hatine gotin û nivîsandin. Lê ya Tevfîk Fîkret jî tevan watedartir e:

**Tu wîsa, weke çemekî mezin bi coş bûyî
Lê, heywax, tu cihekî dêm re herikî û derbas bûyî**

*Öyle, bir nehr-i muazzam gibi cûş etmişsin;
Fakat, eyvah, çorak yerde akıp gitmişsin!...*

Nef'î, bi bavê xwe dest bi hîcvê kiribû bi celadê xwe dawî li hîcvê anî. Kî dizane? Heye ku li wê dinê jî berdewam bike...

Tebînî _____ :

[1] Helbesta pesn û rexneyê

[2] Resimli Türk Edebiyatı Tarihi-II, Nihad Sami Banarlı, sf. 660

[3] Muallâkat-ı seb'â: Heft Qesideyên meşhûr ên helbestvanên ereb ku berî Îslamê li dîwarê Kabeyê hilavistî. Hêjayî gotinê ye ku ew qesideyên hanê pir hatine ecibandin.

[4] İmre-ül kays: Helbestvanê meşhûr ê ereban e. Yek ji helbestvanên ku muallâkat-ı seb'â ye.

[5] Türk mizahı ve hicvi, Ferit Öngören, Türkiye İş Bankası Kültür Yayınları, sf. 147

[6] Başlangıcından günümüze Halk şiiri, Âşık şiiri, Tekke şiiri, Dr. Mehmet Yardımcı, sf. 282

Mêrdîn bi şev stêrk in

Fewzî BÎLGE

Diyarî ji bo Murathan Mungan

Piştî sih salî, sih salên weke şevên zivistanan dûr û dirêj hatibûm bajarê xwe. Divê min hêza xwe tev bida hevdu, wêneyên bajarê xwe -yek li ber tava rojê, yek li ber tava hîvê- biwênanda. Weke wênesazên empresyonîst ku bê çewa bi çavdêriyên xwe yên her kêliyê li ser surîştê, ew kêliyên ku her dem dikarin biguherin bifirin û herin zeft dikirin. Divê min jî roniyên her kêlî diguherîn -sî dibûn ronî, ronî dibûn sî- dikaribûya biteyisanda ser tuwalên xwe.

Weke: Degas, Sisley, Renoîr, Cezanne... wan dilên xwe rihet kiribûn, çi tişt û derên jê hezkiribûn bi efsûna roniyê, reng û hestan weke efsûnbazan wênan dibûn. Min heya niha her di kargeha xwe de wêneyên xwe wênan dibûn. Min heya vî temenî bi helwesteke empresyonîst tu car wêneyek newênan dibû. Divê min biwênanda, divê min ji yê wan bedewtir û şêrîntir biwênanda, ji ber ku Mêrdîn bedew bû. Ji ber ku Mêrdîn şêrîn û nepen bû. Ji ber ku Mêrdîn bajarê xewnên min ê xweş bû. Ev sih sal bû, di bîra min de ji bîr nebûbû.



Û di bêriya xwe de min bêrî kiribû.

Gelo min şovaleya xwe li ku bi cih bikira wê baştir bûya. Li Çarşiya Ga, li ber deriyê Dêra Fila, an li serê pozê keleha weke zozanan. Berê yê bi şev an yê bi roj...

Bi roj Mêrdîn gerdeniyek zêr, li ber tava rojê arekî li ber bê ku çirûsk jê dipekin, weke teyrên tawizekî spî ku perê xwe vekiribe û dabe tîna tavê, nizanim. Bi şev Mêrdîn stêrk e. Rêya kadizkê ye carna Mêrdîn. Rûyekî nepen e...

Îro di awênayê de min li rûyê xwe nihêrî. Rûyê min rûyê xwe ji min direvand. Ew qasa zû pîr dibûm, ewqasa zû rih û porê min sipî dibûn ku êdî di awênayan de min xwe nas nedikir. Rûyekî ji bajarê xwe têr nebûye, çûye. Rûyekî ji dîlan û stranê xwe dûr jiyaye. Rûyekî bi qasî qermîçokên kûr ketinê kûr. Du çavên ji zarokantiya xwe têr nebûne, rûyekî tu

car weke lehengên çîrokan jê nehatiye hezkirin.

Weke bavê "Ayşegul pîknîkte" bi bavê xwe re neçûye pîknîkê. Hezkirinên bavên me ne wihan in.

Rûyekî "Findiqek ji darê hate xwarê", "Sindrella", "Dara hewrê", "Tomîks Teksas", "Zagor", "Robîn Hood", "Robînson Cruse", mirovên li kolanê "Madame Bovary", "Qîza Yuzbaşî", "Partîzan Nadejda" bi zimanê xwe nexwendîye.

Rûyekî ji tîrsa mamosteyê xwe, bi dêya xwe ya bi tîpek tenê bi tirkî nizane re, bi tirkî peyiviye. Ji tirkî enitiye û çend sond xwariye.

Rûyekî dişibe Mêrdîn... Bi şev Mêrdîn stêrk e. Bi xaniyên kevirê spî û neqîşandî, dûmenên ji dilê dîrokê reviyayî, bi bêhna xwe ya nepen, bi rengê mirovên xwe yên esmer, Mêrdîn bi şev esmer e. Weke "labîrenta pan", kolanên wê yên teng, bêhna lewanta, qaqule, kuncî, şekirê behîvên Mêrdînê ye, Mêrdîn.

Sewta ji paceyan tê ye carna Mêrdîn, paceyên bi tenteneyan nixumandî, sewta Ferîd El Etreş, Ummu Kulsum, Feyrûz, Evdîlhelîm Hafîz, Ezîze Celed e. Carna Kawîs Axa, Mihemed Arîfê Cîzrawî, Meyrem Xan û Mihemed Şêxo ye. Mekanê cin û perîyan, carna yê şoreşgeran, carna yê qîzîkên bêrîvaniyan e ku cara yekem diçin bajêr diranên xwe zêr bikin. Carna di xortaniya xwe de pirtûkên weke esrarê zû nedihat dîtin yê Lenîn Gramscî, Marx, Engels, ku bidîtaya bi dizî dixwend bû Mêrdîn.

Mêrdîn cihê ku mirov li evînê diqewime, li rastiyê diqelibe û di rastiyê de diqewime ye.

Bi şev Mêrdîn stêrk e. Gerdeniyeke mircan, bişîrîneke şêrîn, xewneke xweş, ramûsaneke germ a qîzîkek file, suryanî keldanî, yêzîdî, kurd an jî ereb e Mêrdîn.

Bi şev Mêrdîn stêrk e. Bi şev Mêrdîn çîrokên di zarokantiya min de ku bi hezaran car min guhdarî kiriye ye. Bajarê mala bavê "Meyrema Zinarî", çiyayên spî bajarên bav û

waran e Mêrdîn.

Mêrdîn bajarê gulîsora bavê min e. Cihê ku bavê min ew jê revandîye ye. Bavê min mêr bûye. Mirin daye ber çavê xwe û dêya min revandîye. Ji hevdu gelek hez kirine, berê ji zimanê hevdu fêr nekirine. Dîsa jî ji hevdu hezkirine. Bi lez û bez fêrî zimanê hevdu bûne, zû bi zû fêrî durikên hevdu bûne, heya û bi heya ji hevdu hezkirine. Ji zimanê hevdu, ji merivên hevdu, ji zarokên xwe hezkirine. Mêrdîn bajar e. Bajarê ku mirov jixweber fêrî erebî, kurdî, ermenîkî, suryanîkî, keldanîkî dibe ye.

Bavê min mêr bûye, ji Tîmûrlengê kut, ji serokê moxolan ên tîrsehêz mêtîr bûye. Tîmûrlengê kut bi kuştinên xwe yên hovane, bi dagirkerî, serdegirtinên xwe navdeng bûye. Tîmûrlengê kut ku qaşo sînore welatên xwe bi zora hikmê, bi kuştinan ji Wolgayê heya welatên farîsan, ji Ganjê heya welatê yewnanan tev de stendiye, lê nekaribûye qîzîkekî ji Mêrdînê birevîne.

Bavê min revandîye. Jê hezkiriye, ji hevdu hezkirine bi şevan ranezane, bi salan li benda hevdu sekinîne, nezewicîne, hevdu revandîne, xwe avêtine bextê hezkirinê.

Mirov li Mêrdînê jixweber durikên erebî, kurdî suryanîkî, ermenîkî jiber dike. Mirov jixweber ji Melekê Tawîz, ji Îsa, Mûsa, ayet û sûretan hez dike.

Mirov li Mêrdînê, ji tîrsê netîrsbûnê fêr dibe. Tîrsa cendirmeyên mirov li ser rê radiwestîne û devê tîvingê dide singa bavê mirov e Mêrdîn. Cumek benîştê Elkê, di nava destmala xwişka min de, qutiyek çaya Seylanê ya qaçax di paxila dêya min de veşartî ye. Çend kîlo titûna Xursê, çend kîruse pelên cixarê yê binya xetê, di nava qumatka birakê min î biçûk de veşartî ye Mêrdîn. Mêrdîn bajarê zarokantiya min, xortanî û xewn û xeyalê min e. A niha dixwazim bibe rengê min xeml û xeyalên min. Mêrdîn bajarekî kevn e. Rûyê min roj bi roj dişibe Mêrdînê. Rûyê min weke Mêrdînê kevn dibe.

Îro di awêneyekê de min li rûyê xwe nihêrî.

Rûyê min li min nedinihêrî. Rûyê min, rûyê xwe ji rûyê min diguherî. Ew qasa zû pîr dibûm êdî min jî xwe nas nedikir.

Mêrdîn bajarekî ku kî bibîne careke din nikare jê biqete û ji bîr bike ye. Ez jî jê neqetiyame, ev sih sal in ji Mêrdînê dûr jiyame. Mêrdîn nivîs û wêneyê min e. Min Mêrdîn di bîra xwe de xwedî kiriye, min di bêriya xwe de bêrî kiriye. Mêrdîn weke pinpinîkeka li serê pozê tivinga şervanekê daniye nazenîn e.

Nedibû... Di her du wêneyên min de jî pirsgrêkek hebû. Ne weke xewnên min şêrîn, ne weke xeyalên min xweş, ne di hêza bêrîkirinên min têr bikirina de bûn.

Di wêneyên min de bêhnek, çêjek, renek, hestek, xêzîkek şewqek, an siyek kêmbû. Lê çî bû min nizanibû. Bi roj, bi şev li ser wan xebitibûm. Min bajar ji nû ve bêhn kir, min bajar li bin guhê hevdu xist, min ew pirsgrêk nedît. Belkî jî min ew gulîzera xwe, tu tiştêkî evîna xwe ya yekemîn di wêneyên xwe de bi cih nekiribû. Belkî tiştêkî din bû, ez dibêim bêhna wê jê dihat, ezmanê bajêr min di rengê çavê wê de çêkiribû, lêvên wê di rengê qere-siyên pala Mêrdînê de bûn. Porê wê di rengê guwîjan de û rûyê wê weke berfa serê çiyayên wê, bejna wê darên hewşên derdorê, na na tiştêkî din bû. Bi şev Mêrdîn stêrk bû... û min di wêneyên Mêrdînê yê bi şev, bi stêrkan mişt dagirtibû. Yên bi roj di rengê zêrê Mêrdînê, genimê sorgul, zerê titûnê, keskê kevza kaniyên wê jî bîr nekiribû. Lê tiştêk kêmbû.

Mêrdîn neqş e! Min ê çawa biwênanda? Divê bêhna şekirê qulpik û behîva, bêhna gijnjî, kuncî û qaqlê jê bihata, divê di tehma helawa Emo Rido û di şêrînbûna dimsa Eqres de bûya. Divê bêhna dîrokeke kevna û weke xaniyên çîrçîrokên di zarokantiya me de di-

hatin vegotin bûya Mêrdîn. Weke bajarên li ser çiyayên spî yê bajarê mala bavê Meyrema Zinarî bûya Mêrdîn.

Mêrdîn zinar e! Divê bêhna şervan, nivîskar û wênesazan, dengbêj û reqasa jê bihata. Divê bêhna kêf û eşqê, tehma xem û kula jê bihata.

Ev çend roj in bi wan dilebikim. Çênabe! Her tişt min tê de bi cih kiriye, lê tiştêk jê kêmbû. Nabînim napeytînim, bê ew çî ye. Çî jê kêmbû? Ku yê bi şev nabe stêrk naçirise, yê bi roj nabe zêr nabirîqe. Divê min hinek din zor bida bîra xwe. Min çî jî bîr kiribû? Çî li hevdu nekiribû, min nizanibû. Min di wî halê xwe de herdu wêneyên xwe qedand û çûm. Bê mahd û rûaliqî min paşê xwe dabû stêrkan û çûbûm.

Cihê ku lê dijiyam min rast berê xwe dabû dostê xwe yê rexnegir û herdu wêneyên xwe pêşî wî kiribûn. Wî dûr û dirêj lê nihêribû û gotibû: "Te li xwe zêde kiribe jî dema te ew her du wêneyên wêneyên tu ji empresyonîstan hezidiye. Ji ber ku ruhê mirovên hezdok di lutkeyan de digere, danakeve rastiya xwe te xwestiye tu ji wan bibihurînî, tu li xwe mikur nehatîyî, ew rastiyeke e hunermendan e. Ji hevdu dihezidin! Ew tiştêkî rewa ye. Bengiyek e hezidandin, bengiyek e eware ye, ku eware digere. Ji berdêla ku tu zorê bidî xwe, tu hezidiyî. Tu hêrs bûyî, wek mirovekî ku ne bedew, yekî xesandî, pîr, an piçekî hezidiye. Her du jî nebûne! Di wêneyên te de tiştêkî girîng kêmbû maye. Te ew jî bîr kiriye. Bêhna te jê kêmbû. Ruhê te tê de tune ye. Li ber nekeve bi qasî ku ez te dinasim tu yê dîsa biçî, tu mirovekî hezdok û eks î, ger tu vê carê çûyî û te bajarê xwe wênand bila bêhna te jê bifûre. Nebûye, her du jî nebûne."

Qelî... û serê çivîkan

Arjen ARÎ

Rezê Birhîmo qonaxek rê bû ji gund.

Ez ê delaliyê malê li ser kerê, dapîr û kalê min li her du tengalan; tu li ku rezê Birhîmo li ku, sihara zû me ji gund dida rê. Çavên min î wê gavê bi ser rengê binevî ve, hima bêje venedibûn ji xewê. Kalo, zanîbû ku ketina ji kerê pîs e, hima bêje heta serê rêz destekî wî bi min ve dima. Ma pêşyan belasebeb gotine, 'nevî ji kur şîrîntir e?' Kaloyê ku ji kêra xwe yî Midyadî pê ve dikarî canê xwe bide min, ku em dihatin serê rêz ji kerê boz re digot, 'Şooşş!' û bi sekna kerê re ez hildidam hembêza xwe!

Xweda heye, ne kêra Midyadî bûya, tu carî dilê min û kalo ji hev nedima. Lê dema ku mesele dibû kêr; ne destê kalo ji kêrê dibû û ne dilê wî ji min. Dapîra min î dotmama wî, gelek caran di guhê min de bang dida:

- Delalê min, kêra kalê te mû dibire. Ditirse ku tu li destê xwe bixî. Her serê bîstikekê kêrê mexwaze, kurê min!

Min bi ya pîrê nedikir! Kêra kalo li min bûbû gir. Her serê kêlîkekê min tiştê dikir mahne, berûpê diçûm, diketim hembêzê...û bi berger min digot:

- Kalo, ka kêra xwe lo...

Dema ku em digihan serê rêz roj di serê çîyan re radibû qamê.

Wextê miştaxeyan bû.

Mîna ku seferberlik rabûbe, mîna ku gurê manço dadabe gund, gundînan nava rezan kiribûn mal;li binê holikên hêthîşkeber û ser bi darikên mêwan û çilo nixumandî, radizan ...

Di vê demsalê de dikê nav rezan kewên gozel bûn.

Bi tîrêjen rojê re yê ribat ji ribatan re, yê serdarî ji serdaren re dixwendin... Li tevî mirovan kew jî bitir bûn di vê demsalê de. Li nava rezan mêw mêw tirî: hesenî, reşik, kerkûş. Hindik mabû ku bîhok di şaxên xwe de bişibin hinarkên zarokên boz. Jixwe hejîrên bejik, ên zer ên reşik axa Xweda bûn. Şax û terhên mêwên mişt tirî, mîna teyrê li ser hêlînê lûsî per û bask berdabin erdê; fitlo fitlo bi axa sor şa dibûn! Wê siharê jî kalo di lingê lingdan de şaqûl vedabûn. Herî pir li ser darhejîrên li biniya rêya Bizgûrê. Her ku qîjqîj ji wê hêlê de hildihat, kalo bi navtêdan digot:

- De heryê ha! Şaqûlê bi yekî din jî veda.

Di ber karê miştaxê re, şuxlê min çîrvîtik bûn. Mîna karîkekî li dû makê têrşîr, rebî; ne sekî li min hebû ne hedan! Kalo, ez jî hînî vedana şaqûlan kiribûm. Ma çi bû? Darikê çilpandî min dixist serê tê û min hejîreke rojlêdayî dixist serê dêr... Heta navrojê bi qasî ku çar pênc kes têr bixwin, çivîk di bin axa sor de dibûn embûr.

Ekla mêrga goştê çivîkan ji wan deman de di bin zimanê min de ye. Diya min î xweşdezgeh - herî pir nanê wê yê tenûrê- çivîkên ji post û periyên kirî, dixistin nava beroşa di teniyê de mayî, têra ku bikele av berdidayê û di tifikê de bi cih dikir.

Hinkî ku pifî êgir dikir, carinan kuxikek lê miselit dibû, ew bû ku nedifetisî. Di wî halî de jî, xesûya jênerazî, bi tinazî bi ser de hêrs dibû:

- Ma çawa bû, Wesîlaaa?

Diya min î wê gavê jî mîna niha xişn, tembî û qewîtiya bavê min kiribû guhar; bédilmayîn, bi siyanet ev lê vedigerand:

- Pê ket jinapê... pê ket!

- Çi pêketin û çi hal!

Bavê min çeqmaqê xwe yî muxtaran ji berîka êlekê xwe derdixist, ji cihê xwe hol dibû, bi bayê bezê diçû bi hawara diya min ve.

Di wê kêlîkê de kalê min î kal î liserxwe, li bin siya holikê pişt spartî dîwarê ji hişkeberê, di ber xwe de ev digot:

- Qelî... û serê çivîkan?!

Refa şîn (*)

Receb DILDAR

Gava ew di nav xwe re kirin û ji derî derxistin, xemgîniyeke giran xwe bera ser canê min da. Kelekela dilê min bû, lê ji fediya nedibû ku ez bigirîm. Min nizanibû, wê ewqas ji min re giran bihata. Roja yekşemê bû, zar û zêç tev de li malê bûn. Ez derbasî odeya din bûm, min bîstekê xwe da ser kursiyekî û kûr kûr ponijîm. Paşê, min hew xwe girt, ez çûm, derketim ser balqonê û min bala xwe da jêr. Ew li erebê siwar dikirin. Demekê min li wan temaşê kir, kizîni bi kezeba min ket. Serê payizê bû, germa tirî dest pê kiribû, tava berêvarê canê meriv dişewitand. Di wê demsalê de Diyarbekir zêde germ bû. Tava tûj li nava qotê serê min dixist. Min li wir hew debar kir û ez dîsa derbasî odeyê bûm.

Tam ev 30 salên wê qediyar ku li mala min dima. Di nav van salên dirêj de me bi hev re gelek rojên xerab dîtîn, me bi hev re gelek qehr û qotikên dinyayê kişandin. Birînên me bi hev re ragirtin û êşên birînên me bi hev re jan dan, bi hev re çik dan. Kitêbên me yên pîroz li ber çavên me avêtin nav lingan û şewitandin. Û paşê ew bû şahidê kelepcayên qevdên destên min jî. Me bi hev re rojên xweş jî dîtîn: Roja ku min kitêbek nû bistenda li malê kêf û şahî bû. Hevalên min hevalên wê jî bûn, mêvanên min mêvanên wê jî bûn. Ji xwe kî bihata mala min pêşiyê diçû cem wê û ji min zêdetir dibûn dostên wê.

Min di sala 1976'an de xwendegeha mamostetiyê qedand û dest bi karê mamostetiyê kir. Hîna gava ez xwendekar bûm, min soz dabû xwe ku ez ê bi mehaneya pêşiyê ji xwe re kitêban bistînim. Min ew stendin, lê ji bo ez wan deynim serê, tiştêkî min tune bû. Wê gavê, wek aniha ji bo kitêban refên hazir tune bûn. Ez li benda meha din sekinîm û piştî wergirtina meaşê wê mehê min berê xwe da Çarşiya Xeratan.

Gava meriv ji heda Minareya Çarling berê xwe dide bakur û Çarşiya Hedadan derbas dike digihîje Çarşiya Xeratan. Dikanên xeratan li paş Çarşiya Zêrkeran bûn, bi piranî ji bo qahwexaneyan kursiyên biçûk û ji bo malan derî û pace çêdikirin. Ez ketim hundirê dikanekê û min daxwaza xwe ji xerat re got. Xerat yekî simbelbaq bû, te digot qey meqes li simbelê wî neketiye. Bi



baldarî serapa li min mêze kir, ez li mêzînê xistim, û paşê bi dengêkî jixwebawer peyivî:

- Xwarzê, eger tu rastiyê dixwazî heta niha min ji bo kitêban tu ref çenekirine, lê ji bo firaq û folên metbexê min gelek ref çêkirine.

Min qelem û kaxizek ji berîka xwe derxistin, şekil û şemalê refê li ser kaxizê xêz kir û min jê re wisa got:

- Bila refa min sêtebeq be, dirêjiya wê metroyek, firehiya wê 80 cm û pahnûna wê jî 25 cm be. Paşê me li ser buhayê refê jî li hev kir û ez derketim çûm.

Wê şevê bi zorê li min bû sibe. Roja dinê ez çûm min refa xwe li erebeyeke hespan kir û ew anî malê. Di hewşa mala me de keviyek ji erdê çokek bilind û ser wî dûz hebû, mezinên me ew kevir ji bo limêjê bi kar dianîn. Min refa xwe danî ser kevir û du qat boyaxa şîn a bi don lê xist, piştî ku zuha bû min ew di diwarê odeya xwe de bi cih kir û kitêbên xwe yeko yeko tê de rêz kirin. Ji ber rengê wê boyaxê, di nav malê de navê wê êdî bûbû 'Refa Şîn'.

Gava ez ji kar dihatim û çav li Refa Şîn diketim di gavê de bihna min derdiket. Min qîrewîra zarokên xwendegehê, betilandina rojê tev de ji bîr dikir. Carna ez bi saetan li hember wê disekinîm û min lê temaşê dikir. Min her roj kitêbên xwe bi tewrekî din rêz dikirin. Carna li gora mijarên wan, min kitêbên Marx, Engels, Lenîn û Stalîn di qata jor de rêz dikirin. Kitêbên li ser rizgarbûna miletên bindest ên wek Vîetnam, Angola, Etopya, Gîne, Filîstîn û Baskê li qata navîn rêz dikirin û roman, kitêbên çîrok û helbestan jî li qata jêr rêz dikirin.

Carna min kitêb li gora stûrbûna wan ji jor heta jêrê rêz dikirin. Carna jî kitêbên min dixwendin dixistin qatekî û yên ku min ew nexwendibûn dixist qateke din. Heta ku Refa Şîn tije bû cih tê de nema min kitêb lê zêde kirin. Her ku kitêb lê zêde dibûn xemla Refa Şîn jî zêde dibû. Refa min bûbû wek bûkeke xemilandî, bêhemdî dilê meriv dibi-jjiyayê. Kî têketa odeyê pêşiyê diçû li ber wê disekinî. Gava min ji wan re digot:

- Hela werin, hinek bihna xwe berdin, hûn ê paşê lê binêrin. Wan digot:

- Em pêşiyê çavên xwe ronî bikin, rûniştin rihet e.

Ji ber ku qedexe bû, wê gavê kitêbên bi zimanê kurdî tune bûn. Ên dihatin çapkirin jî dewletê dest dida ser wan. Li cem min bi tenê du kitêbên kurdî hebûn, yek jê Mem û Zîna Ehmedê Xanî, ya din jî Elîfbaya Kurdî ya Mehmet Emîn Bozarslan bû. Paşê kitêbeke Cegerxwîn bi navê Şefeqa Lenîn hat çapkirin. Him ji ber ku bi rihetî peyda nedibûn, him jî ji bo nekevin destê dewletê û ceza li min nebirin, min ew nedixistin nav kitêbên din. Min her du di odeya pîrika xwe de vedişartin.

Di sala 1979'an de hikûmatê dest bi desthilatdariyeke awerte kiribû. Di rojeke ji wan rojên payîzê de, polêsan ber destê sibê avêtin ser mala me. Her çiqa kitêbên bi zimanê tirkî qedexe nebûn jî, polêsan hemû kitêbên min li naverasta hewşê avêtin ser hev û agir bi wan xistin. Bi kitêban re agir bi kezêba min jî ket, lê çek di destên wan de bûn û qeweta min nedigihîşt wan. Piştî wê rojê her ku çavên min bi Refa Şîn diketin, min nalet li zaliman dianî. Gava li xwendegê me ji zarokan re digot; hezar sal berê, du hezar sal berê falan hukumdar kitêbxane şewitandine, ji me bi xwe re jî ev tişt wek çîrok dihatin. Lê me nizanibû ku em ê vê yekê bi çavên serê xwe bibînin. Hemû xemla Refa Şîn jê biribûn, bûbû wek dareke bêpel, wek kevokeke baskîkestî, kaniyeke bêav. Li ber çavên min bûbû wek mirîşkeke rûçikandî. Di wan rojên reş de, ji bo çav lê nekevim, heta ji destê min dihat, ez nedîçûm wê odeyê. Paşê min dîsa dest bi stendina kitêban kir û Refa Şîn hêdî hêdî gihîşt xemla xwe ya berê. Bi her kitêba nû re, bejna wê ji nû ve xemilî. Te digot qey keçeke nûgihîştî ye û hin-arokên rûyê wê roj bi roj sortir dibin.

Di nav re salek derbas bûbû, îcar karesat mezintir bû. Eskeran derbe kiribûn û ew bi xwe bûbûn desthilatdar. Serê sibeya derbeyê, eskeran dora taxa me girtin û çûn û hatin qedexe kirin. Mala me li Elîparê bû, ji ber ku tax li derveyî bajêr bû, em tê de girtî mabûn. Me nikaribû, em bi cihekî ve herin. Kitêbek dikaribû bibûya sebebê ku meriv

bi salan bêsewal di hepisxaneyan de bimîne. Ji ber vê tirsê li Elîparê wê sibê gelek tendûr hatin dadan. Ji wan tendûrvanan yek jê jî dêya min bû. Wê rojê hemû kitêbên ku Refa Şîn ji wan re bûbû dayik dîsa hatibûn şewitandin. Ne bi dilê min bû lê min nikaribû bigota 'na' jî. Piştî ku ba û bahoza mezin derbas bû, min dîsa dest bi stendina kitêban kir. Wechê Refa Şîn û bi wê re wechê min jî ji nû ve geş dibû. Vê demê jî du salan ajot.

Dîsa payiz bû û dîsa polês hatin. Îcar ne tenê kitêb birin, destên min xistin kelebçeyê û ez jî tevî kitêban bi xwe re birim. Cara yekemîn bû ku ez û Refa Şîn ji hev diqetiyên. Salên girtîgehê bi kotek, lêdan û hezar tewir îşkenceyan derbas bûn û ez dîsa vegeyriyam malê. Min mêze kir ku Refa Şîn, wek evîndareke ku li benda hevalê xwe be, wek kulîlkeke ku li benda biharê be, ew jî li quncikekî odeyê stûxwar li benda kitêbên xwe sekiniye. Zarokan hûrik û girikên xwe tê de bi cih kiribûn. Piştî ku min ji xwe re karek dît, hevaltiya min û Refa Şîn dîsa dest pê kir. Her êvar gava ez dihatim malê, xemla wê zêdetir dibû, her kitêbek jê re dibû wek xêliya bûkekê. Di nav salekê de kitêb li hev zêde bûn û Refa Şîn bû wek bûka salê. Her diçû meraqa min a xwendinê wek ku tu kevirekî bavê golê û xelekên li dora xwe fireh bike, pêşî lê nedihat girtinê, ji ber wê êdî Refa Şîn têra kitêbên min nedikir. Min odeyek xwe kir kitêbxane, lê min dev ji Refa Şîn berneda. Dîsa ew di quncikekî kitêbxaneyê de mêvana min bû. Min tiştên xwe yên taybet tê de bi cih dikirin û bi wî awayî tim li ber çavên min bû.

Îsal keça min jî dest bi karê mamostetiye kir û tayina wê dan navçeyê Diyarbekirê. Gava ji bo mala xwe alav amade dikirin ji min re got:

- Bavo ez ê Refa Şîn jî bibim. Min ew neşikand û got:

- Bila be keça min, tiştên tê de ne vala bikin.

Heta ew derxistin jî, min maneya gotina xwe fam nekiribû. Gava xemgîniyê xwe bera ser canê min da û ez di nav rojên berê de gevizîm, hîna nû min fam kir ku meriv zû bi zû nikare dev ji dostanî û hevaltiyên kevn berde.

Ji bo xatirxwestinê gava keça min hat cem min, xemgîniya min û du dilop hêsirên çavên min dît. Xwe avêt stûyê min û bi dengêkî şêrîn got:

- Wey, hela lê binêrin, min nizanibû wê bavê min ew qas li ber çûna min bikeve.

(*) Ji dosyeya Şikefta Xwekustînê

Mohra mirinê

Behlûl ZELAL

“Kuro ma ku ne mîna zarokan bûya, têkilî bi Mihoyê beredayî re datanîn! De ka binêhêre ji xwe re, li vî gundî nêzikî sed malî hene. Di her malekê de bi kêmasî du sê mêr hebin, ev dike dused, sêsed mêr. Heke ji van hemûyan, ji Mihoyê beredayî bênamûstir kesek hebe, rûyê min tenî bikin. Yan na ev çi kar e ku tîndî gundekî mîna vî gundî de mirovê herî qels ji xwe re dikine qublet.”

Mamoste Serdar, ji gazine û gotinên Apê Derwêş westiyabû. Apê Derwêş, her roj bi bûyere û gotineke nû dihat cem wî. Hêrsa dilê xwe, xemgîniya xwe yek bi yek jê re vedigot:

Ez ji te re dibêjim ku ev zîlam ne yê xêrê ye, bi kêrî tiştêkî nayê, tu ji min bawer nakî looo!

Çima ez bawer nakim Apê Derwêş, lê hinekî bêhnfireh be. Her tişt di dema xwe de...

Hin bi hin dê hemû kevir di cihê xwe de rûnên. Helbet dê hin kurên camêran ji wan re bibêjin. Helbet bi qasî neyarên wan, dostên wan jî hene. Derfetên wan jî ne hindik in. Destê wan jî heta tu bêji bes, dirêj e. Tu mitaleyan meke, av li ku derê be, coka xwe çêdike û wisa diherike. Tu kes nikare pêşiya ava herikbar bi yek carê bigire. Sebîr sebîr, apê Derwêş sebrê bike.

De here lo tu jî! Ez çi dibêjim tu çi têdigihêjî. Ma te ne bihîst? Duh li qahweya gund, ji cîranê me re gotiye ku Derwêş her roj diçe qereqolê, ew sixûrê dewletê ye, bila haya we jê hebe.

Apê Derwêş, ma ku Miho got, mohr jî lê ket?

Keçelo kumê min li serê te. Li vî gundî her kes bi her kesî dizane. Li gorî ku rehmetiyê bavê min digot, kalê vî bênamûsî jî wisa bûye. Di serhildana Şêx de, ji bo pariyek nan cîranê xwe, xizmên xwe dane dest hikûmetê. Tu bawer nakî ji kalên vî gundî bipirse.

Mamoste, di ber gotin û giliyên Apê Derwêş nedikire der. Çiqasî vedigot, çi digot; dilê wî

rihet nedibû. Mamoste, vê hêrsa wî bi kurên wî ve girêdida. Dixwest mijara axaftinê biguherîne.

Kurê te yê li Stenbolê, qet li te nagere, alîkariyek, pêjnek jê nayê?

Na camêr, kurê min ê mezin bi avê de çû. Tu xêra wî, ji wî bi xwe re jî nîn e. Ew

ketiye nav gemara bajarê Stenbolê. Xelasi jê re nemaye. Ew serî rizgar bike dê ling bialiqe. Lingê xwe rizgar bike dê qûn bialiqe. Lê her du kurên min ên ku berê xwe dane nav agirê gur, li ser dilê min bûne girêk.

Apê Derwêş ku temenê wî digihîşt şêstî, li gel ku li ser xwe bû; porê wî, simbêlên wî weke berfê spî bûbûn. Rûyê wî qermîçî û tîm xemgîn bû. Axîneke kûr ji kezêbê kişand û axaftina xwe domand:

Girêkeke ku ne vedibe û ne jî sist dibe. Li kîjan welatî ne gelo, sax in, mirî ne, min bizaniya bes bû. Gelo tî ne, birçî ne, nexweş in, birîndar in? De îcar gava tu derfet jî di destê mirov de nebe...

Mamoste poşman bûbû. Xwestibû berê axaftina Apê Derwêş biguherîne. Lê Apê Derwêş bêhtir xemgîn bûbû. Hêrsa wî hinekî şikestibû lê cihê xwe dabû xemgîniya bêderman. Nola ku bixwaze, ji derdê apê Derwêş re bibe derman, ji nû ve jê pirsî:

Apê Derwêş, ma ji zû ve çûne?

Yê navincî, ev şeş sal in; ê biçûk jî ev pênc sal in ku berê xwe daye der û deverên

nepenî. Berê xwe dane rîya çûn û nehatinê. Ne agahiyek, ne pêjnek... Qet nebe, agahiyek bihata, agahiyeke ku min bizaniya ka gelo sax in an jî mirî û hew....

Ez te xweş têdigihêjim Apê Derwêş, pir xweş! Ne hêsan e, zarokekî mezin bike, bike zîlam, bibe şazdeh, hivdeh salî û nola çêlika kevokekê bila perên xwe li hewayê bixe û bifire, biçê û hey biçê....

Her du zîlamên ku li bin dara tûyê ya ku di nav baxçeyê dibistanê de dara herî mezin bû rûniştî bûn, bê hemdî xwe berê xwe dan çiyayê bakurê gund. Nola ku dê her du kurên Apê Derwêş, ji nav bilindahî û kûrahiya çiyayî a niha xwe berdî û bîn li bin dara tûyê, li nik wan rûnên.

Dawiya biharê bû. Her roj, dinya germtir dibû. Bi germbûna dinyayê re siya dara tûyê xweş dibû. Heta bi mirîşka kurk jî li gel çîçikên

xwe, hatibû bin siya dara tûyê, venîştibû. Dema danîna pinên zerzewatan bû. Gundî ji nav baxçeyan vedigeriyan malên xwe. Tevr û bêrên wan, dikira ji destên wan bikevin; westiyayî û sist bûn. Silav didan kesên ku li bin dara tûyê rûniştî bûn û derbas dibûn...

* * *

Teqeteqa tivingan, di bêdengiya şevê de olan da. Dengê tiving û bombeyan tevî hev bûbû. Kesî nizanibû çi qewimiye, çi bûye. Heta zarokan jî kesekî raketî nemabû. Dengê teqînan ji her aliyê vî gundî dihat. Kesî nizanibû sedema vê bûyerê çi ye û çawa bi encam bû. Lê ji mitalayan qûna kesî erd nedigirt. Piştî rawestîna dengê tivingan, pir tê de neçû; agahiya li ser bûyerê, mal bi mal li gund geriyabû. Jin, zîlam, heta zarokan, her kesî bi şêwaz û zimanê xwe, agahiya vê şeva bêdeng û tarî, ragihandibû yekî din, hinên din. Wekî hezkarên Apê Derwêş, nehezkarên wî jî hebûn. Lowma, kuştina Apê Derwêş xemgînî anîbe malina, kêfxweşî jî anîbû hin malan.

Li hindirên malan, li ber dîwarên hewşên bisênc, li ser riya zevî û baxçeyan, bêhtir jî li qehwexaneya gund; dev dirêjî guhan dibûn. Carinan bi pistepist, carinan ligel dijûnan û dengê bilind. Hinek bi dilekî xweş û bikêf, hinek bi xemgîniyeke sar û bêgav; diaxivîn, guhdarî dikirin:

“Ma Apê Derwêş ê kuştinê bû, ma ji her du kurên wî ku ev çend sal in gihane wan jî şerm nekirin?”

“Kî çi bibêje, bila bibêje; tu carî nakeve serê min ku feqîrê Apê Derwêş, biçe qereqolê û giliyê yên derve bike.”

“Heyra çima wan nehat ez nekuştim, çima wan nehat tu nekuştin; helbet derdekî wan, sedemeke wan hebû heta ku ew kuştin. Yan na dê çawa bavê hevalên xwe bikuştana?”

“A niha ez, vir de û wê de nizanim, çawa be, kengî be dê derkeve holê. Heke qesasê deh hevalên ku li pişt gund hatin kuştin Apê Derwêş be; wî ne carekê tenê, sed caran jî mirin heq kiriye. Lê na ku sîxurî nekiribe û bêguneh be; tiştê ku kirine, ne yê kirinê ye û hew.”

“De îcar dê hêsîra xaltiya Xezalê çi xweliyê li serê xwe bike. Her sê kur, bi dinyayê ketin. Bi qotê mêrê xwe distirî, bêminet gezek nan dixwar. Niha ew jî çû.”

Mamoste jî bi serê sibê re, çawa ku şiyar bûbû, bi hinceta ku ji dikanê nên bikire, xwe gihandibû nav çûn û hatina axaftinan. Dilê wî dikulkulî, gava Apê Derwêş dihate ber çavên wî, bi carekê laşê wî direilî. Ew li Mihoyê beradayî digeriya. Lê ji kê pirsîbû, kesekî bersiveke erênî nedabûyê. Mihoyê beredayî bûbû xewneke ji xewa serê sibê.

Mamoste di nav pêlên xemgînî û perosê de diçû û dihat. Piştî ew qas gilî û gazinên Apê Derwêş, mamoste biryar dabû ku xwesteka axaftinê bişîne ji yên derve re. Tekane navgîna ragihandinê jî bi gotina Apê Derwêş, Mihoyê dîn bû. Lê mixabin, Mihoyê dîn bûbû derzî û ketibû nav bendera kayê. Bûbû gilokek berf û ketibû nav deryayê.

Roj ber bi çiyayên madenî ve diqulîpî. Tîrêjên zer ên mîna rengê madena ku ji çiyayên vî gundî derdiketin, hin bi hin winda dibûn. Roj, xweza radestî bayê êvarî dikir. Sermayeke sivik û tariyeke tenik bi giranî bi ser vî gundî ve vedigirt. Mamoste jî bi heman giranî û xemsariyê, ber bi televîzyonê ve diçû û bi tiliyê şanîdanê yê destê rastê pê li pişkoka televîzyonê dikir. Pêşkêşkarê nûçeyan mîna robotekî yek bi yek, li pey hev, peyvik ji devê xwe nola ku tif bike dibarandin. Bi hevoka “Îro, berê sibehê, li gundê Girgîsê yê navçeya Erxenê ku bi bajarê Amedê ve girêdayî ye, dozdeh heb terorîst, li gel çekên xwe mirî hatine girtin...” zîq li cihê xwe rawestiya. Apê Derwêş, Mihoyê beredayî, dozdeh laşên bêcan li nik hev rêzkirî, di ber çavên wî re çûn û hatin...

Di heman katê de, di otobozeke bi riwîngên rêya dirêj ve tije de, heman nûçeya ku ji radyoya otobozê, bi ser rêwîngên wê ve bela dibû, destê Mihoyê dînik diçû ser berîka sakoyê wî. Desteya pereyan destê wî diperitand. Heman agir li hemû bedena wî belav dibû. Kupe kupa dilê wî, dikir singê wî perçe bike. Sebr û hedan nemabû jê re. Ha wexta xwe ji otoboza ku bi rê de diçû bavêta...

Rêbendan 2008 Amed

Xem

Ronî WAR

Tu wek her car dîsa li hember bûyerên ku diqewimin xemgîn î. Tu li ber dikevî. Qaşo te gotibû; "ez nema xwe li ber tiştêkî dixim" û te yê nema li nûçeyan jî binêriya.

Lê wek wî zilamê nexweş li te hatiye. Tu jî nikarî bi xwe. Zilam li hinda tixtor qebûl dike û dibêje; "Ez ê nema xwe li ber tiştêkî bixim. Ma bi serê min ketiye!" Kengî ku ji tixtor vedigere tê û dibihîze kerê yekî bê terî ye dibe nirçe nirça wî û dibêje; "Hiii ihi! De ka ez ê çawa li ber nekevim? Wê ev feqîrê kerê, mêş bên xwe li ser deynin û ji bergî teriya wî tune ye ew ê nikaribe mêşa ji xwe biqewirîne." Rûdinê û diponije bê ew ê çi çareyê ji kerê re bibîne.

Tu jî wek wî xwe li ber her tiştî dixî. Çi diqewime tu li ber dikevî. Hinekên nizanibin ew ê bibêjin qey sersebebên wan bûyerana tevdek tu yî.

Tu li ser vî halê xwe difikirî û tu dikenî. Belê tu dikenî ku serpêhatiya wî yê ku agir pê ketiye û ew anîne tixtor tê bîra te. Li pêş çavên te şikil digire:

Rahiştine zilamekî ku ew xistine nav betaniyekê û wî tînin hinda tixtor.

Tixtor tê dibêje; "Xêr e, çi yê wî heye?"



Tu wek her car dîsa li hember bûyerên ku diqewimin xemgîn î

Yê ku ew anîne ser tixtor dibêjin; "Agir pê ketibû, şewitiye."

Tixtor lê dinêre û dibêje; "Law we ev kuştiye. Ev ne tenê şewitiye. Her derê wî şikiyaye. Çi bûye jê?"

Yê nexweş li tixtor vedigerîne û dibêje; "Xwedê bi te û Mehemedo de ez bi bêrê tefandim!"

Tu dibêji; "Xuya ye ji vana re yê wek Mehemedo lazim in." Tu bi xwe dikenî, yê ku di wira re dibuhurin û dibînin ku tu xwe bi xwe dikenî gunehê xwe bi te tînin û dibêjin; "Hela ji xwe re li vî feqîrî binêr, me ewqas jê re got, 'zêde xwe nede xwendinê tu yê biçelqî' wî guh neda me. Di dawiyê de ji dest çû."

Xapînok

Reyhan SARHAN

Ez jî nema dizanim ne mirî me ne jî zindî me!

Bi xwendina her helbest û stranekê ez jî bi te re distirê û difikirim, diponijim. Dikevim nav cîhana te û hestên te yên belawela vedijim û şax didim hundirê dilê xwe yê ku bê te sêwî û bi tenê maye. Wek pêpûkan, mîna tûtakan dixwînim. Ne li ser çiya, lê kolan û sikakên xeribîya tik û tenê, di roj û şevên xwe de ez te didim jiyandin. Di dilê xwe yî derîzî de kêlî û saniye tune ne ku tu li bîra min î û mêjiyê min bi te hatiye dagirkirin. Ma wê çawa bê valakirin?

Çiqas rewşek kambax û mîrat e! Ku ez tenê ji bo te diponijim û kûr kûr difikirim, jiyana xwe tevî hev dikim. Ez bi ser rastiya xwe ya ku tê de dijîm wînda dibim û hemû tiştî tevî hev dikim; rastî û şaşîyan nema dikarim ji nav hev derînim; baş û nebaşan nikarim ji hev veqetînim û evîn û îxanetê nema dikarim cuda bikim ji hev, ev tev tu buyî sebebê derûniya min... Min ji xwe re digot tu cuda yî û tu ji hemû kesî bêhtir cudatir î, lê xuya ye min tu qet û qet nenasiye û an jî min nexwestiye ez te wisa binasim? Çiqas zor e ku mirov xwe bi derewan bixapîne, nizanibe ji bo çî dijî? An kesê ku ji bo wan dijî çî qas bi vê qedir û qîmetê dizanin...

Di nav tîpa pêşîn a navê te de ez li ser her xetên lênûskekê te dixwînim. Min di şexsê te de ji hemû welatîyên te hez kir; ji baş û nebaşan, ji dîn û duristan, ji paqijî û gemariyên wan, ji dost û dijminê wan ev tev evîna min a ji bo te bû sedem ku ez ji van hez bikim. Ew valahiya ku te vala hiştibû di dilê min ê ku ji bo te nexweş ketibû de, min xwest bi wan xapînokan dagirim û pê dema xwe bibihurînim, hem xwe hem jî jiyana xwe ya ku ez jî nema zanim ne jiyana an jî ne mirin e, ji nav hev nema dikarim derînim û bi ser a rastîn ve bibim...

Ez miriya nav saxan im! Ji bo te min xwe xist çî û çî! Hema tu bêjî çî, min xwe xist wan qalib û kesayetiyên tevlihev. Ne min û ne kesên li dora min nema ez nasîm û tim ji bo ku min binasin fikirîn. Ez jî di nav wan fikran de li te geriyam û ew jî li min û rastiya min geriyam. Nema zanim ji bo te çî bêjim û pesin, gazin, êş, evîn, hezkirin, bêrîkirin, ev tev jî bi min re westiyan û mirin!... Mirinek ku li te digere û xeyalek ku bigihîje te...

Min fanosa dilê xwe tim vexistî hişt û tu caran min nexwest bitefînim. Ji bo ku jana dil ji min re digot wê were û dida ber dilê min, jana min a ku tevî min dinaliya...

Di şevên zivistana dijwar û seqem de min nexwest ku dilê min ji bo te sar bibe û cemed bigire. Min nexwest ku kenê li ser rûyê min biçilmise û di her kenekî xwe de ez te jî di nav kenê xwe de bidim jiyandin û kenandin. Min dizanibû ku te ji kenên jidil pir hez dikir. Ji bo vê yêke min nexwest ku ez ken biterikînim û te jî ji dil û hestên xwe bavêjim û dûr bikevim.

Her çî qas hêviya ku ez bigihê, te xwe ji min dûr dikir jî min tevî hestên ku ez bigihîjim te mîna siwaran min da dû hêviyên xwe yan jî hêviyên te yên ku ez jî nema zanim hêviyên min in an jî yên te ne? Wek çawa ez nema zanim ez ne dijîm an jî najîm! Ma li kîjan dinê hatiye dîtin ku mirov nizanibin mirî ne yan jî zindî ne! Ez jî nêma zanim ne mirî me ne jî zindî me!

Periyên çiyayan

Halîl UYSAL



Di nav ajalan de em zêdetirîn ji pezkoviyan hez dikin. Ez kîngê derkevim rêwîtiyê, dixwazim her tim wan bibînim. Dema ez di rêwîtiyê de me, çavên min her dem li derdora min in. Ez dengêkî hêdîtir, xişîneke pir kêr ji dibihîzim.

Carna rêya ku lê dimeşim jibîr dikim, winda dibim. Dema ez hewl didim wan bibînim, li kevir û zinaran dieliqim û dikevim xwarê. Ez dixwazim di zivronekekê de, di pişt zinarekî de rastî wan werim. Dixwazim ji pişt darekê ve ji nişka ve derkevim hemberî wan.

Nizanim çima? Lê dengê ji nav dilê min ji min re dibêje ger ku ez wan bibînim, dê ji min re mizgîniya xêrê bînin. Ji ber vê jî ez li wan digêrim. Ji ber vê ye ku hevalên min, ji min re dibêjin bi salan e tu hê nikarî li çiyayan bigerî lê nizanin ku çavê min tim li pezkoviyan digere. Ax! Min ew carekê bidîtina, têr li wan temaşa bikira, ew meşa wan, herhal ez ê jî hîn bûbûma bê ketin, bê eliqîn bimeşiyama di van rêyên çiyân de. Ez baş dizanim, ew her dem li derdora me ne. Ji ber wê jî, min navê Periyên Çiyân li wan daniye...

Carna wisan dibe ku; ez digihîjim derekê, haydar dibim ku demeke berê ji wir veqetiyane. Berî min bi çend deqeyan di rêya ku ez jê derbas bûme de derbas bûne. Carna di navbera daran de xişexîş tê, em dibêjin qey ba ye, lê pezkovî ne. Carna ji bilindahiyên kevirên biçûk tîn xwarê, ew li wir in lê em tenê dibihîzin. Li berqefan wek şeklekî disekinin, em mêze dikin,

mêze dikin lê nabînin. Carna wek bahozê dimeşin, em nagihîjin wan. Tenê em dizanin ku ew in...

Hem nêzî me ne, hem jî dûrî me. Di nav daristanan de, li serê zinaran temaşeya me dikin. Ji ber vê jî pezkovî periyên van çiyayan in. Tu kesê/î ji me aciz nakin û nêzî me tevan dijîn. Her dem li derdora me ne lê tu caran xwe nîşanî me nadin. Bi rengê hestekê her tim hene, ne tenê wek hestekê, bi rengê rastiyeke jî her tim hene.

Çendekî berê em derbasî Qertelê dibûn. Kesên ku li Zagrosan dijîn Qertelê baş nas dikin. Ew zinarê bi xofê ku baskên xwe ji du aliyên ve vekirîye û wek ku bifire xuya dike... Me ji qeraxê Avaşîn de lê xistibû, em hevraz dibûn, em gelek jî westiyabûn. Ji geliyê Qertelê re hindik mabû me navber da... Hevalê min ê rê dixwest em temaşeyî çûyîna ava ya rojê bikin. Sorahiya êvarê tevahiya girên Zagrosan girtibû.

Di dilê min de jî ew perî hebûn. Ez difikirîm, dikarim wan li van gelî û zinaran bibînim. Ez hinekî din pêş ve çûm. Ez zûzûka ji zinarê li pêşiya xwe derbas bûm. Min temaşeyî geliyan kir. Min hîs dikir ku ew li wira bûn. Lewre gelî mekanê wan bûn. Dema roj diçe ava ew xwe dikişînin geliyan. Di tariya şevê de cihê herî ewle gelî ne. Ew di nava geliyan de disekinin û li benda sibehê dimînin. Ji bo mirov sekna wan bibîne jî divê çavên mirov baş bibînin...

Hem nêzî me ne, hem jî dûrî me. Di nav daristanan de, li serê zinaran temaşeya me dikin. Ji ber vê jî pezkovî periyên van çiyayan in. Tu kesê/î ji me aciz nakin û nêzî me tevan dijîn. Her dem li derdora me ne lê tu caran xwe nîşanî me nadin. Bi rengê hestekê her tim hene, ne tenê wek hestekê, bi rengê rastiyeke jî her tim hene.

*Du pezkovî, du
karxezal, du
periyên van
çiyayan di gelî de
dimeşyan. Ber bi
geliyê Qertelê cihê
ku em ê hinek paşê
derketina biçûna
wir. Ew jî ber bi
wir ve diçûn. Weka
ku rê şanî me
bidin. Bi tevahiya
bedewiya xwe
giran giran bi
zinaran ve
hildikişyan. Di
derbasbûna her
zinarekî de
disekinîn û li dû
xwe, li min mêze
dikirin. Ez yek ji
kêliyên jiyana xwe
ya xweştirîn
dijiyam. Min
meşek ew qas
xweşik, ew qas bi
raz careke din jî
temaşê nekir.*

Ez nizamim min çiqas li wan geliyan temaşê kir tê bîra min, min ji xwe re digot ‘periyên xweşiktirîn ên çiyayan, qey çi dibe vê berêvarê, carek be jî xwe nişanî min bidin, qey bes nîn e bi salan e ez li dû we dimeşim.’ Ji nişka ve ez li hevalê xwe yê rê haydar bûm. Min bala xwe dayê gelo, gotinên min bihîstibû? Hevalê min, hê jî bi kêfek mezin li çûna ava ya rojê temaşê dikir. Xuya bû nebihîstibû, ez rihet bûm

Min bi dengê kevirên ku şiqitîn berê xwe zivirand. Dengê kevirên ku şiqitîbûn di gelî de olan dida bilind dibû. Pêşiyê min fam nekir ku ji ku ketin xwarê. Lê dû re min dît ku du tişt li ser zinaran hereket dikin. Ev du tiştên ku hereket dikirin, ew bûn...

Du pezkovî, du karxezal, du periyên van çiyayan di gelî de dimeşyan. Ber bi geliyê Qertelê cihê ku em ê hinek paşê derketina biçûna wir. Ew jî ber bi wir ve diçûn. Weka ku rê şanî me bidin. Bi tevahiya bedewiya xwe giran giran bi zinaran ve hildikişyan. Di derbasbûna her zinarekî de diseakinîn û li dû xwe, li min mêze dikirin. Ez yek ji kêliyên jiyana xwe ya xweştirîn dijiyam. Min meşek ew qas xweşik, ew qas bi raz careke din jî temaşê nekir. Hat bîra min ku divê ez vê demê, bi wênekêşê bikişînim nemir bihêlim. Lê makineya min, bi min re nebû, min dev jê berda. Vê carê min tenê temaşê kir. Dawiyê, dema gihîştin zinaran sekinîn. Cara dawîn zivirîn, li min mêze kirin. Ew awirên wan ên dawîn bûn. Bi carekê çind dan xwe û ji berqefê derbas bûn.

Û ew şeva ku em li serê Çarçelayê man, ez li wan wêneyên ku min li ser zinaran dîtibûn fikirîm. Ew mirovên pêşîn, ew wênevanê ku biryar daye wêneyan li ser keviran xêz bike, ew hunermendê yekem, dema ku xêza yekem çêkiriye li çi fikiriye? Kîjan periya çiya dilê wî /ê diziye, gava pêşîn a ber bi mirovbûnê ve pê daye avêtin...

Kîjan delalê dilê wî/ê û aqilê wî/ê çeliqandiye û ew kevirê tûj ji erdê pê daye hilanîn û li wan zinarên reş xistiye, ew

zinar bi wêneyên periyên neqîşandine. Çima ne tişteki din, pezkovî xêz kiribûn li ser zinaran... Dema ku bi kevirê destê xwe li kevirê din dabû, çima tenê pezkovî xeyal kiribû? Ger ku tenê li seydê ramiya be, di van çiyayan de gelek giyanewerên seydê hene, çima tu xêzeke wan tune... Yanî çima wêneyên tu ajalên din nehatine xêzkirin... Hunermendê wan zinaran bûbû evîndarê/a kîjan periyê...

Berya hezar salan ew wênevanê yekem yê/ya ku li zinarê Çarçelayê wêne xêz kiribû, tenê pezkovî hîlbijartibû. Tenê bi daxwaza seydê xêz nekiribû, di heman demê de pezkovî ecibandibû, di nava ajalan de danîbû cihekî cuda. Dîtibû, fikirîbû û jê hez kiribû... Tiştên ku ez niha hîs dikim wî/wê jî berya hezar salan hîs kiribû.

Ez nizamim wê demê pê dizanibû an na, lê wî/wê yekem delaliya vê dîrokê ditibû û hezkirina xwe ya ji bo wê li ser zinarên ku bilindahiya wan digihîje hezar mîtroyan nexiştandibû. Ew bûn yekem delaliyên dîroka mirovahiyê.

Niha dengê dilê xwe, dilê min ê ku min roj bi roj dide meşandin, ji bo dîtina wan min çiya bi çiya dikişîne baştir fam dikim. Berî min bi hezaran salan ew mirovê/a ku ji van deran derbas bûye, wêneyê periyên ku dîtiye li ser keviran nexiştandiye û bi hezar salan daye jiyandin.

Wergera ji tirkî: Dîlan Aydın

Mirin



Amed Çeko JIYAN

Li Pompeiyê Mirin

- Kurê min dereng e, tu hê jî şiyar î. Çima nanivî? Karê xwe sibê bidomîne. Ev cara duduyan bû ku diya wî ji xew şiyar dibû û jê re digot dereng e.

- Temam dayê, cixareya xwe biqedînim, ez ê binivim.

Beriya ku cigareyê biqedîne û binive, ji bo ku nivîsa xwe bi daneyên ku ji malperekê girtibûn girê bide, nivîsandinê domand.

“Zimanên mirî yên afrîkî:

Kwadî, Dulî, Gey, Nagumî, Yenî, Horo, Muskum, Ngbi, Misiriya Kevn, Nubiya Kevn, Qiptî, Gîz, Gafat, Weyto”

- Çiqas ziman ji bîr bûne û mirine... Li dirêjbûna listeyê û hejmara zimanên mirî heyirî û beriya ku listeyê biqedîne, ciyê lê maye bi pênuşê xêz kir û kete nav nivînên xwe.

Jan li bajarokekî biçûk ê Kurdistanê li maleke biçûk î kevn ku bi keviran hatibû lêkirin, bi diya xwe re dijiya. Janî li zanîngeheke bajarekî mezin beşa civaknasiyê xwendibû. Piştî salên xwendekariyê, xwişka wî zewicî û diya wî bi tenê mabû. Wî jî biryar girtibû ku li bajarokê

xwe bi cî bibe û di salên dawî yên diya xwe ya pîr de li ber piyê wê rûnê û wê bi tenê nehêle. Bi vî awayî dê karibûya bi awayekî hêsantir xwe bera kûrahiyên kîtekîten civakê û civaknasiyê jî bide.

Jan li ser nivînên hirî dirêjkirî bû. Ji ber sermaya dijwar a zivistanê lihêfa stûr li xwe lefandibû û tenê serê wî ji derve mabû. Serê wî ji bêhna giran a cigareyê werimîbû. Bêhna cigareyê bi hewayê ku di odeya girti de bêhn dabû re, xalîçeyên li erdê raxistî jî tê de, ketibû her cî û derên odê. Nemaze lihêfa wî wekî xwelîdankê bêhn dida.

Diya wî ji deriyê odeya wî derdiket. Bi çavên kûs li diya xwe nihêrt. Hê cilên wê yên şevê lê bûn. Terhiya wê ji serê wê şeqitîbû û porê wê belawela bû. Balkêş bû ku diya wî vê carê bi pitepit ew hişyar nekiribû, bêyî ku tu tiştî bêje ji odê derketibû. Ji ber ku ev jî bo wî tiştêkî baş bû, pir lê nefikirî. Wekî karê yekemîn, destê xwe bir cixareya ser masê û ji pakêta cixareyê ya di nav pirtûk û kaxizên belawela yên li ser masê de winda bûbû cixareyek derxist û rasterast çû metbexê da ku ji xwe re neskafeyekê çêke. Diya wî, bi awayekî bêhiş di xênî de, di nav odeyan de digeriya. Qasekê li ber deriyê metbexê li diya

xwe temaşê kir. Fikirî ku teqez tiştêk winda bûye û ew lê digere. Dema ku ji bo neskafe yê av germ dikir, kir ku ji diya xwe bipirse ka li çidigere.

- ...

Nikaribû bipirse. Pê nedibû tenê gotinekê ji bike... devê wî vekirî mabû û wekî lal bûbe, tenê dengên bêwate ji devê wî derdiketin. Çend carekê xirexir ji qirika xwe anî û belxema di qirika xwe de tû kir lavaboyê û dîsa kir ku bipeyive.

- ...

Dîsa tu peyv ji devê wî dernediket. Mêjiyê wî tevlihev bû, çavên wî tarî bûn. Wekî dînan kir qîrîn... dengê qîrîna wî dihatê, lê nikaribû bipeyive. Bi bazdan çû ba diya xwe û bi dengên bêwate lalbûna xwe ji diya xwe re got. Diya wî tenê bi nêrînên bêwate lê nihêrt. Ne dipeyivî ne jî dengên bêwate derdixistin.

- ...

Diya wî wekî ku digirî xuya dikir lê çavên wê zuha bûn, dilopek rondik jî ji çavên wê nedigindirî. Ji nedî ve çawa ku barekî giran ketibe ser piştê wî çokên wî fisiyan û tûşî erdê bû. Diya wî li ber serê wî rûnişt û serê wî danî ser çoka xwe. Heta ku hişê wî hinek were serê wî, li erdê wisa dirêjkirî ma. Gelo şîva şevê berê li wan wiha kiribû? Teqez ji xwarinekê wisa li wan hatibû. Tenê xwarin wekî sedem

dihat hişê wî. Ji nedî ve ji ciyê xwe rabû, bazda çû odeya xwe û cilên xwe li xwe kirin, paltoyekî dirêj jî dakir ser milên diya xwe, bi milê diya xwe girt û ji bo herin klînîka hevalê wî Sîserê doktor ji malê derketin. Dema ku gihîştin sûkê, fêr kir ku ev lalbûn ne ji ber tu xwarinekê ye; sûk dişibiya baxçeyê nexweşxaneyê dînen bêziman. Li sûkê hin kes wekî wî dengên bêwate derdixistin û hin kesên dî, wekî diya wî tu dengê dernedixistin û wekî ku dînan bûn di nav sûkê de geh bi jorê ve geh jî bi jêrê ve diçûn û dihatin.

Dema gihîşt nexweşxaneyê, dît ku ji ber qerebalixê li nexweşxaneyê qiyametê li dar e. Bi milê diya xwe girt û bêtî ku li benda dorê bimîne, bi diya xwe re rasterast kete hundirê muayenexaneyê û xwe bi carekê berda ser çokên Dr. Sîser û got: - ... bu sabah uyandigimda*.... wekî ku ji dêvla xwînê ve ava keliyayî di mejiyê wî de bigere, germahî ji serê wî ber bi qirik û laşê wî de berjêr bû, rondikên germ ji çavên wî herikîn.

Dr. Sîser bi çavên xemgîn lê nihêrt û got,

- Maalesef arkadaşım, maalesef.**

*dema vê sibê şiyar bûm

** Mixabin hevalê min, mixabin

amedcj@kurdistan.name

V For Vendetta⁽¹⁾, Guy Fawkes⁽²⁾ û anarşîzm

Ferzan ŞÊR

Ji vî welatî re ji avahiyên bêtir tiştê divên, wekî hêviyê...

"V"

Destpêk....

Rojeke ji rojên Enqereyê sar û sayî ez ji zanîngehê vegeyîyam malê. Baran wekî dilopên ji mislîxeke xirabûyî dilop dilop li asfaltê diket û ew dibiriqand. Ev baran, sayî û sariya Enqereyê dilê mirov teng dike, ewrên reş tîne ser hestên mirov nobedar dike. Ji loma ye ku şairên baş ji Enqereyê dertên. Werhasil dîsa di rojek ji wan rojên şairane de ez ji zanîngehê hatim malê. Dil nedixwest ku tiştêkî bikim. Tenê qedehek çaya qaçax ji bo seyra Enqereyê ji paceya min bes bû. Min çay da ser û vegeyîyam menzela xwe. Min dil hebû ku pirtûkekê ji pirtûkxaneyê xwe bistînim û di seyra Enqereyê de li gel çaya qaçax çend rûpelan biqelibînim. Dema ez hatim ber pirtûkxaneyê xwe çavê min li CD'yeke ku li serî V For Vendetta dinivîsand ket. Min dev ji fikra xwendina pirtûkê û seyrî Enqereyê berda, min fîlm xiste qompîtûrê.

Di bêlmekê de vegotina fîlmê...

Fîlm bi xilaskirina Eveyê ya bi destê V dest pê dike. Di kolaneke tarî de ji bilî mişk û kûçikên bêxwedî tu liveke xwezayî nîn e. Li hemûyî welat qedexeya derketina derve heye. Lê Evey guh nade qedexeya dewleta dîktator û derdikeve derve ku here cem hevlekî xwe. Du kesên ku aligirên dewleta polîs a zilimkar in pêşiya Eveyê digirin, dîkin ku êrîşî wê bikin. Lê V dertê, keçikê ji destê wan xelas dike. Bi vê bûyerê serpêhatiya V dest pê dike. Planê ku bi salan kiriye pêk tîne. Şoreşa anarşîzmê dest pê dike. Keçikê îkna dike û dibe seyrekê; seyra teqînê, hilweşîna bêdadgehiyê. Ji ber ku tu bawerîya wî û gelê wî bi dadgeha dewletê tune ye bi teqîneke mezin Dadgeha Cezayê Giran a Londrayê belawela dike. Di heman demê de jî bi Eveyê re vê teqînê temaşe dîkin. Beriya vê teqînê axaftineke



wîha dike ku mirov di cih de dîtewize, hestên dijwar bi mirov digirin û dike ku bi dengêkî bilind li dijî neheqiyê biqîre. Ji Eveyê re dibêje îro 5'ê sermawezê ye.

"Bi bîr bixe, 5'ê sermawezê bi bîr bixe

*Îxanet û komploya Barûdê**

Tu sedemê nabînim ku

Jibîrkirina komploya Barûdê bivêne"

Ligel dengê uvertura 1812'an a Çaykovskî, teqînek pêk tê û dadgeh hildiweşe. Piştî vê bûyerê di navbera Vyê şoreşger ê romantîk û dewleta Adam Sutler de şerekî psikolojîk didome.

Dûre dor tê ser agahdarkirina gel. Li ser vê armançê êrîşî televizyona fermî ya dewletê dike; tevahiya Tv'yê dixê destê xwe. Bi alîkariya kanalê ji hemû hemwelatîyên xwe re eşkere dike ku li benda 5'ê sermawezê ³ bisekinin. Ev roj dê bibe roja çalakîyeke xurt, bibe rizgariya gelê Brîtanyayê.

Bi vê çalakiya xurt V di nav gel de deng dide, li rêveberiya dewleta polîs a zilimkar jî tirs vedide. Polîs tev dikevin pey V, lê digerin, lê tu nîşaneyê ku şopa wî bide dest tune ye. Lê tiştê heye ku di nav V de agirek vêdixê; Evey. Dema êrîşî Tv'yê dike pêrgî Evey dibe, ew jî alîkariya V dike. Dibe du car ku pêrgî hev tî, tîkiliyeke nîvplatonîk di navbera wan de pêk tê. Êdî welat dikeve nav kaosê. Rêveberiya Adam Sutler dikeve derdê xelasbûnê. Hêviyeke mezin di nav gel de ava dibe, li her derê welat behsa V tê kirin. Heta ku Evey jî bi van nûçeyan bêtir dikeve mereqa V, kî ye, çi dike, çima dike? Van pirsan jî xwe dipirse. Evey nizane ku wê çi bê serê wî, jî xwe bê xeber wekî keçikên berzewacê li benda 'prensê bi hespê spî' ye.

Polîs jî her aliyê ve zilm û zordariyê li ser gel dibarîne, bêhna faşîzmê jî ser asîmanan naçe der. V him dixwaze heyfa gelê xwe jî sîsmetê bistîne him jî hefya xwe ya şexsî bistîne. Çi ye ev heyf, divê em behsa wê bikin. Adam Sutler (serokê partiya faşîst a li desthilatdariya Britanyayê) dema dibe serokê Britanyayê, jî bo ku desthilatiya xwe daîmî bike projeyeke bi navê "Ewlehiya Netewî" li dar dixê. Lê ew ne ewlehiya neteweyî ye; ew proje dike ku desthilatdariya Adam Sutler bêtir bi hêz be. Loma di naveroka projeyê de vîrûsekê çêdikin. Wiha dikin ku ew vîrûs di nava gel de belav dibe û li welat kaosek dest pê dike. Lê di laboratuara ku vîrûsan çêdike de teqînek pêk tê, mirovên ku vîrûs li ser wan dihate ceribandin tev dimirin, jî bilî yek kesî. Belê ew mirovê ku xwe jî agiran xilas dike V ye. Her kes hêvî dike ku bila dawî li kaosê were. Di vê dema tengasiyê (krîza Marrya cindê -kaosa ku bi teqîna laboraturê hatiye) de xwediyê vîrûsê Adam Sutler dertê holê. Ji endamên partiyê yekî ku xwedî fabrîkaya derman e, dermanê vîrûsê dide çekirin û gel jî vîrûsê xilas dike. Di vî kaos û şerê qirêj de Adam Sutler bêtir bi hêz dibe, faşîzm bêtir tîsîra xwe li gel dike. Çend hezar mirov dimirin. Heyfa V ya şexsî jî bi wan mirovên ku bi laboratura dewletê de kar dikirin re ye. V pêşî hemû dijminê xwe dor bi dor dike. Piştî kuştinê wekî sembola romantîzmê guleke sor li ser cendekê wan datîne.

Piştî kuştina wan dor tê ser sîstema faşîst. Dem her diçe nêzikî 5'ê sermawazê, roja rizgariyê dibe. Rojê Evey jî malê dertê, diçe cem hevalê xwe yê komedyenê ku di bernameya xwe ya heftane de her tim tinazên xwe bi Adam Sutler dikir. Me got dema teqîna mezin nêzik dibe, lê çiqas dem nêz dibû, dewlet bêtir hêrs dibû, tîrsa wê zêde dibû. Her ku diçû zordestî û girtina sîvîlan zêde dibû.

Wê şeva ku Evey jî malê derket hevalê wê yê komedyenê dî bihata girtin. Dema Evey gihişt mala hevalê xwe qehweya germ amade bû. Qedehek jê vexwar û danî ser masê. Bîskek nebihurî polîs li derî da. Hatibûn ku komedyen bigirin. Evey zûzûka derket jorê, di bin nîvînan de xwe veşart. Evey ew bûyer berê jî dîtibû. Bav û diya wê dîsa jî aliyê dewletê ve bi vî awayî hatibûn girtin û Evey cardin ew neditin. Piştî derketina polîsan Evey xwe jî pacê avêt, reviya. Dema jî deriyê baxçe derket destekî bi lepikê reş devê wê girt.

Lîstikek ji bo zanîna rastiya V

Piştî girtina Eveyê, V ew di menzela taybet ku dişibiya îşkencexaneyan de perwerde dikir. Rastî pê dida zanîn, lê çawa?

V setupek li dar xistibû. Armanca wî ew bû ku bi vî awayî binêre ka Evey jê re çiqas saxlem e û pê rastiya xwe bide pejirandin. V wiha kir ku hemû cureyên îşkencê pê kirin, lê tu hevokek jî ji devê wê derneket, çi dikirin bila bikirana dê navê V negota. Paşê V baweriya xwe pê anî. Îşkencevan hat cem keçikê, jê pirsî em ê te bikujin, tenê peyvek der heqê V de bêje. Ger tu peyvekê jî bibêjî em ê te azad bikin. Lê Evey bi serbilindî got ez amade me jî bo mirinê. Lê mîrik jê re got bes e tu azad î. Hêj fahm kir ku ew lîstikeke V ye. Bi vê lîstikê V rastiya xwe û civakê bi Eveyê da zanîn.

Lîstikek dawîn...

Ji avakarên projeyê yek jî Creedy bû. Wezîrê Adam Sutler... Ev lîstik li ser wî bû. Divê V ew bixapanda û bi alîkariya wî Adam Sutler bi dest bixista. Pêşî bi dedektîf Finch re hevdişînek pêk anî, jê re rastiya Krîza Marrya Cindê vegot û jê re pêşniyar kir ku bila çavên wan li ser Creedy be. Û dûre çû cem Creedy, jê re got tu niha di bin çavdêriyê de yî, te dişopînin. Ger tu Sutler jî min re binî tu yê jî min xelas bibî. V zanibû ku wê Creedy pêşniyara wî bipejirîne.

Li Britanyayê anarşî, teqîn û V(victory)⁴

Piştî sazkirina lîstika dawîn dor hatibû rêxistinîna gel. V jî bo gel bi milyonan rûpoşka xwe belav kir. Êdî bi hemû mirovan re ew rûpoşk hebû. Her tişt jî kontrolê derket. Li welat kaosekê dest pê kir. Her kesê/a ku rûpoşk li rûyê xwe dixistin dadiketin kolanan. Li deverên qedexê sîxurekî dewletê zarokeke neh, deh salî kuşt û hemû hemwelatîyên herêmê li hev civiyan. Bi ser sîxur ve çûn û ew kuştin. Anarşiyê dest pê kir, gel destê xwe da hev, li dijî leşker û polîsan dest bi şer kir.

4'ê sermawezê kesên ku rûpoşka V li xwe kiribûn ber bi randevuya V ve diçûn. Bi armanca hilweşîna sîstema faşîst ew bi rê ketibûn. Her diçû zêde dibûn, bi dehan, bi sedan, bi hezaran heta bi milyonan zêde dibûn. Polîsên dewletê dorhêla qesra parlemetoyê girtibûn, tev bi rext û çek bûn. Lê nedikaribûn bi gel. Gel bi hêzeke xurt bi rê ve diçû ku tu qewetê nikaribû li pêşberî wan bisekine... Anarşîzm bi ser diket, gel desthilatdarî bi dest dixist û mirina V jî nêzik dibû.

Şeva 4'ê sermawezê li gor peymana ku V bi Creedy re danîbû, Creedy, Adam Sutler girtibû û ji V re anîbû. Dema V û Creedy di tunela trêne de hatin cem hev Creedy Adam Sutler kuşt û dûre xwest ku V jî bikuje da ku desthilatdariyê bixe destê xwe. Lê nekarî V bikuje, şerekî dijwar di navbera notirvanên Creedy û V de derbas bû. Notirvan tev mirin, V birîndar bû. Kuştina Creedy a herî dawîn û trajîk bû. Dema V şûrê xwe avêt stuyê wî, jê re got:

"Di bin vê rûpoşkê de ji goşt zêdetir tişt hene,

Di bin vê rûpoşkê de ramanek heye,

Û hûn dizanin ku gule di 'Raman'ê re derbas nabin."

Wiha got û ew kuşt. Dûre vegeriya cem Eveyê, di nav destên wê de ket. Xemeke sar bi Evey girt. Axaftineke trajîrealîk di navbera wan de derbas bû. V erka xwe qedandibû, divê êdî biçûya ser dilovaniya xwe. Jê re got ku ev bîst sal in ji bo vê rojê jiyaye, tenê ji vê rojê re, ji vê armancê re, lê dûre;

"Heta vê roja ku min tu dîtî, tu tişt tune bû, lê dûre min tu dîtî, ez aşîqî te bûm."

Piştî mirina V Eveyê ew bire trêna bombebarkirî. Ew xiste nav trêne û bi sorgulan ew xemiland. Di heman demê de jî dedektîf Finch gihîşt cem Eveyê, kir ku destê xwe ji milê trêne daxwazê. Lê Eveyê nekir. Li derva bi milyonan kes gihîştibûn qadê ku seyra teqînê bikin. Dem hatibû, muzîka uvertura Çaykovskî lê dida. Dem bû 00:00, yanê 5'ê mehe hatibû. Eveyê ji dedektîf re: "Ew mafdar bû, ji vî welatî re ji avahiyan bêtir tişt divê, wekî hêviyê..." û trêna bombebarkirî kete riya xwe, çû ber bi qesra parlemetoyê ve. Eveyê dedektîf bire jorê ku ew jî wê şoreşê seyr bikin. Dedektîf jê pirsî ew kî bû?



Evey:

Ew Monte Krîsto bû, bavê min û diya min bû, bi-rayê min bû, hevalê min bû, ew tu

bûyî û ez bûm. Ew em hemû bûn.

Nebêjin ku film qediya. Belê wiha qediya lê bawer bikin ku min bi sedan hurgulî jê avêtin da ku ez we bi vegotina tevahiya filmê aciz nekim. Lê divê mirov temaşe bike, temaşe bike ku li dijî dagirkeriyê mirov çawa desthilatdariya xwe bi ser dixê.

Wekî encam ...

"People should not be afraid of their governments. Governments should be afraid of their people." (Divê mirov ji dewleta xwe netirse, dewlet ji hemweletiyên xwe bitirse.)

Têbînî:

1-V For Vendetta: Di sala 2005'an de bi xebatên Îngilîz û Almanan ên hevbeş hatiye çêkirin. Avakarên filmê Larry Wachowski, Andy Wachowski ji xêzeromana **Alan Moore** ji bo sinemayê lê anîne. Serlistikvanên filmê Hugo Weaving (V) û Natalie Portman (Evey Hammond) in.

2- Guy Fawkes: Navê wî yê rastîn Guido Fawkes e. Di navbera salên 1570 û 1606'an de jiyaye. Leşkerekî îngilîz e û pisporê barûdê ye. Li dijî zilma Kral James 1. ku li ser katolîkan dibarand dertê û di sala 1604'an de kopmloyeke bi navê "Komploya Barûdê (Gun powder plot) li dar dixê. Di komplojê de 36 varêl barûd dixê qesra Westminsterê. Bêyî ku biteqîne tê girtin û bi rojan tê îşkencekirin. Dûre kiryara xwe qebûl dike. Wekî her tawandarê îxanetê li ber gelê xwe tê darvekirin.

3- 5'ê sermawezê: Roja Komploya Barûdê ye. Di vê rojê de endamên kralliyetê li qesra Westminsterê li hev dicivin. Ji wê rojê heta îro li Îngilistanê bi navê Bonfire Day/Night mîhrîcanek tê pîrozkirin. Li her derê wek sembola wê rojê agir tê vexistin. Bi milyonan rûpoşkên V tîr belavkirin.

4- Victory: Azadî, Vya ku em bi du pêçikan çêdikin ji vir tê.

ferzanser@gmail.com



Oscar Wilde (16 Cotmeh 1854–3 Sermawez 1900)

Nivîskar û helbestvanê Îrlandî. Bavê wî yek ji doxtorên navdar ê dema xwe William Wilde bûye, diya wî, nivîskar Jane Francesca Elgee ye. Serxwebûna Îrlandayê parastîye û bi helbestên xwe yên şoreşgerî bal kişandîye ser.

Oscar Wilde bi mirina xwişka xwe Emily ya ku sê sal jê biçûktir û hê dehsalî bûye miriye; gelek êşiyaye û di zaroktiya xwe de, di bin bandora vê bûyerê de maye. Wilde qevdek porê xwişka xwe, di nav zerfeke biçûk de veşartîye û di tevahiya jiyana xwe de, bi xwe re gerandiye.

Dema perwerdehiya Wilde, bi karkirina bûrsan derbas bûye. Piştî 1874'an ku ji Oxford Magdalen Collegeyê mezûn bû wek rexnegirê hunerê dest bi xebatê kir. Di 1874'an de bi helbesta xwe ya bi navê Ravenna xelata Newdigateyê girt û piştî salekê jî li Londrayê bi cih bû. Di 1881'an de pirtûka wî ya bi navê Poems (helbest) hat çapkirin. Di heman salê de ji bo konferansên estetikê bide çû DYAyê. Konferansan nêzî salekê dewam kirin û bi tevî konferansên Kanadayê ve nivîskar di nava neh mehan de, ji sed û çilî zêdetir konferansan li dar xist. Çend lîstik nivîsandin. Di 1884'an de, bi Constance Lloydê re zewicî. Di nav du salan de du zarokên wî yên law çêbûn. Wilde çend lîstik nivîsandin û edîtorîya Kovara bi navê Woma's World kir û di heman salê de berhema xwe ya bi navê Canterville nivîsand. Piştî vê şeş salan di jiyana Wilde de, bû dema nivîskariya wî ya herî pêşketî. Gelek pirtûk nivîsandin û di nav wan de du pirtûkên çîrokên zarokan jî hebûn.

Gul û bilbil

Oscar WILDE

Xortikê xwendekar biqêrîn got: “Ger tu ji min re guleke sor bînî, ez ê te ramûsim. Lê di nav baxçeyê min de tu guleke sor nîn e! Min her gotina aqilmendan xwend, lê jiyana min perîşan e, lewre gula min a sor nîn e û ez qet nizamim ku ez ê yeke çawa bidest bixim. Tiştên biçûk çawa dikarin bandoreke wiha li ser bextewariya me bikin?” Çavên wî tije hêşir bûn.

Hingê, çivîka biçûçik, bilbilê, dengê wî ji ser hêlîna xwe ya ku li ser dareke pîr bû bihîst. Di nava pelan re lê mêze kir û şaşwaz ma û got:

- Ha, wa ye di dawîya dawî de ez, evîndareke rastîn dibînim. Ez her şev stîrîm li ser evînê, lê min qet kesek evîndar nedît. Min her şev çîroka evînê ji stêrkên re xwend û niha di dawîya dawî de ez, evîndareke rastîn dibînim!

Xwendekar got:

- Dê sibê li qesrê reqs hebe. Dê prens li wê derê be û dê yara ku ez jê hez dikim jî li nava wê civînê be. Ger ku ez jê re guleke sor bibim, dê heta ku roj bigihîje naverasta asîman bi min re bireqise. Ger ku ez jê re guleke sor bibim, ez ê wê hemêz bikim û dê destên wê di nav ên min de bin. Lê li nav baxçê min gula sor nîn e, loma jî ez ê tik û tenê rûnê û dê were di ber min de bibore here. Dê tu divêtiya wê bi min tune be, dê min nexwaze û dê dilê min bişikê.

Bilbil got:

- Bi rastî jî va ye evîndareke rastîn. Jan û êşa tiştê ku ez li ser distirê dikişîne. Ya ku ji min re bextewarî ye, ji wî re bûye keser. Evîn tiştê giranbiha ye. Zêr û zîv nikarin wê bikirin.

- Dê muzîkjen lêxin û evîna min bi muzîkê re

bireqise. Dê lord û giregirên di nav cil û bergên xweşik de li dora wê herin û werin. Lê ew ê bi min re nereqise. Lewre gula min a sor nîn e ku bidimê.

Xwe li ser çîmenan vezeland û rûyê xwe xist nava destên xwe û giriya.

Tiştên biçûk ên li nav baxçe pirsîn:

- Çima digirî?

Gul û kulîlkan pirsî:

- Çima digirî?

Bilbilê bersivand:

- Ew ji bo guleke sor digirî.

Ew bi hev re qêriyan:

- Ji bo guleke sor! Ev çi ehmeqî ye! Û kenîyan...

Lê bilbilê ew fêhm kir. Baskên xwe yê qehweyî vekir û bi hewa ve bilind bû. Wek siyekê di ser baxçe re derbas bû. Li nivê çîmenê dareke gulê ya xweşik hebû. Dema ku ew dît, xwe li ber danî û kire gazî:

- Guleke sor bide min, ez ê strana xwe ya xweştirîn bixwînim ji te re.

Dara gulê got:

- Xemgîn im, mixabin gulên min spî ne. Spî ne gulên min wek berfa li ser çiyayan, here ba birayê min, li wî aliyê baxçe ye. Belkî ew, tiştê ku tu dixwazî bide te.

Bi vî awayî bilbil firiya ber bi dara din ve û kire gazî:

- Guleke sor bide min, ez ê xweştirîn strana xwe bixwînim ji te re.

Dara gulê got:

- Xemgîn im, mixabin gulên min zer in. Zer in gulên min, wek simbilên genim ên zêrîn ku li zeviyên payîzê ne. Lê here ba birayê min ê ku li jêra şibaka xwendekar e, belkî ew tiştê ku tu dixwazî bide te.

Bi vî awayî bilbil ber bi dara gulê ya li jêra şibaka xwendekar ve firiya. Û got:

- Guleke sor bide min, ez ê xweştirîn strana xwe bixwînim ji bo te.

Dara gulê bersivand:

- Gulên min sor in, lê sermaya zivistanê kulîlkên min qerisand û ew weşyan û bagerê

şaxên min jî şikand. Dê îsal qet gulên min ên

sor tune bin.

Bilbilê kire gazî:

- Ez tenê guleke sor dixwazim, tenê guleke sor! Gelo ez ê qet nikaribim wê bi dest bixim?

Dara gulê got:

- Çareyek heye, lê ez newêrim ji te re bibêjim.

Bilbilê got:

- Ji min re bibêje, ez natirsim.

Dara gulê got:

- Ger ku tu guleke sor bixwazî, divê tu wê di taveheyvê de ji muzîkê çêkî û divê sorîtî ji xwîna dilê te were. Divê tu singê xwe bispêrî striyekî û bi wî awayî ji min re stranên bêjî. Divê tu di tevahiya şevê de ji min re bistirî, divê ew dirik dilê te bibire û divê xwîna te ya jiyanê bi min ve biherike û bibe ya min.

Bilbil qêriya:

- Mirin ji bo guleke sor bihayekî pir mezin e û jiyan ji bo me tevan pir şêrîn e. Ez hez dikim ku xwe li daristanên kesk deynim û temaşe bikim ka roja zêrîn çawa diçe û hîva zîvîn çawa li asîman bilind dibe. Ez hez dikim ku kulîlkan bêhn bikim û bibim heyrana xweşiktiya wan. Lê dîsa jî evîn, ji jiyanê baştir e û dilê çivîkekê çi ye, li ber dilê mirovekî?

Bi vî awayî baskên xwe yê qehweyî li hev xist û ber bi hewa ve bilind bû. Wek siyekê di ser baxçe re derbas bû. Xortikê xwendekar hê jî li nav giyayan dirêjkirî û rondikên çavên wî hê jî ziwa nebûbûn. Bilbil kire gazî:

Bextewar be, dê guleke te ya sor hebe. Ez ê wê di taveheyvê de ji muzîkê çêkim û ji bo ku sor bibe, ez ê xwîna dilê xwe bidimê. Daxwaza min ji te tenê ew e ku tu bibî evîndarekî rastîn. Lewre evîn ji aqilmend aqilmendtir e û ji hêzداران hêzdartir e.

Xwendekar ji cihê xwe yê li nava çîmenan, li jorê mêze kir, guhdar kir. Lê fêhm nekir ku bilbil jê re çi dibêje, nikaribû fêhm bikira. Ji ber ku wî tenê tiştên di pirtûkan de nivîsandî dizanibû.

Lê dara pîr ji bilbil fêhm kir. Lewre wê, ji bilbila biçûk a ku hêlîna xwe li ser şaxên wê çêkiribû hez dikir. Jê re got: "Ji min re straneke dawîn ji bibêje. Dema ku tu herî ez ê xemgîn bibim û tenê biminim."

Bilbilê ji bo wê stran got. Dengê wê wek dilopên aveke ku ji cêrekî zîvîn dipekiya bû.

Dema ku wê strana xwe qedand, xwendekar rabû ser piyan û lînûskeke derxist. “Di dengê wê de hin newayên xweş hene. Lê tu wateya strana wê nîn e, fêdeyek wê ya rastîn jî nîn e û bi kêrî tiştêkî jî nayê. Dilîniya wê nîn e. Ew tenê li ser muzîka xwe difikire, ne yên ji bilî xwe.”

Paşê çû odeya xwe, xwe vezeland û dest bi fikirîna evîna xwe kir. Piştî demekê jî di xew re çû. Dema ku heyv li asîman çirisi, bilbil ber bi dara gulê ve firiya. Xwe li ser striyê wê danî û singê xwe pê ve dewisand. Di tevahiya şevê de xwe bi striyê dewisand û stran got, heyva sar jî lê guhdar kir. Heta sibê stran got û strî kûrtir di singê wê de çû. Xwîna wê ya jiyanê herikî ji canê wê.

Berê, strana hilhatina evînê ya li dilê law û keçekê got. Û guleke pir geş hat ser şaxê darê yê jortirîn. Çawa stran li dû stranê hat, ew vebû. Berê spî bû, spî wek ewrê bi ser çem ve daleqandî û zivîn bû, wek baskên sibehê yên beriya hilhatina rojê ya li asîman. Dara gulê kire qêrîn, da ku bilbil xwe pirtir bijidîne bi striyê ve. “Xwe pirtir bijidîne bilbilokê, an na dê roj hel bê beriya ku gul temam bibe.”

Li ser gotina darê bilbil xwe pirtir dewisand bi striyê ve û strana wê çiqas çû bilindtir, gurtir bû, ji ber ku niha strana hilhatina evînê ya li dilê mêr û jinekê digot.

Gul sor bû, lê dilê wê spî ma, ji ber ku tenê xwîna dilê bilbilekî dikare reng bide dilê gulekê.

Dara gulê qêriya da ku bilbil xwe zexmtir bispêre striyê.

Bi vî awayî bilbilê, xwe zexmtir jidand bi striyê ve. Strî gihîşt dilê wî. Çawa ku jana wî zortir bû, dengê wî jî gurtir bû, ji ber ku îcar strana evîna ku bi mirinê delaltir dibe, evîna ku di gorê de jî nemir e digot.

Gul bû sorê tarî. Dilê gulê bi qasî mucewherê sor bû. Lê dengê bilbilê her ku çû nizmîr bû, baskên wî yên biçûk nema liviyan û çavên wê tarî bûn.

Dengê wî bi straneke xweş û dawîn bilind bû. Heyvê bihîst û li nava asîman sekinî. Gula sor bihîst û li nav hewayê sibeya sor vebû.

Dara gulê qêriya; “Binêre! Gula sor temam bû!” Lê bilbil bersiv neda, ji ber ku ew mirî bû êdî, ketibû nava çîmenên dirêj û di nêva dilê wê de jî striyek hebû.

Nîvroyekê xwendekar şibaka xwe vekir û li derve mêze kir, û qêriya: “Ha wa ye guleke sor!

Tam wek ku ez dixwazim. Min di vî temenê xwe de guleke wiha xweşik nedîtiye. Ez bawer im, ev gul wisa xweşik e ku di latîni de navek wê yê dirêj heye.” Destê xwe dirêj kir û gul helqetand.

Paşê şewqeya xwe da serê xwe û tevî gula li nav destê xwe beziya mala bijîşkê zana. Bijîşkê zana mamosteyê xwendekar bû. Xwendekar aşîqî qîza wî bûbû. Ew qîzik li ber deriyê malê rûniştî bû û kûçikê wê yê biçûk li ber piyên wê razayî bû.

Xwendekar bi pênoşî got: “Te got ger ku ez ji te re guleke sor bînim tu yê bi min re dansê bikî... Va ye gula sortirîn a cîhanê. Tu yê wê îşev bi ber dilê xwe ve daleqînî, em ê bi hev re dansê bikin û ew ê ji te re bêje ku ez çiqas ji te hez dikim.”

Keçikê got: “Mixabin, xemgîn im. Ew li rengê fistanê min nayê û serbaz ji min re hinek mucewherên heqîqî şand. Her kes dizane ku mucewher ji gulan buhatir in.”

Xwendekar bi hêrs qêriya: “Erê, ev e tevahiya spasiya ku min stend?” Gul avêt nava rê û tekelê erebeyekê di ser re derbas bû.

Keçikê kire qêrîn: “Tu çawa dikarî bi min re wiha biaxivî, tu kî yî? Tenê xwendekarek!” Ji ser kursiya xwe rabû û çû hundir.

Xwendekar ji wê derê bi dûr ket û ji xwe re got: “Evîn, çi tiştêkî ehmeqî ye! Wekî aqil bi fêde jî nîn e, ji ber ku rastiya tu tiştêkî îsbat nake. Evîn ji me re timî behsa tiştên ku pêk nayên dike û meriv bi tiştên ne rast dide bawerkirin. Ji serî heta paşî tewş e. Divê meriv di van demên zor de hînî tiştên baş bibe. Ez ê vegerim ser xebatên xwe.”

Vegeriya mala xwe, pirtûkeke mezin û tozgirtî derxist û dest bi xwendinê kir.

Wergera ji Îngilîzî: Mizgîn AYDIN

Mîrze û stî


Ernest HEMINGWAY

Mîrze û Stî Eliot, ji bo ku pitokekî wan çêbibe gelekî hewl dan. Piştî ku zewicîn li Bostonê û di rêwîtiyên bi keştiyê de heta ku hêza Mîrze Eliot hebû, ji bo vê yekê hewl dan. Di keştiyê de gelekî pê re mijûl nebû ji ber ku Stî Eliot nexweş bû. Gava ku nexweş diket jî mîna jinikên li başûrê Emerîkaya Yekbûyî nexweş diket. Mîna hemû jinên Başûrî ew jî ji ber pêketina deryayê, rêwîtiyên şevê û şiyarbûna sibehê zû ji hal de diket.

Piraniya rêwiyan gotibûn qey ew diya Mîrze Eliot e. Yên din ku dizanibûn ew zewicîne, nexweşiya wê bi ducaniya wê ve girêdidan. Ya rastîn çil salî bû, lê piştî ku derdiket rêwîtiya ser deryayê bi carekê re pîr bûbû. Ji ber ku xwediya mexazeya çayê bû ku Eliot ew ji mêj ve nas dikir, berêvarekê ew maç kiribû, vir de wê de piştî eşkerekirina evîna wan bi çend hefteyan zewicibûn jî. Stî Eliot ku wê gavê temenê xwe yê rastîn nedida der hê gelekî ciwan bû.

Gava Hubert Eliot zewicibû li zanîngeha Harvardê îxtîsasa dadê digirt. Tenê helbestkarekî ku hatina wî nêzî deh hezar dolar bû. Bi lezekê helbestên dûvdirêj dinivîsî. Bîst û pênc salî bû û heta ku bi Stî Eliotê re zewicî bi tu jinikan re raneketibû. Xwestibû ku safbûna xwe biparêze. Ji ber vê yekê dikaribû bi rihetî ji xaniya xwe ew çîçiya ku wî jî dikaribû bidaya wê bixwesta. Hubert ev yek wekî "bi duristî jiyîn" bi nav dikir. Beriya ku Stî Eliot maç bike bi gelek keçikan re bi hev şa bûbûn, lêbelê zû yan dereng haya wan pê xistibû ku jiyaneke duristî dijî. Li ser vê tekê hema hema hemû keçikan têkiliya xwe ya bi wî re qut kiribûn. Nîşanibûn û zewaca keçikan a bi mîrên ku jiyaneke pelos dijiyan re hîseke erjeng dixist dilê wî. Carekê ji ber ku keçeke ku li kolejê ew nas dikir li hemberî yekî ku diyar bû çî tolaz bû hişyar kiribû tişteki gelekî nexweş hatibû serê wî.

Navê Stî Eliotê Cornelia bû. Hînî mîrê xwe



Ernest Hemingway

kiribû ku bi nasnavê malbata wê ya başûrî ku Calutina bû bangî wê bike. Piştî zewaca wan gava ku Eliot, Cornelia biribû mal, diya wê giriyabû, lêbelê piştî ku gotibûn ew ê li mel-bendê bijîn hinekî aş bûbû.

Gava Eliot qala jiyana xwe ya bi duristî kiribû, Corneliyê ji her demê bêtir ew ber bi xwe kişandibû û jê re gotibû; "Axx, hêja, şekiro..." Cornelia jî yeka mîna wî bû. Jê re gotibû; "Hela dîsa min mîna wê demê maç bike." Huber mikur hat ku maçkirina wisa ji serboriyeke ku hevalekî wî qal kiriye hîn bûye. Her dem bi tecrubeyên xwe şanaz bû... Paşê jî bi hev re heta ji destê wan hat bi pêş xistin. Carnan di navbera maçkirinên dûvdirêj de, Corneliyayê dipirsî ku bi rastî jî wî jiyana xwe ya saf ji bo wê paqij hiştiye yan na û peyvên mîrê wê yên ku her dem evîni bûn ew mest dikir.

Berî hingê zewaca bi Corneliyê re qet nedihat bîra Hubert. Tu carî bi wî çavî jî lê neniherîbû. Tenê hevalekî wê yî baş bû. Lêbelê rojekê, li paş mexazeyê li ber giramafonê dans dikirin hevala Corneliyê derketibû aliyê pêşiyê yê dikanê, Corneliyê li çavên wî nihêribû û wî jî ew maç

kiribû. Nayê hişê wî ku kengî biryara zewacê wergirtibûn, lêbelê zewicîbûn...

Gava zewicîn şeva xwe ya pêşîn li Bostonê li hotelekê borandin. Her du jî bi heyecan bûn. Lêbelê di taliyê de Cornelia razabû. Lêbelê Hubert raneza. Ligel ku bornozê jaegerî ku ji bo şîrînmehê kiribû lê bû jî çend caran derket korîdora hotelê û bi jêr û jor de çû û hat. Gava dimeşîya çavên xwe li solên biçûk û mezin ku li ber deriyên hatibûn rêzkirin digeland. Vê rewşê kir ku dilê wî bi heyecan bike gurpegurp. Bi lez çû odeya xwe, Corneliyê di xew de bû. Qêmiş nekir ku şîyar bike. Gelek di ser re neçû ew jî sakîn bû û kete xeweke giran.

Roja dinê telefonî diya Hubert kirin. Rojek paşê jî ji bo ku biçin Ewropayê li keştiyê siwar bûn. Pêkan bû ku di keştiyê de dest bavêtana kar ji bo pitokekî û li darê dinyayê ji her tiştî bêtir zarokek dixwestin, lêbelê Corneliyê nikarîbû tehamûlî tişteki wisa bikira.

Li Cherburgê derketin bejahiyê, çûn Parîsê. Li wir jî careke din, ji bo ku zarokekî wan çêbibe hewl dan. Paşê jî ber bi Dijon a ku zanîngeheke wê ya ku havînê somestrê dike hebû û ligel rêwiyên ku bi wan re bûn berê xwe dane wir.

Li Dijonê tişteki bala wan nekişand. Hubert hema bênavber helbest dinivîsand û Corneliyê jî ew textîlo dîkir. Hemû helbest jî gelekî dirêj bûn. Hubert der barê çewtiyan de gelekî hûrbijêr tevdiageriya. Heger jina wî şaşıyek jî bikira, hemû rûpel jî nû ve pê dida nivîsîn, li ser vê yekê jî Corneliyê jî têra xwe digiriya. Ligel vê jî li Dijonê çend caran karê zarokçêkirinê ceribandibûn...

Paşê vegeriyan Parîsê... Nasên wan jî vegeriya bûn Parîsê. Hem çawa be, mirov dikaribû bigota piştî Harvard, Columbia û Wabashê li zankoya Dijonê ku li Cote d'Orê bû lêkolîn kiribûn. Heger zanîngeh hebûya gelekê wan wê biçûna Languedocê, Montpellierê yan jî Perpignanê, lêbelê ew der jî gelekî dûr bûn. Heçku Dijon çar saetan ji Parîsê dûrtir bû, tew xwaringeha trêne jî hebû.

Bi vî awayî, heta tu bibêji ji gazînoya Rotondoyê ku her dem bi kesên biyan tijî bû dûr li wî milê kolanê, li Café du Domeyê çend roj bi hev re borandin. Paşê Eliotan bi saya îlaneke New York Heraldê li Touraineyê şatoyek kirê kir. Eliot

bûbû xwedî gelek dostên ku kêfa wan ji helbestên wî re dihatin. Pîreka wî ji bo ku van helbestan ji hevala wê ya mexazeya çayê re bişîne israr dîkir. Paşê piştî ku hevala wê jî hate cem wan dilê Stî Eliotê gelekî rihet bû êdî... Bi hev re têra xwe digiriyan. Hevala wê ya ku keça malbateke gelekî kevnar a başûrî bû çend salan ji Corneliyê mezintir bû û her dem ji Corneliyê re digot şekira min.

Her sê ligel dostên ku ji wî re digotin Hubie, çûn şatoya Touraineyê. Dîtin ku Touraine jî mîna Kansasê rast rast e û gelekî germ e. Hema bibêji helbestên Eliot têra pirtûkekê ketibûn ser hev. Dê ew li Bostonê çap bikira. Nameya xwe ya tek-lîfê şandibû û peymana xwe jî çêkiribû...

Kurtedemekê paşê, dostên wî barkiribûn Parîsê... Êdî çêja Touraineyê ya mîna rojên pêşîn nemabû. Îcar jî bi helbestkarekî ciwan, dewlemend û azîb re, çûbûn ciyekî nêzî Trouvilleyê ji bo gereke li ber perê deryayê. Hemû jî gelekî bextewar bûn...

Eliot li şatoya Touraineyê ma. Ji ber ku ew jî bo hemû havînê kirê kiribû. Bi Stî Eliotê re, li ser doşeka fireh a odeya wan a fireh û germ a razanê gelekî hewl dan. Stî Eliotê, hînî awayê dehtilîkî dibû li ser textîloyê. Lêbelê digel ku lez zêde dibû hate dîtin ku gelek şaşî jî têne kirin. Li ser vê yekê hevala wê ya keçik hemû nivîs bi rêbaza pratîk dinivîsî. Heta tu bibêji paqij û ewle dinivîsî û wisa xuya bû ku ji vî karî çêj jî werdigirt.

Eliot hînî vexwarina şerava spî bûbû. Li odeya xwe cihê dijiya. Bi şev bênavber helbest dinivîsî, sibehan jî bêtaqet dixuya. Êdî Stî Eliot û hevala xwe, di nava wan nivînên mîna yê serdema navîn de, bi hev re radizan. Ji bo şîvê, li baxçeyê ku bayê sargermî yê esirkî dibalivî hemû bi hev re rûdiniştin, gava Eliot şerava xwe ya spî vedixwar Stî Eliot û hevala xwe jî sohbet dikirin. Yanê hemû jî gelekî bextewar bûn.

* Navê çirokê yê resen, "Mr. and Mrs. Elliot," e.

(Wergera ji îngilîzî; Sîdar JîR)

Ji Isaac Babel re rêzdarî

Doris LESSING

Roja ku min biryar dabû ku Catherine bi xwe re bibim û li dibistana wî ya li gund serlêdana

hevalê xwe yê ciwan Philip bikim, diviya em di saet yazdehan de biçûna lê ew di saet nehan de hat. Kincên wê yê şîn nû bûn û her wiha pêlavên wê yên xweşik jî nû bûn. Wê porê xwe jî teze çekiribû. Ew jî her demê bêhtir weke keçika Renoir* a pembe û zêrinî ku ji jiyane her tiştî hêvî dikir bû.

Catherine li maleke spî ku ji jor ve li pêlên rûbar ên malaşker mêze dike dijî. Wê ji bo paqijkirina mala min bi dilxwaziyeke ku nîşan dida, wê malên biçûk pevra ji xaniyên mezin romantîktir didît, alikariya min kir. Me çay vexwar û em piranî li ser Philipê panzdeh salî ku ji xwarinê bigire heta muzîkê jî bo her tiştî xwedî hezkirineke bi zor û zehmetî bû, axivîn. Catherine li pirtûkên li jûra wî raxistî bûn mêze kir û daxwaz kir ka ew dikare pirtûka çîrokên Isaac Babel bibe ji bo ku di trenê de bixwîne. Catherine sêzdeh salî ye. Min got dibe ku ew çîrok bi wê zor werin lê wê got: "Philip wan dixwîne, ne wisa?"

Di dema rêwitiyê de min rojname xwend û li rûyê wê yê bedew ku dema wê rûpelên Babel dizivirandin, tîrş dibû mêze dikir ji ber ku ew bi biryar bû jî bo ku tu tişt nekeve navbera wê û daxwaza wê ya ku hêjayî Philip bibe.

Li dibistana delal, şareza û giranbiha du zarok ber bi zeviyan bi hêşinayî ve dimeşyan û min



Doris Lessing (Doris May Taylor)

22.10.1919 Kermanshan. Ji ber ku bavê wê rêvebirê bankayekê bû li Îranê hat dinê. Di 5 saliya xwe de bi malbata xwe re çû Rodezyayê (Zîmbabwe). Li dibistaneke katolîkan xwend. Di 14 saliya xwe de serî li ber malbata xwe rakir û dev ji dibistanê berda. Di 18 saliya xwe de di avakirina partiyeke çepgir a dijî nijadperestiyê de cih girt. Di 1943'an de bû endama Partiya Komunîst, bi çalakvanê Alman Gottfried Lessing re zewicî. Di 1949'an de hem dev ji Rodezyayê û hem jî mêrê xwe berda. Û li Londrayê bi cih bû. Ji wê demê û vir ve wek nivîskareke profesyonel dijî. Gelek roman û çîrok nivîsîne. Di berhemên xwe de jiyana kesên ku di nav tevliheviya siyasetê û civakî ya sedsala 20'emîn de mane digire dest. Bi piranî li ser femînîzîm û şerê navbera zayenda sekiniye. Romana wê ya ku herî zêde hatiye xwendin û wergerandin; *Lênûska Zêrîn* (1962) e. Wek rikneke tevgera jinê tê dîtin.

Di 11.10.2007'an de Xelata Wêjeyî ya Nobelê wergirtiye. Di nav kesên ku ev xelat wergirtine de kesa herî pîr e.

li biriqandina rojê ku li ser serê wan ên biriqok û dîlsoz ku di dema axaftinê de çerxî hev dibûn temaşe kir û ew şopandin. Catherine di destê xwe yê çepê de pirtûka çirokên Isaac Babel hildigirtin.

Piştî firavînê em çûn sînemayê. Philip da xuyakirin ku tenê ji bo kêfê çûna sînemayê ne li gorî mirovên zîrek bû, lê wî ew ji bo xatirê me qebûl kir. Me jî ji bo xatirê wî ji her du filmên ku li bajarokê biçûk dihatin pêşandan yê herî cidî hîlbijart. Fîlm der heqê keşeyekî dîlpak ku li New Yorkê alikariya sûcdaran dikir, bû. Lê dîlpakiya wî têrê nekir ku yekî ji wan ji şandina jûra gazê bifilitîne. Ez û Philip di tariyê de li benda Catherine man heta ku wê giriyê xwe sekinandiye û hêza ku xwe berde nava şeva çîk û sayî dîtiye.

Li ber deriyê sînemayê, dergevan li kesên ji girî çavsorkirî dîpa. Wî Catherine bi pî re hişk girt û bi zimanekî tûj got: "Ka tu çima digirî? Divê ew ji ber sûcê xwe bihata cezakirin, ne wisa?" Catherine bi heyirîn li wî nêrî. Philip bi gotinên biçûkdîtbar ew ji wê rewşê rizgar kir: "Hinek meriv jî rastiye ji xerabiyê dernaxin, her çiqas ew yek ji wan re hatibe nîşandan jî." Dergevan bala xwe zivirand ser yeke din a çavsozbûyî ku ji tarîtiya hundir derdiket û em bi hev re heya îstgeha ku ji ber hovîtiya cîhanê weke zarokekî bêdeng bû, çûn.

Di dawiyê de Catherine bi çavên dîsa şil got: "Bi fikira min ew giş bi temamî hovane ye û tehemûla min bi fikirîna wê re jî tune ye." Philip got: "Lê belê, pêwîst e em wê yekê bifikirin. Ma tu nabînî? Heke em wê yekê nefikirin, ew ê heta û heta bidome, ma tu vê nabînî?"

Di trena ku vedigeriya Londonê de ez li kêleka Catherine rûniştim. Wê pirtûka çîrokan li pêş xwe vekiribû, lê wê got: "Philip yekcar bextewar e. Xwezî ez jî biçûma wê dibistanê. Te ew keçika ku li baxçeyê dibistanê ji wî re got merheba ferq kir? Diyar e hevaltiyeke wan a pir baş heye. Xwezî dayika min jî bihiştta ku min kincekî wek wê li xwe bikira, ew neheqî ye."

- Bi min ew ne li gorî salên wê bû.

- Hii, bi rastî ?

Wê hema serê xwe bi ser pirtûkê ve xwar kir lê tavi lê dîsa rakir û got :

- Gelo ew nivîskarekî gelekî navdar e ?

- Ew nivîskarekî gewre û jêhatî ye, yekî ji yên herî baş e.

- Çima ?

- Belê, ji bo tiştêkî; zimanê wî pir hêsan e. Binêre çiqas hindik peyvan bi kar tîne û çîrokên wî çiqas bihêz in.

- Ez dibînim. Tu wî nas dikî ? Ew li Londonê dijî ?

- Na, ew miriye.

- Wey!! Wê demê çima we... Ji teşeyê axaftina we min got qey ew dijî.

- Bibore, min ew mîna ku miriye nedifikirî.

- Ew kengê mir?

- Ew hat kuştin. Bi texmîna min berî nêzî bîst salan bû.

Bîst sal! Destên wê mîna ku dikira pirtûkê bavêje ser min dest bi tevgerê kirin lê pişt re sist bûn. Wê bi awirên tûj got:

- Ez ê di sermawezê de bikevim çardeh saliyê. Mîna ku gefek lê hatibe xwarin.

Min nikaribû lêborîna xwe bînim zimên, lê berî ku ez bipeyivim wê dîsa bi baldarî û bi sebr pirs kir:

- Te got ew hatibû kuştin?

- Belê.

- Ez hêvî dikim ew kesê ku ew kuştî bi ber xwe ket dema hîn bû ku wî kesekî navdar kuştîye.

- Belê, ez hêvîdar im wisa ye.

- Ma ew kal bû dema ku hat kuştin?

- Na, bi rastî ew qas ne kal bû.

- Belê ew bêsûdiyek e, ne wisa ?

- Belê, bi min jî ew bêsiûdiyek e.

- Bi te baştirîn çîroka di vir de kîjan e? Ango, bi dilê te ya herî herî baş?

Min çîroka li ser kuştina qaz hîlbijart. Wê ew hêdîka dixwend dema ku ez li bendê rûniştibûm û min dixwest ku pirtûkê ji wê bistînim bi hêviya ku vê keçîka biçûk û delal ji Isaac Babel biparêzim.

Dema wê xilas kir, got:

- Belê, hinekî ji çîrokê fêr nakim. Ew bi awayekî pêkenok nêzikî tiştan dibe. Ma çima divê lingên mêrekî ku di botan de ne weke *keçîkan* xuya bikin? Di dawiyê de wê pirtûk dirêjî min kir û got; "Bi fikira min ew giş merezdariyek e."

- Lê divê tu şewaza jiyana ku ew dijiya fêr bikî. Ew cihûyekî li Rûsyayê bû.

Ew yek têra xwe tiştekî nebaş bû. Wekî din, tiştên ku ji serê wî borî şoreş bû, şerê navxweyî bû û...

Lê min dikaribû ew gotinên ku ji sayîcamekanên nêrînên wê diqetiyên û rastî bi tundî înkâr dikirin, bibînim; û min got:

- Binêre Catherine, tu dikarî vê dema ku tu mezintir bûyî jî biceribînî. Gengaz e tu dê wê çaxê bêhtir ji wî hez bikî.

Wê bi awayekî spasdar:

- Belê, belkî ya herî baş ew e. Her wiha, Philip ji min du salan mezintir e, ne wisa?

Piştî hefteyekê min ji Catherine nameyek wergirt.

"Zor spas ji bo wê comerdîya ku te ez birim serdana Philip li dibistanê. Ew di tevahiya jiyana min de roja herî kêfxweş bû. Ez ji ber birina serdanê ji te re gelekî spasdar im. Ez li

ser Hoodlum Priest difikirim. Wî filmê bêşik şanî min da ku cezayê dardekirinê tiştekî xerab e û ez ê tiştê ku ez li wê piştî nivroyê fêrbûme qet ji bîr nekim û dersa ku min jê girtî wê di tevahiya jiyana min de bi min re be. Ez li ser tiştê ku te li ser kurteçîroknûsê navdar ê Ûrisî Isaac Babel gotî kûr fikirîm û ez niha dibînim ku tiştê ku wî dike nivîskarê mezin ew bixwe ye, béguman hêsanîya şewaza wî ya bi zanayî ye. Niha di nivîsarên min ên dibistanê de, ez hewl didim ku mîna wî bibim bi mebesta ku hînî hêsanîya bi zanayî bibim ku ew jî bingeha şewaza nivîsîneke bi rastî têkûz e. Silav ji dil, Catherine."

Nîşe: Ka Philip der heqê partiya min de tiştek gotiye? Min ji wî re nivîsî lê wî tu bersiv neda. Ji kerama xwe re hîn bibe ka ew tê yan jî wî bi tenê ji bîr kir ku bersivê bide nameya min. Ez bi hêviya hatina wî me ji ber ku ew neyê ez dibêim ez ê bimirim.

Paşênîşe: Ji kerema xwe re ji wî re nebêje ku min ji te re tiştek gotiye, ji ber ku ew bizanibe dilê min ê nikaribe vê yekê rabigire.

Silav ji dil, Catherine.

Têbînî:

* **Renoir:** Wênesazekî Frensî yê sedsala nozdehemîn ku ji koma împresyonîst tê hesibandin.

Wergera ji îngilîzî: DiYaKo

knowtake@gmail.com

Aslîka QADIR:

“Muzîka kurdî behreke bêbinî ye”

Ew bi dengê xwe, bi strana xwe ya “Welatê me Kurdistan e...” dihate naskirin. Kurdekî/ê ku dengê wê yê zelal û nermik nebihîstibe tune ye. Di Radyoya Yêrîvanê de dengê wê bi destpêka “Godarên e’zîz...” a Keremê Seyad dihate bihîstin... Belê Aslîka Qadir a ku bi dengê xwe di nava kurdan de dihate naskirin bû mêvanê şevên strînên Amedê. Me jî xwe gihîştand wê û me daxwaza hevpeyvînekê lê kir. Wê jî em neşikandin, ji bo xwendevanên Kovara Wyê pirsên me bersivand. Me li ser muzîka kurdî, zimanê kurdî û rewşa kurdan a siyasî hevpeyvîn pêk anî. Aslîka Qadir hest û ramanên xwe yên li Amedê bi xwendevanên Kovara Wyê re parve kir.

Hevpeyvîn: Enîse ŞÎRÎN - Azad ZAL

W- Di nava axaftinên xwe de tu dibêji ku ‘denge min li vir tê naskirin, lê ez nayê naskirin’. Ev tiştekî pir balkêş e. Wê çaxê em bipirsîn; gelo Aslîka Qadir kî ye? Wek stranbêjê jî tu xwe çawa didî naskirin, stranbêjiya te çawa dest pê kir û dixwazî heta ku bibî?

Aslîka Qadir: Ez Aslîk qîza Qadirê Emir li gundê Elegezê, Ermenistanê ji dayîk bûme. Lê kal û bavê min, kalê bavê bavê min, ji Qersê mecbûr mane hatine Ermenistanê û ji ber ku em ji aliyê diya xwe ve êzîdî bûne zehmetiya me dûbil bûye.

Min dibistana xwe hema ji gundê Elegezê dest pê kiriye. Min dibistina orte xilas kiriye. Ez derketim bi malbatê re çûme Yêrîvanê, paytexta Ermenistanê. Ez ketimê unîversîteyê. Min doktoraya ‘Ziman û Edebiyata Ermenîkî’ kuta kiriye. Paşê min dest bi stranbêjiyê kiriye.

Radyoya Yêrîvanê Paya Kurdî, cîranê unîversîteya ku min lê ders dixwend bû. Min gelek mereq dikir ku kurdên derveyî Ermenistanê çawa dijîn. Kurdên Başûrê Kurdistanê, Bakurê Kurdistanê.... Ji bo vê yekê ez diçûm radyoyê ku agahdariyan bistînim. Ji ber ku min zanibû agahdariyên durist, rast ez ê karibim bi tenê ji radyoyê bigirim; ez diçûm radyoyê. Hêdî hêdî girêdana min bi radyoyê re çêbû.

Xebatkarên radyoyê gelek ente-

lektuel bûn. Niha gelek ji xebatê derketine. Rewşa radyoyê jî niha ew qas ne baş e. Lê belê texmîn dikim saet û nîvek, rojê du cara didan. Xebatkarên wan navê yekî Memê bû. Du şairên me yî gelek layiq, dikarim bibêjim bi marîfet û mezin; Fêrikê Êsiv, Mikailê Reşîd -her du jî çûne rahmetê- min sê helbestên wan jî wek stran gotine. Ew jî li wira dixebitîn. Yekemîn stranên ku min gotiye, stranên şairê-şiqeqî ermenî heye navê wî Sayad Nova ye. Wan salan 250 saliya wî pîroz dikirin û Egîdê Cimo carekê hat li dengê min guhdar kir û got; “Dengê te çiqas xweş e. Were em stranên Sayad Nova bidine te, bistirê.” Heciyê Cindî -ew serbilindahiya me ye- û Fêrikê Êsiv ew stran wergerandibûn kurdî. Kiribûn pirtûk, pirtûk dan min, gotin kîjan bi dilê te ye hîlbijêre. Min du stran hîlbijart. Yek navê wê ‘Hetanî Hebim’, ya din jî ‘Kemençe’ bû.

Ez rast bêjim ez hê biçûk bûm ji min ji huner û çandê gelek hez dikir. Bavê min jî stran digotin, lê li mal ji me re digot. Bavê min xisleteke (taybetî) wî ya ecêb hebû, di dema Stalîn de birayekî wî sirgûnî Sibîryayê kiribûn. Hûn jî dizanin berê li ser tiştekî netê, biçûk dihatin sirgûnkirin. Cîranek ji cîranekî aciz bibûya giliyê wî dikir, te her didît bi şev dihatin dibirin. Tê bîra min, diya min ji min re digot; “Jineke gundiye me yeke pîr ku rismê Stalîn û Serokên Rûsyayê yên din nas nedikir, tîne morîkên xwe dike nava

Hinek guherîn pêk hatine lê têr nakin. Bi baweriya min wîha namîne. Ez baweriya xwe qet wenda nakim. Lewre “heqîqet nexweş dikeve lê qet namire”. Ev gotin a kê ye niha nayê bîra min. Rastiya kurdan jî nexweş e. Lê namire, wê hêdî hêdî qenc bibe. Wê rabe ser xwe û her tişt wê baş bibe.

rojnameyeke ku resmê Stalîn li ser e. A ji ber vê yekê ew jinika pîr a 70 salî şandin Sibîryayê." Ew wexteke gelek pîs bû. Îcar bavê min gelek xema birayê xwe dixwar. Jin û zarokên wî li wê derê mabûn û ew şandibûn Sibîryayê. Bavê min bi şev di xew de distira, kilam davêt ser birayê xwe û digiriya. Em tev ji xewê radikirin û em radibûn me didît ku bavê me kilaman dibêje, digirî lê razayî ye. Di xewn û xeyala xwe de kilam diavêt ser birayê xwe, qet ji bîra min naçe tiştekî ecêb bû. Dengê wî ji gelek xweş bû. Û carna ez fêrî kilaman dikirim. Ewî hez dikir ku ez stranan bibêjim. Mirovekî pêşverû bû. Diya min ji nexwendî bû lê qîmeteke gelek mezin dida xwendinê. Dixwest ku zarokên wê bi pêş bikevin. Ermenistan hinekî cihê ye, ne weke Tirkîyê ye. (Ez qala 50 sal beriya niha dikim.) Diya min nexwendî bû lê jineke gelek bîaqil bû. Jineke bi xisletên gelek baş bû. Diya min ji bo min bûbû mînak jiyanê. Ez dibêjim çi tiştên baş hene min ji diya xwe girtine. Em heft zarok bûn (sê bira û çar xwişk). Ji wan heftan şeşan xwendina bilind kirine. Lê xwişkeke min hebû ji xwendinê hez nedikir, mane dikirin digot serê min diêşê. Tenê wê nexwend. Me gişan xwendina bilind heye.

Min zanîngeh xilas kir. Ez zewicîm, du zarokên min çêbûn; yek kur, yek keç û min navber da stranan.

Min ji bîr kir ez bibêjim. Stranên Sayad Nova me ji bo carekê got. Lê mîletê jê hez kir û di fonda radyoyê de man, heta niha ji ew wan stranan didin. Û li Ermenistanê ez bi wan stranan meşhûr bûm. Paşê strana *'Welatê Me Kurdistan e'* derkete holê.

Egîdê Cimo ku mamosteyê min bû, paşê bû bavhostayê min ê muzîkê. Ji min re got stranek heye tam ji bo dengê te ye. Gerek tu xwe hazir bikî em wê stranê çêkin. Min ji jixwe ji tiştekî wisa hez dikir. Min gelek hez dikir ku ez tiştekî çêkim tiştekî bikim. Ez wê çaxê 17 salî bûm. Ez çûm wê derê me çêkir. Komek hebû min got û wan çêkir. Li vir ez tiştekî bibêjim; wan salan gelek xeter bû ku navê



Kurdistanê bê gotin. 'Welatê Me Kurdistan e' di sala 1963'yan de hatiye çêkirin. Ji bo Ermenîyan jî gotina 'Kurdistan'ê wek sîleyekê bû. Nedixwestin ku cîranên xwe (Tirkîyeyê) bikin dijmin. Heta nivîsên radyoyê pêşiyê werdigerandin ermenkî, piştî ku didîtin tiştekî welatparêziyê, navê Kurdistanê tê de tune hîna didan radyoyê. Weka propagandaya Sovyetê em gişt bira ne. Welatek heye ji bo mîletan gişt ew ji Yekîtiya Sovyetê ye. Kê dikaribû bigota ji derveyî Sovyetê welatek heye; Kurdistan û ew welatê me ye. Paşê wisa çêbû komek ji Moskovayê hat, wekî ku stranên Ermenîyan û kurdî tecîl bikin bibin. Egîdê Cimo yekser di radyoyê de dixebitî, yekser koma xwe dîsa hazir kir em bi şev di duduyan nîrê sisêyan de em çûne bînaya operayê, me li wê derê stran tecîl kirin; 11 stranên kurdî. Di nav wan de jî 'Welatê Me Kurdistan e' hebû. Ew stran çûn Rûsyayê. Piştî du mehan dîsa vegeyriyan Ermenistanê. Wisa me kire nava fondê, qet Ermenî pê nehesiyan ku me ew stran tecîl kiriye jî. Paşê ew stran bû straneke hezkirî. Bû wek sirûdekê sirûda wextê xwe û kurdekî/e ku ev stran nebihîstibe tune ye. Heta niha ez li

Diya min ji min re digot; "Jineke gundiye me yeke pîr ku rismê Stalîn û Serokên Rûsyayê yê din nas nedikir, tîne morikên xwe dike nava rojnameyeke ku resmê Stalîn li ser e. A ji ber vê yekê ew jinika pîr a 70 salî şandin Sibîryayê."

keseke/î wisa rast nehatime. Stran bihîstine lê ez nedîtîme. Carna tevî hev dike ka gelo kê ev stran gotiye, navê min jî zahmet e. Nikarin zû zû jiber bikin.

W- Wek kurdeke ku li derveyî welatê xwe diji tu dikarî qala hestên xwe yên gava ku te digot; 'welatê me Kurdistan e' û hestên xwe yên niha bijî?

Aslîka Qadir: Wê stranê di wextê xwe de rola xwe ya mezin lîst. Wê gava ku me digot 'welatê me Kurdistan e', em mecbûr bûn ku di dawiyê de bibêjin; mîlet hemû bira ne. Lê niha ev 'Welatê Me Kurdistan e' bûye tiştekî antîk. Bi vê temayê êdî gelek stran derketine. Lê çi tiştê ku rola xwe lîstibe her tim di dilê mirov de dimîne. Gotin û muzîka vê stranê jî başûre Kurdistanê derketine. Lê bi deng û navê min ketiye nava mîletê. Ciyê xwe yî herî taybet di dilê mîlet de girtiye. Ketiyê nava fonda zêrîn ya Radyoya Yêrîvanê.

W- Te got min ziman û wêjeya ermenî xwendîye. Piştî ku te zanîngeh qedand te tu kar û xebat li ser wê beşê kir?

Aslîka Qadir: Min wê çaxê muzîk berda, ez ketim nav kar û xebata ziman

û wêjeya ermenîyan. Min ew xebat 25 salan domand. Min mamostehiya wî karî kir. Di navberê da du salan ez çûm Rûsyayê, wan ez şandim Efxanistanê wek wergêra zimanê darî. Zimanê darî û farisî nêzî hev in. Ez jî pispore zimanê farisî û ermenî bûm. Ez du salan li wê derê ligel xebata doktorayê wek wergêr xebitîm. Li paytexta Efxanistanê Kabûlê. Paşê îcar ez hatim Minîstîryûma Rewşenbîriya Ermenistanê. Ez li ser metodolojiya hînkirina ziman û edebiyata ermenîyan xebitîm. Yanî ez diçûm dibistanan min mamosteyên ermenîyan fêrî dersdayîna ziman û edebiyata ermenîyan dikir. Xwendekarên min mezin bûne pazdeh şazdeh sal in mamostehiyê dike. Jiyanî min di nav vê mamostehiyê de derbas bû.

W- Em dikarin bibêjin ku we ziman û wêjeya Ermenistanê gihandiye astekê. Em dikarin bibêjin ku jin di wê demê de di nava xebatên zanistî de zêde cî nagirin. Bi vê yekê re gelo li ser ziman û wêjeya kurdî tu xebatên te yên giştî yan jî bi taybetî çêbûn an na?

Aslîka Qadir: Bo ya kurdî; ev tiştekî ecêb e. Ez ne spîtalîsta zimanê kurdî me. Ji ber ku li wê derê beşa zimanê kurdî jî heye. Ku kes xilas dike dibin pispore/a zimanê kurdî. Ez pispore zimanê farisî û ermenî me. Ji min re gotin ku wekî alfabeya dîrsa yekemîn divê ku bê guhertin. Ji ber ku ew alfabeya ku Heciyê Cindî çêkiriye, ew profesore me yî bi nav û deng, lê di wê pirtûkê de navê komunîzmê, navê kolxoz û solxozan, ê ku propagandaya sovyetê dihate kirin hebûn. Dawiyê sovyet hate hilweşandin, ew alfabe jî kevn bû. Diviya ku nûjen bikirina. Ji min re gotin divê ku tu li ser bixebitî û alfabekekê çêkî. Min bi dil û can xwest ku ez vî karî bikim. Paşê Firîda Cewarî qîza Heciyê Cindî ew jî rewşenbîr e. Gotin ku li ser navê Heciyê Cindî em naxwazin ku bê guhertin. Lewre ev

Çi tiştê ku rola xwe lîstibe her tim di dilê mirov de dimîne. Gotin û muzîka vê stranê jî başûre Kurdistanê derketine. Lê bi deng û navê min ketiye nava mîletê. Ciyê xwe yî herî taybet di dilê mîlet de girtiye. Ketiyê nava fonda zêrîn ya Radyoya Yêrîvanê.



berhemeke gelek mezin e ji bo kurdan, ji bo edebiyata kurdî. Em dest nadinê bila li ser navê wî bimîne û min dest jê kişand.

W- Wek stranbêjeke jin nêrîna te li ser muzîk û dengbêjiya kurdî çawa ye? Wekî din jî stranbêjên jin wek Eyşe Şan, Meyremxan û yên din hene, we ji wan çiqas sûd wergirt? Tu stranbêjiya wan û ya heyî çawa dinirxînî?



Aslîka Qadir: Muzîka kurdî behreke bêbinî ye. Gelekî dewlemend e. Stranbêjên jin wek Eyşe Şan, Meyremxan, ji cem me Sûsika Simo, Berga Qadir û gelekên din ên ku navên wan nayên bîra min. Ez vana datînim rêza şoreşgeran. Bindest bûne. Di rewşeke zehmet de jiyane. Mala wan ava be. Dîsa jî dikaribûne ji bo gelê xwe tiştêkî bikin. Ez wan şoreşger hesab dikim. Ji milyonan yek in. Lê bi milyonan mirovan li dû xwe dibin. Tê bîra min gava diya min çû ser dilovaniya xwe min strana Eyşe Şanê ya ku li ser dayika xwe dibêje min danî û ez têr giriyam.

Li Yêrîvanê dengê kurdên din nediket guhê me. Ji ber vê yekê ez nikarim bibêjim min gelek ders girtiye. Lê di dawiyê de dema ku çavên min hinekî vebûn min gişt nas kirin, min dît ku vana çi tiştêkî mezin kirine.

Ji bo ku jinên kurd bibin hunermend divê gelek tiştan bidin ber çavên xwe. Tê bîra min ez diçûm radyoyê derdora min, cîranên min, kurdan giştan li dû min xeber didan. Digotin: *“Binîhêre qîza Qado dîsa çû radyoyê û dengê xwe dike radyoyê, qet şerm nake. Eyb e ji bo kurdan.”* Yanî em di vê riya dijar re derbas bûne. Min ji bo kurd û kurdariyê gelek tişt wînd kiriyê û gelek tişt jî bi dest xistiye. Riya hunermendên kurd bi taybetî yên jin gelekî bi kevir, dar û ber û agir e. Loma ez ji wana re dibêjim ew şoreşger in. Gelek mirovan li dû xwe

dibin.

Kurdên me jî hes dikin ku stranan bibêjin, bireqisin û şahiyên xwe bikin. Lê ku yek jî diçe stranan dibêje, dibêjin; *“hey looo!”* Tiştan mezin dikin. Bi vî xortî re distirê. Divê ku ew lêxe ez jî bibêjim. Nayê wê maneyê ku min tiştêkî xerab kiriyê. Hevserê min jî xwenda bû. Di zanîngehê de em bi hev re bûn. Lê min gelek jî zorî kişand. Ji ber paşverûtiya gelê me. Niha ez dibêjim de wexta çavên xwe vekin, zarokên xwe bidin xwendin. Ez qîmeteke gelek mezin didim keç û jinên xwendekar. Xwendin dikare miletê me ji bindestiyê xilas bike. Heke na em ê hinekî din paş ve herin.

W- Ev tiştên ku hûn qal dikin demên berê bûn ne wisa? Ku hûn wan salan û niha bidin ber hev çi pêşketin hene?

Aslîka Qadir: Helbet pêşketin heye. Ez înkâr nakim. Ez qala dema xwe dikim. Niha hinekî hêsa bûye. Ez dibînim gelek keç dixwazin xwe pêş ve bibin. Mesela me duh li vir prova dikir, keçikekê, diya wê bi destê wê girtibû ew anîbû. Ji min re digot hîn bike. Lê vana jî zor hindik in. Ez çûm nan bixwim. Jinikeke sergirêdayî cilên dirêj lê, car caran dizivirî û li min dinîhêrî. Paşê xwe zeft nekir û hate cem min. Ez nas kiribûm. Di televîzyonê de ez dîtme. Hat got; *“ez ji bo stranên te nabêjim –ew jî baş in- lê mêjiyê te, hişê te diçe li xweşa min. Xeberdana te ya di televîzyonê de diçe xweşa min.”* Ez ecêbmayî mam. Jineke kurd,

Muzîka kurdî behreke bêbinî ye. Gelekî dewlemend e. Stranbêjên jin wek Eyşe Şan, Meyremxan, ji cem me Sûsika Simo, Berga Qadir û gelekên din ên ku navên wan nayên bîra min. Ez vana datînim rêza şoreşgeran. Bindest bûne. Di rewşeke zehmet de jiyane. Mala wan ava be. Dîsa jî dikaribûne ji bo gelê xwe tiştêkî bikin. Ez wan şoreşger hesab dikim.

PIRSGIRÊKA ÊZÎDÎTÎ Û KURDÎTIYÊ

Aslika Qadir: Beşek êzîdî hene, ew xwe kurd nahesibînin. Li Ermenistanê beşeke êzîdîyan her du jî êzîdî ne, lê bûne du perçe, ew jî hikûmeta Ermenistanê ev tişt kiriye. Nivî dibêjin em êzîdî ne û ne kurd in, lê rewşenbîr jî dibêjin em êzîdîne bi dinê xwe ve û kurd in. Ew ên din dibêjin na em êzîdî ne û hew mafê me tune em bibêjin em kurd in. Ewana ditirsîn ku ji wan re bibêji "Tu kurd î, ew dibêjin wekî tu ji wan re dibêji tu misilman î. Ew ji misilmaniyê gelekî aciz in. Çunkî misilmaniyê bi rastî jî gelek tesîreke neyînî li ser wan hiştiye. Loma ew naxwazîn navê kurdan bibihîzin. Lê ew komeke gelek biçûk in. Rewşenbîr neketin nava wan bi serbilindîya xwe ve man.

Ewana bernameyek nivîsî bûn. Bernameya ziman û edebiyata êzîdîkî. Ez rojekê çûm min nihêrî ku kitêb danîne wê derê. Ji min re dibêjin serokê me li wê derê ye bi ermenî. Gotin ji kerema xwe re bixwîne û nêrîna xwe bibêje. Miletêkî teze çêdibe, divê ku em alîkariyê bikin. Min xwend. Bernameya êzîdîkî, ziman û literatura êzîdîkî. Tiştên wiha kê dîtîye, kesî nedîtîye. Dinîhêrim ku her çar aktorên ku nivîskarên kurd in kirine bernameyê, her çar xwendekar û şairê wan û nîzanim çî tiştêkî wisa ecêb, çawa bibêjim ne kompînten wisa nivîsîbûn, wekî nezanî nivîsîbûn. Dramatîka ermenî pir kiribûn navê ku naçe bi kurdî ve. Ji defterên kurdan dizîne, kirine navê û ji xwe re kirine tiştêk. Min xwend serê min mezin bû. Ez dibêjim ev tiştêkî pêkenokî ye. "Hûn çî dibêjin êzîdî êzîdî... ez nikarim vê ewê biparêzim." Min ji wan re got; "Ji kerema xwe vî tiştî bi destê min nekin. Ez bi mîletê xwe re bi destê xwe dijîminahiyê nakim. Ku ji we re lazîm e hûn bi xwe

bikin, ez nakim. Ez ê kengî çêbikim? Wexta ku we bi ilmî îspat kir ku zimanê êzîdîkî heye, ez ê wê çaxê bipejirînim. Ez bibêjim serokê we li Levî Ter Petrosyan zimanê farisî û erebî bi min re xilas kiriye. Bi xwe jî dizane ku zimanê êzîdîkî tune ye. Êzîdîtî ol e û di zimanê min de ew ê ku xwe kurd dihesibîne û ew ê ku xwe êzîdî dihesibînin di navbera tîpeke wan de jî cudahiyeke tune. Ez dibêjim 'a' ew jî wisa, ez dibêjim 'bi'ew jî wisa dibêjin. Yanî çî cudahî di navbera vana de heye ku ez bibêjim zimanêkî nû hatiye çêkirin." Wekî ku miletekî teze çêdibe li Ermenistanê. Min got: "Dilê min gelekî diêşe ji ber ku hûn bi vî awayî fikirîne. Weka ku li Ermenistanê destpêka qirnê 11'an be ku miletekî nû çêbû, heman Ermenistan e. Bes e êdî dest ji vî tiştî berdin. Ez naxwazim bibêim û naxwazim tiştêkî jî bikim."

Paşê êzîdî bûn dijminên min. Li dû min digeriyan, dixwestin xerabiyê bi min bikin. Ku tiyê min an jî xezûrê min hinekî nêzî wan bûna wê min jî lepê wan xilas bikirina. Ez ditirsîyam, min dirêşek (şûjin) dixist çentê xwe ez diçûm xebatê dihatim, min digot ku hinek derkevin pêşîya min ez ê di ciyê wan ê nerm rakim hema. Çawa bikim zarokên min jî gelek ditirsîyan, ez jî. Tiştêkî wisa bûbû em tev li hev ketibûn. Ew ên ku xwe êzîdî dihesibandin tev li hev ketibûn. Di navberê de Seîdê Îbo hate kuştin, çend merivên me hatin kuştin. Wextêkî gelek jar bû...

W- Sedemên vê yekê çî bûn gelo? Êzîdîyan bi xwe wisa dikirin an hinek kesan ew sor dikirin? Tiştêkî wisa hebû an na?

Aslika Qadir: Na ez bibêjim çawa çêdibû; êzîdî dewlemend in, pez û çêlekên wan hene. Wextê ku Sovyet hilweşiya komeke birçî, ku paşê bûn serokê Ermenistanê, êdî sovyet xilas bû. Komunîzm, komunîstî xilas bû li wê derê. Îcar rabûn şoreş kirin. Niha wan şerê Karabaxê dane pêş. Bi navê Karabaxê kursiyên xwe girtine. Weka dibêjin em şer dikin, li Karabaxê em ê azadiya xwe bijîn. Ew ên ku nikaribûn bi xebata xwe bigihîjin astekê, hatin ketin nava siyasê. Di nav de jî mamosteyên min ên ku li zanîngehê ders didan min jî diketin nav siyasê. Îcar êzîdiyên me jî digotin alîkariyê bidin me em xwe îlan bikin wek êzîdî. Birçî bûn. Xwarin û tişt didan wan, digotin alîkariya me bikin ku em bibin hikûmat em ê we wek êzîdî îlan bikin. Îcar Ezîzê Emer xwe kir serokê êzîdîyan. Yekî din jî xwe kir serokê olî (dîn), yanî di nav dewletê de dewleteke din ava dikirin. Ermenîyan jî henekên xwe bi wan dikirin. Lewre gelek nezan bûn. Entelektuel li dû wan nedichûn.

W- Ev pîrsgirêk hîn didomin an na? Na neqediyane, hîna didomin.

Min got: "Dilê min gelekî diêşe ji ber ku hûn bi vî awayî fikirîne. Weka ku li Ermenistanê destpêka qirnê 11'an be ku miletekî nû çêbû, heman Ermenistan e. Bes e êdî dest ji vî tiştî berdin. Ez naxwazim bibêim û naxwazim tiştêkî jî bikim."

Paşê êzîdî bûn dijminên min. Li dû min digeriyan, dixwestin xerabiyê bi min bikin. Ku tiyê min an jî xezûrê min hinekî nêzî wan bûna wê min jî lepê wan xilas bikirina. Ez ditirsîyam, min dirêşek (şûjin) dixist çentê xwe ez diçûm xebatê dihatim, min digot ku hinek derkevin pêşîya min ez ê di ciyê wan ê nerm rakim hema



ciwan, sergirtî li Amedê ez nas kirim û ev tişt ji min re gotin. Tevzî hatin canê min. Weke jineke xwende xeber da, ez gelek şa bûm. Yanî kurd miletekî gelek gelek layiq e. Lê ez çi bibêjim ji telebext re feleka me xayîn e. Hetanî Ehmedê Xanî jî dibêje; *“Ez ecêbmayî dimînim; ji bext û qeder û roja kurdan re, dikaribûn her kesî bikin bindestê xwe lê niha barê xelkê dikişînin. Ji ber ku yekîtiya wan tune bûye, hev negirtine û li dijî hev şer kirine û di xizmeta miletên din de bûne. Xwedê ew xwedî kirine. Lê heger ku em yek bûna wê tirk û ereb û ecem bibûna xulamên me.”* Ez jî dibêjim hunera me, irf û adetên me çanda me em xwedî kirine. ‘Lêlê’ û ‘lolo’yên me em xwedî kirine. Miriyên me dimerin em bi ‘lêlê’ û ‘lolo’yan şîna xwe dikin û miriyên xwe binerd dikin. Şahî dibe dîsa bi ‘lêlê’ û ‘lolo’... çand, çand, çand... ziman, ziman, ziman em xwedî kirine. Îcar niha ez hatime vê derê; Amedê, kes bi kurdî xeber nade. Nikarim bi kesî re biaxivim. Kesên ku bi kurdî xeber didin pir kêmin.

Lê ez tiştêkî bibêjim; ji min re gotin polêsên li vira xwe fêrî kurdî kirine, lê ez dibînim ku kurdên vira jî kurdî ji bîr kirine xwe fêrî tirkî kirine. Eviya tiştêkî ecêb e. Bajarekî wiha mezin ku gişt kurd in ku bi kurdî xeber nedîn wê mala kurdî ava bibe!

Ez li gundekî Elegezê, gundê kurdan mezin bûme. Û pişpora zimanê ermenkî û farisî me. Ez dikarim bibêjim ez bi van zimanan pir baş dizanim, lê ez zimanê xwe jî dizanim. Mala we ava! We çawa zimanê xwe ji bîr kir. Temam, berê pêkutî hebûn lê niha, ez bi cadê ve diçim bi kurdî xeber didim kes ji min re nabêje tu çima kurdî xeber didî. Kes ji we re jî nabêje. Ê xwe fêrî kurdî bikin. Mezinahiya zimanê tirkî ji bo we çi ye yanî! Îngilîzî bûya min ê bigota erê. Zimanê navnetewî ye. Temam, zimanê biyanî hîn bibin lê zimanê xwe jî ji bîr nekin. Niha tiştêkî din hat bîra min; min duh jinikek dît. Bi kurdî pir xweş xeber dida. Diyar bû ku kurdhez bû. Di koroya min de zarokek heye bi kurdî nizane. Eviya bedbextî ye. Gelek muhîm e ku kurd bi ruhê xwe ve bimînin.

Mînak li Rûsyayê gelek cihû hebûn, gişan jî dixwend lê Rûsyayê dîsa jî cî nedida wan. Sovyetê digot erê biratî biratî lê dîsa di binî re weka xwe dikir. Cihûyan zimanê xwe ji bîr kirin. Navên xwe jî guhertin. Malbatên xwe jî guhertin. Xwe wek rûs dan nivîsandin. Lê di ruhê xwe de man cihû. Viya çi da wan; di nav pergala dewletê de gihîştin meqamên bilind. Dewlet û pere gişt kirin destê xwe. Îro dinya gişt di destê wan da ye. Lê kurd wiha jî nakin. Ku kurdan jî wiha bikira min ê bigota erê. Ruh gelek muhîm e, ruh. Lê dîsa jî vira bajarekî kurdan e, kurd bi tenê dijîn li vê derê. Gelek nexweş e, ez pê gelek birîndar bûme. Pir pir ecêbmayî dimînim ku li vê derê bi kurdî nayê xeberdan.

Ji bo ku kurdî pêş bikeve alîkariya kovar, pirtûk û kursan heye. Lê kêmin e. Ya muhîm ew e ku dibistan vebibin. Ku dibistan vebibin, tu dikarî bibêji ziman xilas bû. Lê niha mecala kurdan tune ku dibistanan vebikin. Ew kovar û pirtûkên ku dertên dibe ku kes naxwîne jî. Ji ber ku nizanin bi kurdî bixwînin. Lê dîsa jî divê ev kar bîr kirin. Çirokeke wiha heye:

Di daristanê de dibêjin ewr hat, wê baran bibare. Her kes li çareya serê xwe digere. Çivîkeke biçûk heye xwe davêje

Mala we ava! We çawa zimanê xwe ji bîr kir. Temam, berê pêkutî hebûn lê niha, ez bi cadê ve diçim bi kurdî xeber didim kes ji min re nabêje tu çima kurdî xeber didî. Kes ji we re jî nabêje. Ê xwe fêrî kurdî bikin. Mezinahiya zimanê tirkî ji bo we çi ye yanî! Îngilîzî bûya min ê bigota erê. Zimanê navnetewî ye. Temam, zimanê biyanî hîn bibin lê zimanê xwe jî ji bîr nekin.





*Niha ev heye,
muzîk zimanan nas
nake, dewleta wê
tune. Lê ev tiştêkî
din e. Dîsa jî her kes
ji muzîka xwe hez
dike. Kurd jî ji
muzîka xwe hez
dikin. Miletêkî gelek
hunerhez e. Wisaan e
ku çavekî wan tim
digirî, çavekî wan jî
tim dikene. Miletêkî
zîndî ye. Ne wek
miletên din in*

ser piştê û her du lingên xwe yên biçûk
ber bi ewr ve dike da ku pêşiya ewrê
bigire. Tev pê dikenin dibêjin ha ha ha!
Ka tu yê bi wan lingên xwe yên zilîkî
çawa pêşiya ewr bigirî? Ew jî dibêje, çi
para min ket ez ê wî bigirim. Yanî yê we
jî çi para we dikeve hûn wî dikin. Hûn
zêdetir nikarin bikin. Yê zêdetir divê
hikûmet bike. Divê ku ew mecalê bide
we. Demokrasî hebe, mafê kurdan bê
dayîn. Ku kurd bikaribin bi zimanê xwe
bixwînin û binivîsin wê her tişt baştir
bibe. Rewşa heyî trajedyeyeke mezin e. Lê
ku mecal bê dayîn, wê ev rewş biguhere.

Ez ditirsim ku polês baştir ji min fêhm
bikin. Ne ku kurd. Wisa be ez ji bo
polêsan stranên dibêjim? Niha ev heye.
Muzîk zimanan nas nake, dewleta wê
tune. Lê ev tiştêkî din e. Dîsa jî her kes ji
muzîka xwe hez dike. Kurd jî ji muzîka
xwe hez dikin. Miletêkî gelek hunerhez
e. Wisaan e ku çavekî wan tim digirî,
çavekî wan jî tim dikene. Miletêkî zîndî
ye. Ne wek miletên din in.

**W- Wek pîrsa dawîn; tu dikarî qala
hest û dilîniyên xwe yên li Amedêbûyîne
bikî?**

Aslîka Qadir: Ji aliyekî ve ez dibêjim,
ez di nava miletê xwe de me, ji aliyê din
ve jî dibêjim ez li vir xerîb im. Her du
hest jî niha li cem min hene. Ez him şa
me, him xemgîn im. Lê dîsa jî ku ez sibê
miletê di konserê de pir bibînim, wê ji

bo min tiştêkî pir ecêb be. Cara yekemîn
e ku ez ê ewqas kurdan li cem hev
bibînim û derkevim pêşberî bi hezaran
mirovên. Ev dilê min gelek xweş dike. Ji
berê ve merama min bû ku ez bêm
Bakur bigirim, miletê xwe bibînim.
Hinek guherîn pêk hatine lê têr nakin. Bi
baweriya min wiha namîne. Ez
baweriya xwe qet wenda nakim. Lewre
“heqîqet nexweş dikeve lê qet namire”.
Ev gotin a kê ye niha nayê bîra min.
Rastiya kurdan jî nexweş e. Lê namire,
wê hêdî hêdî qenc bibe. Wê rabe ser xwe
û her tişt wê baş bibe.

Dibêjin em misilman birayên hev in.
Tu misilman î ez jî misilman im. Ê te
hebe wê yê min tune be. Biratiya gelan
gişt tiştêkî derew e. Sovyetê 75 salan got
em gişt bira ne. 15-16 respûblîk (komar)
em gişt bira ne. Stranên min jî hene li ser
Lenîn mesela. Li ser ordiya sovyetê, li
ser komunîzmê stranên min hene. Min
di Radyoya Yerîvanê de gotiye. Wext
wisa dixwest em gişt bira ne, em gişt ji
malbatekê ne. Piştî 75 salan derket ku
kes birayê kesî/ê nîn e. Tew bi ser de
dijminê hev in. Xêrnexwazên hevdu
derketin. Her miletekî ji bo xwe got;
ermeniyên got Ermenistan ji bo
ermeniyên e. Gurcuyan got Gurcistan ji
bo gurciyan e, azeriyan got Azerbeycan
ji bo azeriyan e. Dîsa em kurdên sovyetê
li ortê man, perîşan bûn. Rast e sovyet di
polîtîkaya amê (giştî) de ne baş e ji bo
kurdan. Lê ji bo kurdên li hindurê xwe
baş bûn. Kesî/ê nikaribû li ser me xeber
bida. Yekî ji yekê re nikaribû bigota tu
ev millet î. Sovyet hilweşiya êdî giştî
xwe kirin meriv.

Sovyetê ew gişt kirin meriv û paşê
ew tev li hemberî sovyetê derketin. Li
dijî rûsan derketin. Yanî Kazakistan çi
bû, di awîla de diman. Ji bilî xos xos û
ços çosê tiştêkî din nizanibûn. Rûsan ew
tev kirine meriv. Xwendin dane wan û
hwd. niha jî bûne serbixwe, em kurd di
ortê de man.

W- Spas ji bo ku we ev derfet da me.

Aslîka Qadir: Spas.

Çemê Stewrê û Zelxo

Feratê DENGİZÎ

Li bakurê Mêrdînê ku mirov ji Hopa Rişmilê difilite û berê xwe dide aliyê çepê, rêya Stewrê ye. Risînê û rêveqetandoka Dandanê derbas bibe, bi serberjêrekî nerm û fitilekek kin tu di nav rezên Şûrê de yî, şewlekî fireh û dehl weke wêneyekî... Çend kaniyên avpir dibe destpêka çemekî mezin. Ev dera jêdera Çemê Stewrê ye.

Çemê Stewrê ber bi bakur ve diherike.

Newalek carina kûr û carina jî berfireh. Çem di nivê newalê de diherike. Her du alî dehl, baxçeyên fêkî, tarûtûr; li aliyê çepê rîyeke mezin a bi fitlonek berbîrî çem dirêj dibe. Rê, li cîna ji nedîtî ve dizivire, mirov dibê qey diqede, lê yan di nava dehlan de yan jî di fitlekan de car din serî dide. Û wek şivek rast dide pêşiya mirov, an xwe dide tenîştê rezan an jî bi pireke kin çem qut dike. Di dema berê de pîreyên vîra nivx-erabe bûn, ava biharî ew xera dikirin, encex çend darên hewran ên dirêj li ser rêzên keviran dibûn pir û derbasbûna ser van daran jî cebazî dixwest; tew ku baran jî bariya be!

Ji Şûrê wir de ji aliyê milê rastê, ji newala Bafawa aveke dinê tê ser çem û çem hîn jî xurtir dibe, dehl û baxçe jî li vîra hîn zehftir in û rez jî wiha pir û pir... Mirov di ber gundan re dibuhure wan nabîne, wek Baqeyse, lê li pêştir tevli mîrgan mirov dikeve nav mezêlê Elfan; darên gûzan û kaniyên ber rê zehf dibin, bêje mirov di nav avê de dimeşe. Û fitlekên vîra jî pir tûj in, bi pireke kevirî ya duçavî ku mirov ji Elfan derbas dibe; ji aliyê milê çepê ve avek xurt ku ji aliyê Zonê û Barmanê tê, di bin vê pirê re diçe û tevli çem dibe. Û mirov dikeve kaşê Tirba Êzîdî, nav rezan ku hawîrdor tev darên bihîva ne... Ji Tirba Êzîdî pê ve newala Gangiyê dest pê dike, binê wê ewilî teng, duşeq û di pê re fireh, hinekî jî kûr û giyarên bilind ku hew asîman ji mirov ve xuya ye wê dipêçe. Lê bi rastî newal mîna bihuştê ye; pîrbûn û cureyên dar û beran, baxçeyên fêkî mirov gēj dike, car carina jî yek malên ji keviran weke qesrên dîrokî dertên pêşberî mirov û ji zehfiya daran çem xuya nabe, bes dengêkî avê yê xurt mirov pê hay dike. Li vîra sikirên li ber avê jî pir in ku ava medreb û aşan ji çem diqetînin, bi du alî... Deheydê av jî pir e, medreb jî pir in û aş jî!

Dewlemendiyek xwezayê û kedê li ber mirov e, lê mixabin berê wê, hatina wê, mirov tev na, hinek, bi qendî tiliyên desta dixwin.

Me got ji Gangiyê sikirên aş dest pê dikin û av pir e. Aşê pêşî û herî bi nav û deng Aşê Kunîfirê, bi navekî dinê Aşê Mistefa Beg e. Di pê re Aşê Temir Beg, Aşê Hemdila Beg, Aşê Serêpirê, Aşê Hecî Emîn, Aşê Weta, Aşê Ehmedî û aşên dinê tên, weke kuçikên cilan li ber çem... Tê zanîn ku, di serdema navîn de û heya van çend deh salên dawî jî, aş nişana dewlemendiyê herî bilind bû.

Li hinda aşê pêşî, li wîra ji aliyê çepê, ji Newala Kunîfirî teng û kûr ve aveke dinê xwe bera ser çem dide. Li vîra newal pir fireh e, av jî ji çend golên pir kûr derbasî belavbûnê dibe ku; ev der Delavê Dengîza ye. Çem li vir herî fireh e û nîzm e jî. Delav, çaryan û derbasiya rêya ye. Qaçaxçî, karwan di vîra re diherin û tên; ji Omeriya ber bi Sûrguciya, Amed û Xerzan, ji Mêrdîn ber bi Stewrê, Midyadê û Cizîrê û hwd. Bi aliyê destê çepê rêya Dengîza û Ewîna dertê pêşiya mirov, lê ewilî ji dar û beran, ji dehlan ne xuya ye.

Em ber bi Stewrê, ber bi gola baxçe û darên gûza û reza ve diçin. Bi qesrên xwe weke bûkeke xemilandî Stewrê û keleha wê li hemberî mirov e. Çem li vîra dibe bingeha bereketê, lê tev ji began re û gepên mezin ji şêxan re ye. Gelê hejar û xîzan bela ku fêdê jê nabînin, ji xwe re 'Stewr' yanî bêber, bêhatî dibînin. A rastî Stewr ji xwedawend 'Star'ê, xwedawenda herî kevn tê. Star, ji ber ku him xweşik, rind û bedewa sereke û him jî fidayîya gelê xwe bû ne dizewicî, nikaribû bizewice, ji ber vê berê wê tune bû, nedîza lê afirînkî, bibereket û diya hemû hebûnan bû. Her kesî digot 'Ya Star!' û xwe disipartê, hawara xwe dikirê, îro jî di nav gelê kurd de ev peyv û kevnepêşî heye; Ya Star! Ji bo mirov xwe ji xetereyan, ji derewan, ji keyb û îftirayan bisitirîne wiha dibêje û 'Sitarî-Sitarbûn' bûye lêker û ketiyê zimanê kurdî; wek 'Xwedê mirov bisitirîne!', 'Em herin ber sitarekê, xwe bisitirînin'. Erê, Star her tiştê di her warî de sereke ye, wek ku di zimanê Hind-Ewropayî tevan de bi vî awayî cî girtiye; Star, Astar, Astra, Stêrik û herwiha... Bi rastî jî Stewrê stêrik e, star e, bi her awayê xwe, bi xweşikî, dewlemendî, bi navendî, bi serekeyî... Lê ne ji xîzanan re, ne ji kurdan re, ne ji kurmancan re... Her neyê ser! Em serê we neêşînin; çem ji vir bi tevlêbûna Ava Qilitê-gundê filehan- ber bi Ehmedî-gundê şêxan-, Çemê Romanî û Kelê dihere, xwe bera Deştê Barava dide û li Seledûn silavê dide Tîjleyê û dewlemendîya ji serwaran re li dû xwe dihêle...

* * *

Em we bibin dema Herba Cîhanê ya duyemîn; li her aliyê tuneyî, kêmanî û birçîtî heye. Xela ye. Wek ku

gelê kurd dibêje; “Xela ye, dê weledê xwe diavêje...”

Li gorî ku berê mirov li bakur be, hêla destê rastê ya Çemê Stewrê gundên ereban, hêla destê çepê û yên tenîsta çem jî gundên kurdan in. Gundên kurdan ên bej û avî di hikmê axa, lê hilberîna dora çem û ilim jî hatina aşan tev ê begên ereban e. Mirov kare bibêje axa jî tabihê began e. Beg hikûmat in, serdest in, welhasil haşa sûmehaşa Xwedayê vê derê ne. Kurd, hejarên kurd û ereban tev xulamê wan in. Ên ku bixwazin serbixwe bijîn, rêyek tenê ji wan re heye; dizî û qaçax..!

Ji vê yekê şerê di neqeba axa û began, ên di neqeba gundiyan û axayan, ên di neqeba gundiyan û began û ilim jî yên di neqeba kurdan û begê ereban de naqedin, xelas nabin, ji xeynî dijminantî û berberiya di gundan de bi hev re... Welhasil jiyana li vir tev berberî, dijminantî û xwindarî ye, giloka xwînê ye, dewlet jî rihet û di ser her tiştî re...

Gundekî bej, xizan û bê axa ye Dengiza. Hatina wê jî zêde tune ye. Bi pirî pez û dewaran xwedî dikin. Rez û zadê wan jî hene lê ne pir. Bi firoşa hilberîna şîr; penêr, mast, keşk, çortan û hwd. û bi firotina êzingan xwe xwedî dikin, gundiyan reben û perîşan. Xesma jî bi firotina mast. Zarokên kurik jî heft saliya xwe û zilamên kal, êzingfiroş in. Ên keçik jî heya sêzdeh-çardeh saliya xwe û ilim jî jinên pîr, kal ku hew karê malê bi wan dibe, dibe serê sibehê berî azanê dê rahêjin du satil mastê xwe û berê xwe bidin Stewrê, bazarê... Carinan hinek pîrejin, mastê wan tune feqîra yê xelkê bi heqê xwe dibin firotinê. Sibehê û berêvaran li riya Stewrê jî çarik û şaşik spiye pîrekan karwanek heye, weke refên qijakên belek. Şaşikên spî jî nîşana şîne ne. Werê mîr û kurên wan di xwîniyê de, di şerê neyartiyê û şerên wekî din de wînda kirine ku, em bibêjin pîreka bê şaşik spî hema hema tune ye, hûn bawer bikin! Sibehê dê zû herin mastê xwe bifroşin û bi nav baxçeyê Stewriyan, ên began bikevin. Yan bi pereyêkî bêqîmet an jî mîna parsê, kerik û alozên sêvan, alûcan, incasan, mişmişan û her wekî dinê bidin hev heya êvarî. Di pê re berê xwe didin gund, hinek zû berî nîvro vedigerin, evanan narin baxçeyan, lê hinek wek ku sinetê wan e, heya êvarî li wan baxçeyan digerin. Hinekan dostanî jî bi baxçevanê xizan re danîne... Li bazara Stewrê weke bajarên dinê gundî gelekî tene acizkirin. Malên wan bi mirîti tî firotin. Dek û dolap li serê wan pîr çêdibin, heya bigihê bînamûsiyê jî! Ji wê her kes bi rihetî malê xwe nabe bazarê, lê tu rêyên dinê jî tune ne. Mala feqîriyê xera bibe...

* * *

Yek ji wan gundiyan jî Zelxo ye, yazdeh, dozdeh salî. Halê wan zêde ne xerab e, ne motacî mastfirotinê ne, lê derdê wan tiştekî din e; bav ji hepsan xelas nabe.

Îcarê jî bi kalî û çavkoriya xwe rebeno di hepsa Stewrê de ye. Zelxo, di hefteyê de du, sê caran serî didê û jê re du satil mast dibe. Ji aliyê dinê ve jî ji bavê xwe pîr hez dike Zelxo, bibêje jê pê ve hevalê wê tune ye. Ew û keçika cîranê wan Erebe!

Erebê jî bi emrê wê re ye...

Ji hevaltiya bavê xwe, ji axaftinên wî pîr hez dikir. Bavê wê jî werê. Ne weke zilamê gundê wan bû. Ji axaftina zarok û pîrekan nedireviya; ji ber ku pîr geriyabû, du, sê caran çûbû seferê yanî herbê. Dinya xweş fêhm kiribû, zane û gotinxweş bû. Pirtir jî ji zarokan hez dikir. Di xizanên ereban de jî dostên wî hebûn, navê Zelxo-her çiqas navê dêya wî be jî- weke bîranîna wan danîbû. Zelîxa bû asas navê wê. Zelxo, ne weke qîza wî tenê, weke dostekî xwe jî didit, jê re behsa her tiştî dikir, “Li min guhdar ke Zelxo..!” digot û serî dixist peyvê;

“Ev neyartiya gundiyan ji xizanî û hovî ye. Neyartiyên mezin, wek ê me û began, axayan ji ber kedxwariyê ye. Keda xizanan tê xwarin. Herb jî werê. Dewletên mezin dixwazin ên biçûk bindest bikin û daqurtînin... Ez serê te neêşînim, fêmkirina jiyane ya hêrî xweş, xweza ye; dêna xwe bidê. Derbiharî meha adarê zabûna her tiştî ye. Zabûna candaran e; giha, dar û ber, fêkî... Xweza xwe nû dike, di gulane de di destpêka havînê de disitewe, di tîrmehê yanî di nava havînê de germê pîr dixwe heya ku gêj dibe û di teboxê de dipije, digihê. Bifikire, tebox bi erebî ye, bi kurdî wateya wê pijandin e, asas bi zimanê me gelawêj e, bi zimanê me yê xweş. Di vê mehê de stêrka gelawêjê dertê, mirov li ajalan yanî li heywanan ne miqate be dê qurix li wan xe. Tebox her tiştî ji me mirovan re amade dike; felatî ye, yên ku fêhm bike: Şîr xweş dibe, penêr û mastê vê mehê heja ye, bi rûmet e. Şebeş, petêx, tîrî dibin weke helawê. Zad ê benderê ne. Tar û tûr; behcan, îsot jî weha... Payîz jî hevdana kedê ye; hilberîna mehsûl e. Dawî, divê di sermawêzê de tu qûtê xwe bi cih bikî û ji zivistanê re amade bî, dema tevdir û hesaban e... Tu bixwazî ku jiyana xwe xurt bikî, tu yê li van tiştan guhdar bî, belê ku serdest, asteng û pîrsgirêk jî bihêlin. Tu yê van hesaban jî bikî û berxwedanvan bî. Ya dinê jî dilê xwe paqij bike! Dexsî, edoqewmiya bi qîrêj û nexweşiyên ji dilê xwe biavêji û xwe xweşik bikî...” Carinan jî meseleyên dîrokî digot, jixwe dengbêj jî bû. Meseleyên teyr û tirûran heya bigihê yên maran û kêzikan jî jê re digot. Belê ku felekê roj bidana wan. Werê hindik hevdu diditin ku, ne bêje! Heya ji bavê wê dihat dixwest jiyane pê bide fêmkirin.

Zelxo bi temenê xwe zaro bû lê gelek tişt fêhm kiribûn bi alîkariya bavê xwe. Lê wate nedida hinek tiştan, hinek rewşan. Weke zilma romiyan, kedxwariya begê ereban û dexsiya kurdan... Gundî xizan bûn, divê li

hev xwedî derketina, lê bêhtir ji hev diqehirîn, bi fesadiyan tîrba hev dikolan. Têkiliya mêr û njan ji pir ne li cih bû. Gelo ji bo çi bavê wê xweha wê şewitandibû? Dibêjin, 'Ji bo namûsê!' Talî ji bo vê di hepsê de ye, girtî ye, derdên ku berê kişandibûn ne bes bû! Zelxo dilê xwe xurt dikir, digot; "Ez ê vê derbê jê bipirsim."

Qehir, zilm û tengayî pir bûn, ew ê kengî dawî bê? Gundî ewqas kedê didin şixulan û tîr ji nabin. Erebb û rom çima me kêmi xwe dibînin? Çima tehdê li me dikin? Pirsên di serê wê de pir bûn. Hîn zaro bû Zelxo, lê mêtî te digot heftê salî! Kar û şixulên giran ji bedena wê herimandibû; rûyê wê geş lê bedenek tenik, jar, te pif bikirayê dê biketa, şibête ciwanan jixwe pê nediket. Cîranan bi heneka carinan digotin; "Tu hatiya zewacê, lê qama te qut, bejna te hişk e, rebenê!" Ew ji dikeniya û wate nedida zûzewacê; "Jixwe ez zarok im" digot. Van tiştan weke lîstika zarokan didît.

* * *

Dem benga biharê ye. Dinya werê xweş bûye ku, qet nebêje!

Ji êvarê de Zelxo di xebatê de bû, xwe amade dikir, dê sibehê here hevdiatina bavê xwe, mast jê re bibe. Erebbê wê sibehê zû bakê, dê bi hev re berê xwe bidin Stewrê...

Barana biharê jî ji êvarê de dest pê kiribû.

Berî azana sibê deng ji deriyê hewşê hat. Erebbê bang dikirê. Bi lezûbez cilên xwe yên xweşik ku ji êvarê de amade kiribûn, li xwe kir. Hinek nan xist nav destmalekê û li pişt xwe girêda. Çaroxên xwe xistin lingê xwe, li her du satilên mast nêrî, bi çarikê ser qîmaxên wan paqij kir. Çarîknî nû li devê wan girêda û rahişt wan û derket. Ew û Erebbê ketin teniştê hev û berjêr bûn. Ecele dikirin, nedan rêya rast, di peyarêkan, di rêbiran re meşyan. Di peyarêka Mala Heska re bihurîn, zivirîn ber tehta ketî. Erebbê dest bi dûrikekê kir:

*Zeryê gundê me çar in
Li ser baniya b'harwar in
Xortno destan zû bigrin
Bêhma memka em xwar in
.....*

Zelxo bi xeyd dengê wê birî:

- Ev çi gotinên çewto mewto ne, keçê?
- Çima! Qîzên gund tev tiştên weha dibêjin.
- Na hevala min. Em hîn biçûk in, ji tiştên weha re.
- Hinekî bi aqil be, bila heşê te nere ser tiştên bêedeb.
- Wî... Te jî dinya herimand lê Zelxokê!
- Li min guhdar be, guhbidêre..! Got, Zelxo û

domand; Li Stewrê jî giran be. Ku hinekan mastê te kirî bi wan re nere mala wan, bila teştê xwe bînin. Li wir vala bike teştê û heqê xwe bistîne.

- Çima?

- Ma qey tu bîr nabiyê..! Navê çend jin û qîzên gund weha derket û serê rebenan jî ket belayê.

- Bi zorê namûsa wan herimandin. Pîçên Stewriya kerên êzingvanan jî didizin, vedişêrin, ji bo bênamûsiyê... Nebî, nebî tu herî nav baxçê wan jî. Li ber camiyê li hêviya min be. Temam... Erê!

- Temam, tamam. Tu ji birayê min î mezin jî ekistir î, wî...

- Keçê qenciya te dixwazim.

Him diaxivîn û him jî dimeşyan. Dengê çirçirikên ku bi gêtî dom dikir hindik dibû. Çem ji gundê wan bi meşek xurt, nîv saet bû. Ketin pêşiya peyarêka çem. Zelxo xwest dilê hevala xwe, bi henekan hîn bêhtir ber bi xwe ve bikişîne. Bi dengekî nerm û xweş şitexili;

- Tê bîra te Erebbê? Wexta em diçûn ber karikan me digot em ê herin serê sikurê ezman bigirin. Sikur bi sikur em dibezyan, em ji betilandinan dibehirîn. Aqilê zarokî. Ma kes kare ezman bigire, zêft bike?

- Werê bû. Lê bi Xwedê bi me jî xweş dihat, bi Qurana Mala Şêx... Weke roja cila ku em li ser şalên cilan li kera siwar dibûn û me kera xwe dida cirêda, dida teleba, bê wê ewilî kî di fitila çem de serê dehla, serê dehla bibîne! Bawer be wexta ku min berê didît û digot, 'wa ye dehl, wa ye dehl..! wa ye serê dehla..!' wek ku dinya tev a min be. Lê kera me zêf e rebenê, pîrî caran li paş dimam.

- Rast e. Ew jî xweş bû. De ka bê ez û te wê kî ewilî bigihê serê sikura Peyarêkê û serê dehlan ewilî bibîne. Lê tu mastê xwe nerijînê..!

- Bila be... Tu jî li xwe miqate be.

Pêşiya kaş tev rez bûn. Rezên dirêj û bendbilind. Di benda rezan ve hilkişyan, ketin nava rez û gihîştin binê kaş û dest bi bezê kirin, bi lez. Geh yek ji wan, geh a dinê diket pêşiyê, pêşbazî xweş didomiya. Lê kaş pir rep bû. Mecbûr xwe bi pêş de xwar dikirin, îcar jî pişt wan diêşiya, lê pê kêfxweş bûn. Berî serê sikurê kevîrê mezin weke himekî hebû, her yekê dan aliyekî, di pişt de li hev qelîbîn, hindik mabû bikevin û mastê xwe birijînin. Bi kêna dîsa dan xwe. Serê sikurê rizde û teht bûn. Erebbê satilên xwe danîn kêlekê û bi ser ket, kir awaz;

- Wa serê dehla... A wa dehl, a wa çem..! Û destê xwe

li hev xistin.

- Te satil danîn, netê ye... got, Zelxo. Lê di pê re 'Eferîn, Eferîka' da hevala xwe û bi hev kenîyan, xwe berdan ser benderên çem.

Bender bi kulîlkan xemilî bûn, ilim jî bi nîsanên. Zelxo xwe negirt, baqek jî nîsanên xwînsor çêkir û ketin rê... Rê êdî rast bû. Cehdeya Mêrdîn û Stewrê... Rojhilat hêdî hêdî ronî dibû, stêrik li ber wendabûnê. Bêhna biharê mirov serxweş dikir, baranê êvarê giha tev şil kiribû, wek çirûskên zîvîn dibiriqîn. Çaroxên wan û devdelîngên wan tev şil û herî. Di rêveqetoneka Ehmedî re bihurîn. Ketin rêya Rastagûzan; li vir darên gûzan, ên mişmişan û yên bihîvan pir bûn. Zelxo çend gulîkên bihîvan ên bi kulîlik û pelên terhe gûzan nûderketî jê kir, bi nîsanên re tev kir baqekî mezin, bi tayekî girêda, danî ser devê satileke xwe, ji bo ku ji bavê xwe re bibe. Berbang ronî dibû, hindik mabû ku tîrêjen rojê serî bidin. Refekî teyran ji rojhilat dihat û xumxuma Çemê Stewrê mîna govendê bû. Zelxo li teyran nêrî û bi ken got, bi kenê zarokiyê, bi kenê zarokan ê bêtewan; "Teyro teyrî tirûrî / Girara bavê te fûrî / Tiştê neket wî hûrî / Ma te silavên bavê min anî..." Meşê dom kir. Ketin fitilekek biteht û sira bayê sibehê yî xweş û hinekî germ ji nava dehlân, ji nava dar û beran, ji ber çem bi ser wan de hat, wek misk û emberê û di pê re hinekî cemidî. Mûyê canê mirov radikir ji xweşiyê; bi keser hewa kişandin nava xwe. Erebe pirsî;

- Tu çi qasî ji bavê xwe hez dikî? Di pê wî re tu ji kê hez dikî?

- Erebe li benda navê xortekî bû, bê guman.

- Ez ji jiyaneke bê tehde hez dikim û êvarê vegera malê.

- Ev çi tişt in? Tu weke metelokan dipeyivî...

- Na, na... Ne metelok in... Bi bêhna fireh ez ê ji te re jî bêjim, tiştên ku bavê min digotin û ku ez jî fêhm dikim. Lê Xwedê hebîni, dema ku mirov dihere rêsiya yan jî eşêfê... Ku dibe êvar mirov du bendeke giha, rêsi yan jî çilo li kerê xwe bike û li ser siwarê yan jî bide dû barê rêsiya û baqilan ji nav bineqîne çavilxew... Bêhna devîyan, bihîvan, kulîlkan û ilim jî ijjikan, ji her aliyî ve dilê mirov xweş bike û hesûdî, dexsî, dijminahî, xwîni, neyartî, hêsrî, girtin û lêxistina cendirmê romê tune be... Hiii... Tu çi difikirî? Ma ne xweş e? Werê dilxweş berê mirov li malê be û têr mehirê bixwe û serî di xew xê! Hiii... Wê çawa be..?

- Wî tu weke dînan dipeyivî... Ma jiyaneke werê xweş heye gelo? Lê vegera malê... Erê, weke vegera hêlînê, weke vegera welat e...! Te vegera cilşûştinê ku em ji

çem, êvaran vedigerîyan, anî bîra min. Tu li ku bî, êvarê çavê mirov li mala mirov, warê mirov digere. Neyêser... Êvaran roj di çavê me de. Em li ser şala cila siwar in, zarokeke biçûk jî li ber me, bi xwêdan em di xew re diçûn, carinan jî ji ser kerê diketin. Wey, wey! Tu nabêjî bila çemek li gundê me hebûna. Ez bi hesreta aveke pir im. Hilbet avakirina malbatekê jî...

Hew dîtin ku li ber qereqolê ne... Erebe bitirs;

- Ecele bike Zelxo, bila ew kûçikbavê cendirman me nebînin. Bi me nehese. Saetekê dê me biewirînin...

- Erê..!

Ketin serberjêrê ber qereqolê. Bi nermî tê de herikîn. Hatî ber Pira Stewrê ku derbas bibin. Çi bibînin! Ji barana êvarî av pir bûye, lehî rabûye. Pêlên avê har û bihêbet. Pir rê nade. Neçar berê xwe dan jorî pirê, cihekî kûr û teng li wira hebû, du darên hewran avêtibûn ser çem. Erebe da pêşiyê û Zelxo li dû, barana êvarî dar şil û şematok kiribûn. Ku lingekî xwe bilind dikirin dar jî bi şid dilind dibû, barê wan jî ji wan re giran dihat ji ber betilandinê. Her du destên wan jî girtî. Belê tecrûbeyî wan jî hebû, lê îro dar pir şematok bûn. Çaroxên şil, darên şil nedigirt. Ji nedîtî ve Erebe xwar bû, çend caran xwe rast kir. Lê mêzîna wê xera bû, çaroxa wê şemitî, ling ji ber çû û qulipî nav avê. Zelxo mat ma û bêhneke kin sekinî, bi awirên vala li hevala xwe nêrî, deng jî jê derneket. Ji şida ketina Erebe dar hîn bêhtir hejiyan. Xwest gavekê biavêje lê nebû, ew jî qulipî... Du caran bi ser avê ketin her du heval û cara sisêyan winda bûn. Ji dengê avê pê ve tu tişt nedihat bihîstin. Ne qêrîn, ne deng, ne his... Tenê baqê kulîlkan bi ser avê ket.

Baqê kulîlkan felişî, kulîlkên bihîvan bi aliyekî, pelên gûza û nîsan bi aliyekî... Pêlên avê ew ber bi qiraxê ve dibir. Hêbeta avê hê zêdetir dibû, mîna ferat, dengê wê jî... Bêdengiya berbangê diçirand!

Darên şil hîn jî dihejiyan, yek berjêr ê dinê ber bi jor...

Tîrêjen rojê ji kêleka Stewrê, ji kêleka girê keleha wê avêtin. Çirisîn. Çareserîya derd û kulên Zelxo, tev li qedera welatekî bû, ma gelawêjeke dinê... Ava Çemê Stewrê derd û kul neşûştin, gelek can stend lê dil xurt kirin, dil û mêji xwedî kirin. Di sibeha tebaxê nû, bi tîrêjen rojê gulzêrîn, ew birînen ku bûbûn giloka derdan, bûbûn xwîn û elem di dil û mêjiyan de, bi guleke Egît bela dibû û dikewiya..! (15 Gelawêj 2000)

Jin

Selahattîn ÇAM

Tu delal î, rind û pak î
Tu jiyan î dost û yar î
Tu Leyla yî, Zîn û Şîrîn î
Tu nebî, çi rûmet e
Ji Mecnûn, Mem û Ferhat re
Tu yî can didî, aşiq û evîndaran
Tu Belqîs î, Zelîxa û Semîramîs î
Bê te, bêhêz û bêrewac e
Silêman, Ûsiv û Ebûqanzade
Tu xweş î, aramiyê ji dinê re
Tu stûn î ji mal û xanê re
Tu afirînêr û dîlovan î
Tu bermal û kebanî
Bê te mal vik û vala, xikîxalî
Tu yar î, dê û xwişk î
Tu hogir î, dost û heval î
Bê te jiyan rijî û xalî
Evîn tu yî, jiyan tu yî
Bê te ne evîn û ne jiyan e
Ziman tu yî, wêje tu yî
Helbest tu yî, stran tu yî
Bê te rez û baxçe beyar e
Bê te xan û mal wêran e!

5 Çile 2008

Tewfîk YAŞLI

Kengî mirim

Hurşehurşa delaliya min bû
Dema herikînê
Keya dihesidî nizamî çima
Jê ve Rustemê Zal şerê mişkên malan kiribû
Tenê rûyê min î hilû
Ax rûyê min alemekî hilû bû
Likumîna wî bû
Sernişiva min
Gelî xwehên rojmîrî, birano
Awêne mala min bûn, zik didan
Ez dikoja dim şevên kul
Werin em herin pengzîna bindarûkê
Werin îşev pêxwas
Zarokno we Kamyar neditiye
Par bû
Ripîrût bû
Ger ez bêjim nezame bawer bikin
Ez li alî din mam
Heristinên leylim ley
Duh êvarê bû, erê duh êvarê
Têla tembûra min qetiya
Niha saet ji xapandinan bihuriye
Werin rastiya ser bêjingê
(rehme li av û axa Dêrikê be)
Ez hê ji efara evînê dikim
Ez şev im, ez şev im
Divê ev dubare bête gotin
Û bi şewitîna can
Xwedê hebîn hûn bêjin
Ew gulfiros hêj di temenê kuçeya me de ye
Min kena xwe ya bêar dabûyê
Paşî çem rabûbûn li çûyinan
Dirêêj bûbûn
Bi qasî tîrsa mirinê
Yezdano ma çi dibe çêja her tiştekî
Xweşiya bêhnvedana govendê be
Min xwest keçeke min jî hebe
Ew qas
Xwedêyo qe ne di xewnên min de
Jixwe dê pelg payîzê li xwe kin
Xweziyên min jî hebûn
Ez ê bêjimê keçî
Uzîna guran
Xofa piştî birûskvedanê
Berfa sor
Pîr dimeşyan
Hezar û heftsed hesp bi hev re
Ji daxa çavên min
Lê nizamî kî ez hînî îspanyolî kirime
"calle de los ventanos"^(*) dibêjim
Paşê jî "dinê ji bo hezkirinê pir biçûk e"^(**) piir.

Têbînî _____:

^(*) Kuçeya şibakeyan

^(**) Furux furuxzad.

Kamran S. HEDILÎ

Tîr di dil de ji bîr bû

Li pey te kanî û rûbar ziwa bûn
hest gêj
daxwaz mandû bûn
dil çûkê serxweş e
bask tu yî
serhildana ewran e
rondik şîn û reş dibarin
roj
di bin kirasê şevê de
reng
di êşa kulîlkên hinarê de
hêvî
di asoyê dûr de dinalin

dîrok
têkçûnên me ji çeperekî dibe çeperê din
ji serkeftinan pirtir

giyan
di pîroziya Dicle û Firat de
tî me
çavên
firîna şadiya min
winda ne îro
min
dîlana jiyanê
da baskên çûkên biharê
te
termê evînê
bi hêstirên min şûst
jana têkçûnê
di dilê min û xwe de hişt

31.03.2008

Dilê min ne dîn e

Rizoyê XERZÎ

Li kolanên evîna te
Welat bi welat
Li gunehên te dipirse
Bajar bi bajar
Diçe serdana evîndarên te
Gund bi gund
Guleyên di sînga te de dijmêre
Dilê min ne dîn e
Çiya bi çiya
Li şewata zewiyên te digere
Şikeft bi şikeft
Textê bûkaniya te radixe
Dar bi dar
Guliyên Sema dihûne
Lat bi lat dînvîse
Navê pakrewanan
Sosin bi sosin
Li bêhna evîna te digere
Sorgul bi sorgul
Li xwîna şehîdên te dipirse
Li deşt û çiyayên canê te
Li hênkaya evîna xwe digere
Dilê min ne dîn e
Kêlik bi kêlik
Temberîka çiya şeh dike
Wî haş dike
Dilorîne
Şiyar dike
Dixeydîne
Himbêz dike
Dinuhrîne
Ne min got.... dilê min ne dîn e

Êdî bes e!

Îlhamî OZER

êdî bes e
û bila biqede
va lorîn û feryada
li kolan û qada
va êş û azara
li sûk û bazara

êdî bes e
û bila biqede
va nalîn û girî
va hawar û qîrînên agirî
va tade û lêdan
û va girtîgehî û serlêdan

êdî bes e
û bila biqede
va keder û şewata
li ser ruyê hîm, zinar û lata
va tirs û tariya
li hundirê qelişteke û qul û şikefta

êdî bes e
û bila biqede
va xulamî û koletî
va şaşî û xeletî
va evîniya tirsê
û va domandina pelandin û pirsê

êdî bes e
û bila biqede
va int û qereza
vikûvala û neşareza
va pandomîma
hirc, meymûn û beraza

êdî bes e
û bila biqede
va tirsê reş û tarî
va bêdengiya bê alîkarî
va pêvajoya hevkarî
û va şerê gend û gemarî

êdî bes e
û bila biqede

va metelok û çîroka
balafir û firoka
va qerez û rika
top, tanq, gule û narincoka

edî bes e
û bila biqede
va zilm û zora hezar salan
va pişaftin, qîrkin û talan
va keser û xema xanî û malan
û va ger û tevgera çiya, banî, deşt û çolan

êdî bes e
û bila biqede
va ezûeztî û ezperestî
va stûxwarî û radestî
va pêkutî û pestî
va şer û mahşera nijadperestî

êdî bes e
û bila biqede
va jiyana bi êş û jan
va sipartina bi kîn û pan
va pergala xan û xopan
û va şik, guman hawar û eman

êdî bes e
û bila biqede
va şîn û zêmara
sibe û êvara
va daf û kemînên
kujer û sixura

êdî bes e
û bila biqede
va kortiya heval û dostan
va jengirtina raman û hestan
va gelş û gelemşeyên reben û bindestan
û va pûk, zîpik û zivistan

êdî bes e
û bila biqede
va ezmûna mirin û xwînê
va pirsgirêka namûs û dînê
va kêşeya Kurdistan û dinê
va angaştê bê goşt
va nîqaş û heftûheştê ji berî zayînê

Nesrîn NAVDAR

Serbûriyên te dixwînim

Dinalim!
Bi dilekî sotî
û bi bêrîkirinek nedîtî.
Hestên min diricifin!
Li nav tiliyên guvaştî, li ser kaxizekî
serbûriyên te dixwînim.
Nizanim niha tu li ku yî,
çi dikî û çawa yî...
Lê, di sirûştê jîyana min de dar li ser demsalê,
hêstirên zer diweşînin!
Nizanim te herî pir bêriya çi kiriye...
Lê zanim ku evîna te ya mezin,
dahatûyek azad dineqîşîne.
Dixwînim ez...
Di bin barana du bînahiyan de!
Peyv li ser rûpelê dişimitin,
li dû wan şoperêya çend salan...
Bi bayê bezê didim ser wan şopan.
Çavên min wekî bendavên xerabûyî,
li şopa şevên bê xew digirim,
li danên bê av û bê xwarinê digirim
û li şopa zoriya sermayê zivistanê...
Lê ez nabihîzim, tu gilîkirinek ji zor û zehmetiyê,
tenê dilên ji ber şêhadetan, sotayî dibînim!
Şopek, çavên min dighîne ser bejna te!
Demsal, payîz e.
Li ser lêvên te kenekî şoreşgerî
û bayê payîzê porê te şe dike!
Ez dexesiyê li wî bayî dikim,
dixwazim li şûna wî bayî porê te bêhn bikim!
Şopek çavên min li çavên te rast tîne...
Demsal, bihar e.
Te pal daye dareke çilo,
heyv gulan e.

Pêçiyên te ji pêlavên qetyayî xuyan e,
lê ne xema te ye.
Çavên te yên belek!
Çavên te yên jankuj!
Ji bîranînekê re ewr girêdane...
Di bin asoya zerhelkirî de,
bêhna gulanê tariya şevan diqelişîne.
Stêrkên şermok xwe li ber vê bîranînê nagirin,
ew jî vedibin...
Bi hev re eniyên we maç dikan
û, hevokên vejandinê rohnî dikan.
Gulanê, janek giran berdabû nav dilê zaroktiya te!
Birîndar bû gulan,
şev di wî de birîndar,
ax birîndar...
Û ji bîst û yek velerzîna gulanê,
Xoceyekî hembêz dikir
Licêya birîndar!
Dema şopek min dighîne wargeha te.
Dibînim ku êdî ne tu zarokî,
ne jî gulan birîndar e.
Hûn li cem hev kom bûne,
ji nav lêvên her rêhevalek te,
bîranînek ji jiyana wî diherike ser rûkê axê
û bi wan hevokan
gul geş dibin...
Ji her peyvî helbestek tê honandin.
Bi çavên ewrgirêdayî dibêjin.
Xoceyê hemû dilan,
bi wateya navê xwe bû.
Jiyana wî helbestek şoreşgerî,
evîna wî, maçek li ser sûretên zarokan bû dibêjin her yek!
Û tu rêhevalê hestên min!
Dibêjî ku lehengiya wî sonda min.
Hêviyên wî li ser bejna axê îro gul vedane!

18.03.2008

Şanaz im bo dayikên delal

Sîpan XIZAN

Bi lorîkên nivê şevan
Me hêjandin daykên delal
Şîrên spî yên bi adan
Me mêjandin daykên delal

Bi salan her me parastin
Av û agir ji xeteran
Li ser vê xaka bi rûmet
Bi lorîkan daykên delal

Ji bo bibin zana û jîr
Her nebin bindest û yexsîr
Serbilind bin li cîhanê
Bi lorîkên daykên delal

Her navdar im daykên delal
Rûmet-tir in li Kurdistan
Fedekarên gelê xwe ne
Bi lorîkên nivê şevan

Bira mekin wan lorîkan
Lew dihatin ji nav dilan
Dengên zelal ên pir şêrîn
Nûrandinên daykên delal

Bi wan lorîkên dil şewat
Nivê şev û li sehera
Bi keserî derdiketin
Ji nav lêvên daykên delal

Xewnên şevan xwe herimandin
Derdixistin ji nav lêvan
Bo godekan rengên derman
Ew lorîkên daykên delal

Dayikên herî bi rûmet
Daxwazê jiyanek bi rûmet
Bi awaz û bi lorîkan
Eşareta daykên delal

Serbestî armanca wan in
Her dem li ramanên wan in
Dengên zelal nivê şevan
Her dibêjin daykên delal

Bo daykan ez herî bêjim
Rêz û siyanet birêjim
Nakeve ber demjimaret
Wan lorîkên nivê şevan

Daxwaz bûm cardin batama
Cîhana xweş û şêrîn
Guhdar bikra wan lorîkan
Nivê şevan daykên delal

Dibînim li xeyala xwe
Dengên zirav ên lorîkan
Xemrevîn in ji bo Sîpan
Şanaz im bo daykên delal

30.12.2007

Abdulkadir BÎNGOL

Helbestên der barê gotinên pêşîyan de

Wezn: Mefailûn/ Mefailûn/Mefailûn/Mefailûn

Bi dinyayê bişewir lê, bi aqlê xo tu bik baş e.
Kula xalê Elo savar, kula aşvanî her aş e.
Di wê mala du jin tê da girar dêhit keli, yan şor.
Dixwazit çavekî rohnî, Xwedê didyê du çav bo kor.
Xewa babkuştîyan têtin, xewa zikbirçîyan nayê.
Bi xo ra kes nebir gorê belê wî malê dinyayê.
Şer û nîvşer yek in her du. Ji îmanê ye ew xîret.
Şer û tir ew bêhemdî ne. Hemû kes nefis, lê cil babet.
Birîndar bit xewa wan tê, lê birçî bit tu xew nîn e.
Çiraya ku Xwedê geş kir, nikarî kes bitemrîne.
Siwarê xelkê her daîm peyan in ew guman nîn e.
Belê şêx nafirit lakîn, mirîd şêxê xwe difrîne.
Li ser kuç bit, we ya kuç ser, di her duyan de ferq nîn e.
Li pişt dergûş, li deşta Mûş, di hîcranê de eynî ne.
Dixwî nanî ji kîs Îsa, selawat da li ser Mûsa.
Eger her deh tilî kit find, yê dî naşukrîne dîsa.
Tebîet ku bi şîrî bit, hêlana wî li şûwarê.
Heta ku tu necû parî, ne mimkin ew biçit xwarê.
Dikarî yek bi darê zor kurê êkê jê bistîne,
Belê jê standinê fikrê, we zor e, ihtîmal nîn e.
Xwedê gava bixwazit ku ji însankî we bistîne,
Didanê wî mirovî jî di nav hewdel de dişkîne.
Girê ned ker eya camêr li wê der ku mehîn lê bê.
Ji ber ku wê li hev şa bin, pehîn û tir ji wan çêbê.
Li te mizgîn eya pîrê kurê te l'gund bûye muxtar
Holê got wê: Li gundê min: Neman yek mêr, dikim hawar.
Bikî qencî, bidî ber av. Konê reş, qet sipî nabit.
Êvarê îne zor zehf in, eger pîra me xêrker bit.
Dema mir ew kerê qazî, ji her kes jê re çû tazî
Nekir keskî we pîrsa wî, dema mir ew reneb qazî.
Ji welyan car xwelî dertên, ji xwelyan çêdibin welî.
Zerar û kar birayên hev. Qe çênabit ji qir qelî.
Dema çavê yekî derket, divê destê xwe dit yê dî
Mi ew hîn kir bi dîlanê, negirt dest'im ewî êdî
Dinasî jin bi çav û birh, zilaman jî bi wan mûyan.
Dibêjin dest dişû destî, we paşê dest dev û rûyan.
Cihê fîşek eger sax bit, cihê ştexalyê sax nabe.
Bi qasî xo bipeyve tu: Bixo wek gur, bi mêr rabe.
Qîzanî ax çî qas xweş bû, bûkanî jî gula geş bû.
Belê qehra ewê malê, bo qîzkê jî roja reş bû.
Bibarit kengî ew baran zivistan e erê ew dem.
Herî cem yê te bigrîne, ê'biknîne meçî tu cem.
Belê ez axa tu axa, kî dê çêlek bibit baxa.
Di mal de ew Temotiro, we derva da Temer Axa.
Devê te ger teji xwîn be, li cem dijmin nekî tu pirç.
Ne hewcê kil we çavên reş. Rovî seyran, govend û hirç!
Siha zava siha stirya. Sibeh tê û we xêr pê re.

Pûşî jî bit neyarê te, wê lazim bit mêzer jê re.
 Ku salê çî, tu siltan î; tu heyvê b'çî, tu mêhvan î;
 Ku her roj çî, l'cihê sa nî. Ku fêmanakî, ne însan î.
 Ecêban dê bibînit qûn, bimîne ser li wê hingî.
 Mirov ser lep neçit rê ve, niza qedrê ewî lingî.
 Dibên şêr şêr e, şêr şêr e, belê çî jin, çî jî mêr e.
 Tîra ku ew ne min ra bit, di wî kendalê hanê re.
 Ne 'xweş tişt' e, eya însan 'xweyî xoş' e, eva rast e
 Dixwazim ew bizanin vê: 'heqîqet dew birê mast e'
 Bi pîrsa yek diçit Şamê. Pîra Şamê tibay âmê.
 Qûna reş jî weha ya spî dibit kifş e li hamamê.
 Eger hebya mihê stirhek wê dinya tev xirakirba.
 Keça axê divêt ema belê pê nextê mitirba.
 Ne ew gundê ku ew bê rez, Ne ew zoma ku ew bê pez,
 Ne xêr tê da, ne camêr e, zilamê ku dibê ez, ez.
 Pîrê bawer nekir şû ke, belê piştî ewê şû kir
 Hema rabû li nav malê, doza wê heştyeka xo kir.
 Bila mêrê jinik law be, bila caw be kirasê wê.
 Wê gewriya Xwedê kun kir, miheqeq w' b de rizqê wê.
 Eger dîtîm ez im ew kes, nedîtîm ger diz im, ev bes.
 Esas kî ger tu karê xo, dilê jar dê nekit weswes
 Kezep xişt e, bira pişt e, tîfik xweştîşt û xweş yar e
 Wekî Nîsko ye ew însan, ber û piştîk ne diyar e.
 Mîrîşka jar li bet kir çav jî bîr kir rêveçûna xo
 Qijakê ra kî bû heval, bêşik ew bû ye nikulgû.
 Heta qîz keç be, ew mîr e; heta dergistye, wezîr e;
 Belê piştî ewê mêr kir, dibên ew êdî êxsîr e.
 'Tîfî hey beq li rûyê te', cewapî holê dabû j' dil:
 'Xwel l'ser te şetê Dîclê, nikarê rûyê min kit şil.'
 Dirêj e dest di xwarnê da. Çiqas agir we sebrîn e.
 Çêlek rîxo (melesef) we garankê dihermîne.
 Bi kulmek ax nebî çawa ku têr be çavê însanî
 Li heyfa babê xwe gerya, belê ya xwe li ser danî.
 Bê tû selkê nekir derbas, belê çend lib di nav selkê.
 Ji xo ra beqgir e lakîn masîgir ew jî bo xelkê.
 Dibên destê rehet daîm li ser betnê we birçî ye.
 Dibêjin pêşyan tiştêk ji paşyan re nehiştiye
 Bi sebrê ava bû dinya. Îro ronî, sibê tarî.
 Dilê zarok dibên fal e. Heye tavî jî dijarî
 Bila qelbê te derwêş be, bila kum jî yê Tatar be.
 Bila (daîm) Xwedê yar be, bila dinya we neyar be.
 Beqê got: dê teqabûma, neba ger bû me ev weqweq
 We leglek emrê wê borî, dikir daîm ewê leqleq.
 Bila rê be, bila dûr be; bila bor be, bila kûr be;
 Vêya hanê bizanî qenc: Bila keç be, bila pîr be.
 Dibê meymûn li ber çavê diya xo da wekî xîfş e.
 We mihbet ya dil û qelban di dana destî da kifş e.
 Eger qîsmet hebit rojkê ji fisdûmanê derkeftin
 Dê hingê bo te ez bêjim bira pênc in weya heft in
 Dema aşiq dibin birçî, dîkin behsa wê dîlanê,
 Heta yek dil nebit xayîs niza qedrê dew û nanê.
 Dinêrim jor we simbêl e. Li jêr jî rih, we mam heyri.
 Ji kîsê xelkê eqlê wî. Çi zilqek kir evî teyrî.
 Dilê êkê çû goştê ker, holê got û çû nav koşkê:
 Dibêm guhê wî heywanî dişibhit yê wê kêvroşkê.

Dengbêjek û stranek; Bavê Selah

Amadekar: Evdîrehman UMER

Bavê Selah di sala 1952'yan de li gundekî bajarê Efrînê ji diya xwe dibe. Bi erebî sê sal dibistan xwendiyê. Dengbêjiyê dike. Bavê diya wî dengbêj bûye. Diya wî ji bavê xwe hîn bûye. Ew jî stranên diya xwe dibêje. Ji zaroktiya xwe ve distirê. Berpirsiyariya Koma Armanî kiriye. Ji bo zarokan stranên gelêrî amade kiriye. Gelek girîngiyê dide stranên zarokan. Kasetên wî di nav gel de hene.

25 salan li gund dimîne. Li gund cotkarî kiriye. Diwaran lê dike. Westatiya diwaran kiriye. 30 sal in li bajarê Helebê ye. Li Helebê karkeriya çekirina avahiyan dike. Li gund zewiciye. 7 zarokên wî hene; 4 keç û 3 kur.

08/11/2007

Têbinî: Ev hevdîtîna rûbirû bi dengbêj re hatiye çekirin. Agahî ji devê dengbêj hatiye nivîsandin.

YAR MEYRÊ

Lê de yar oy de yar yar yar yar yar yar yar
Lêlê Meyremê mi go te li gilî tê, mi li gilî tê
Rojekî ez ê rûniştibûm mi balê xwe danê zirke
zîrka darê me yê xênî tê
Mi go hebe bayê berî baranê rabiye, tavekî ji
tavê biharê hêdî tê
Ya mi go em ê ewilî maqûlê Şerqiyan û Berazan
Daketine deşta Sirûcê, ji xwa ra dilîzin bi cirîte
Ya mi go erdê berfê ku vê sibê li serê çiya diw-
erive dengê Feratê me yê jêrî tê
Feratê me rabiye lê hêdî tê
Di ortê da avê meyî tê
Di ser ra kefik û pûkê spî tê
Law di deştê ra avî zelalê delal dibe wek çigîtê
Wê çaxê derketim derwa, mi balê xwe danê
Meryema Miho Begê erê li ser zikrezikrê qon-
dera ji mehela me jêrî tê
Nizanim ji mala qêzî tê, nizanim ji mala miftî tê

Nizanim ji mala bavê xwey genî tê
Di linga da dengê kerîte qondera zîvî tê
Di desta da çaqeçaqa gopalekî kinêrî tê
Sing û berê Meyremê mîna textê kerewîtê
Memikê vê zalimê weke tenê hermî tê
Bi kirasê merezî tê
Bi gerdenî xelewî tê
Lêvê wê dilivîn mîna qelemî deri ser divîtê
De yar yar yar yar yar yar yarî Meyro
Hahîîîî

Lê lê de yarî yarîne, de yarî yarîne, yarî yarîne,
yarî yarîne
Bi dev dostê dilxayînê
Di ser mi ra yar û dosta dibînê
Dil kiriye Mehemedê Methînê
Mi xwe berda çirîka deşta Sirûcê, li ortê gundê
Şeşê û Metînê
Erê mi balê xwe danê, na wele defî dîlanekî lê
dixînê
Meyrema Miho Begê ketî serê dîlan û guvendê
serkêşe dikişînê
Desmalikî herîrî xistiye nav tili'w pêçiya, her
du çavê reş û belek li mi hiltînê
Dibi guregurê hêstira law dibarînê
Erê dîlan û govenda vê zalimê
Nebiye dîlan û govenda Temir Begê lewîn û
lewend Paşa
Li serê Kela Mêrdînê
Her ku carê kirîv gopalekî lê dixînê
Va zalima sî'w sê çiva bi bejn û bala xwa va
dixînê
Law çîqa keç û bîkê Deşta Sirûcê heyânî Deşta
cîhanê, heya Deşta Silopiya
Helnayên di rindîn û di mizgînê
Wey Xudê malê usta û serkara bi serî da
bişewtîne
Ji Meyrema Miho Begê ra qondereka teng
çekirine
Erê kêrikî xayinzîvînê bi ser da berdane, çar
gupikî zêrînê
Law mêratê qonderê teng çekirine
Ez bimrim hustiyê min bişkê
Şeyî linga digîfîşê, pêçî qilîçê diêşînê
De yar yar yar yar yarî Meyro
Hahîîîî

Berhemên ku di Pêşbaziya Feqî Huseyn Sagnîç de ketine dereceyê; BEŞA ÇÎROKÊ

**EM Ê BI GORA KALIKÊ WAN DE BIRÎN!
(Çîroka yekemîn)**

Dijwar Ūskan

Dîna ku min dît fitilokên gû bi ser devê qulika tiwaleta me ketibûn! Ez bi dengê ava ku dadiwerivî tiwaleta me, ya ku çala wê bi kevirên şear¹ honayî, bi xwe hisiyabûm û heya ku ez ji nav nivînên xwe pengizibûm da ku ez bi guncûrê nivînê xwe bigirim û ji tiwalete bikişkişînim, min dît ku ji wan fitilokên gû yên bi ser devê qulika tiwalete ketibûn ya herî tirtire li dora lingê min çireftikan dide xwe. Lingê min heya guzekê di nava pirikê de mabû. Dema berê min ket awêneya bi dîwêr ve, ya debixî, min dît ku wehcê min bi qasî gûyê karikan zer bûye.

Ev çi tişteki mişewşî bû ji bo Xwedê! Vê pirikê çawa di devê qulika tiwalete re dabû der? Ev li hêlekê, hela çi qewimibû ku ez di tiwalete de razabûm? Ma min ewqas ji gû hez dikir! Belê min ji bêhna tir û fisên xwe hez dikir û bêhna tir û fisên min û hevalên min ji baş bi serê hev de diçûn. Heya carna vê bêhna bi min erotîk ji dihat lê ne bi vê xezeba ku ez herim nivînên xwe di tiwalete de deynim!

...

A herî baş ez dev ji nivînên xwe biqerim. Ji xwe ji ber pirikê bûye kafirkeratî û çûye. Tewlê! Ji xwe re li balgiya min mêze bikin ku bûye weke masiyên herîreşkê, çawa bi sobaniyê dilize. Lihêfa min... Doşek... Tejika ku min li bin wan raxistibû... Ū ez... Îşev hey hebe tune be tişteki xurifiye û ew tişt ji demê pê ve ne tişteki din e; lewre yê herî kal li vê dinyayê ew e.

...

Hela ji xwe re lê...! Bê çi terpoxên gû bi ser devê qulikê dikevin. Ev çi bobelat e ya Rebi! Tewlê ma ez... Ma ez vê şevê di vê tiwalete de li gûyê zikê xwe digêrim? Ma navika min bi meqeseke bigû birîbûn û avêtibûn tiwalete?

Qaşo diya min ji min re gotibû ku: "Wexta ku tu nû welidî navika te bi meqesa ku kalikê te ji hecê anîbû birin û xistin nava qewlikê Qurana rahmetiyê bavê te da ku ilma te here ser xwendina Quranê û êvarên îniyan tu li ser ruhê bavê xwe yasînan bixwînî û kengê nan û ava min li vê dinyê hilat tu ji min re ji xitmekê bidî." Ka piştî ku mirov navika yekî/ê birî û pêve mirov wê têxista nava çi, wê ilma wî/ê dê biçûya ser wî tiştî. Ya tiştê ku diya min baweriya xwe pê danî derew bû yan ji derew li min kiribûn û navika min nexistibûn qewlikê Quranê, ji xwe tişteki wisa di qewlikê Quranê de tu carî bi ber çavê min neket, yan ji xêrnexwazekî/ê çûbû navika min ji qewlikê Quranê derxistibû û avêtibû tiwaletekê û dilê wî/ê bi vîya ji rihet nebûbû û çûbû bi ser navika min de rîbû. An na, xêr bû ku îşev ez bûbûm weke kêzikeke rêxê!

...

Ew qas pîsî ji ku derê derdikevin haho! Qey vê neqlê ji wê ew çend felqeyên ku ji sefîneyê² mane ber gû herin?

Ka, bê vê neqlê ji kî têkçûye û xwe avêtiye dextlê Xwedê.

...

Ma ji gişî, mêşa min çû li gû danî³ haho gidiyano!

...

Ma çi...! Ji çar peyvê me sê heb jê gû ne. Bîst û çar saetan, gû ji ser zimanê me nakeve. Ma me di pêşbirkên xwe yên ewil de hindik carî bi ser çavê xwe de mistibû. Ma me hindik carî bi stûrbûna silê gûyê bavê xwe serê xwe mezin kiribû. Ū tolhildan! Rojekê ji nişka ve li gundê me bi kevirnî qeraxe xaniyek ava kirin dûre jê re gotin "mektep". Ev peyv ewil ji devê muxtar pekiyabû. Xwedê tenê zane bê pûrta paş stûyê vê peyvê li ku derê bû. Me tu carî ne ji dibistanê û ne ji navê wê hez kir. Nizanim çima; lê her gav navê wê wêneyê marekî dianî ber çavê min. Me nuh ji spiyên serê xwe hezkiribû; lê dibistanê mekîna pora ji bi xwe re anî gund. Me ji çû gû di deriyê wê da! Me tir lê kiribû fis! Me îmana wê teneke kiribû! Me gûyê wê di çavê wê re anîbû! Me tola xwe hilanibû. "Malim" paş stûkurka xwe xwirandibû. Spiyên serê me govend gerandibûn. Gû çek bû, li ser milan bû!

...

Roj hatibû ku me gû ji tam kiribû!

...

Qey bû weris!

...

Ma دنیا virikî bûye? Çi kerifibû? Îşev dinyayê dirît an na vedireşiya? Gelo îşev tişteki çawa dilê dinyayê li devê wê xistibû!

...

Ev eşq û muhabeta min î gû kengî li min peyda bûbû? Gelo dema min di malzaroka diya xwe de zîl da û ez hêdî hêdî şîn hatim, jixwe di navbera malzarokê û gû de perdak pir tenik heye, diya min li ser min xera nebûbe û gû nexwaribe? Tewlê mirov çi hebûneke ecêb e! Jinên bi halekî li ser çi tiştên xerib xera dibin. Hinek ji wan zingarê dixwin. Hinek ji wan kilsê dixwin û axê, kilê çavan, pelên salnameyê, cîncîq... Ku bibûya belkî hinekan ji wan goştê mirovan bixwara û hestiyê wan bikeritandina. Hîne dema serê mirov di nav gûyê wî/ê de be û dawa van tiştên bike îcar Xwedê hîvza mirov ji halê wan î mezin bike. Mirov destar e, aş e û jiyan ji perxane ye. Ev destar û aş heyê vê perxanê dihêrin. Mirov hew hûr e! Bobelata bi sosret ev e ku çawa du heb hûr dikarin evîndarî hev bibin?

...

Fikirîn wek qahpetiyê... Wîiixwuuu...!

Dengê balafirên şer tê. "Dema ku hûn daketin balafirgehê hûn li gûyê me biçerixin Rebîî!"

...

Wîîî... Xwelî li serê min be heft arî li nav guhê min be! Min çawa ya xerab bi xwe de anî! Qaşo min û hevalên xwe yên dinyayê me yê îşev nivê şevê li malê çiqas zembeke hebûna me yê tevde vekirina da ku av di erdê de bizaya û zor bida erdê ku gûyê her kesî li wan

vegeriya û her kes ber bi gûyê xwe ve biçûna.

...

Hînê ez zêde ji hevalê xwe nemame. Fiss...! Ûûû deh! Rojeke wisa çawa ava me diçike! Wer nerî û di xwe nede!

...

Şirr...! Belkî bi xêra vê çenikê, silên gûyê çend mirovên feqîr bi ser devê qulikên tiwaletên wan bikeve. Hayê me jê heye ku malê me jî li ber gû dihere lê em ê gûyê xwe bavêjin û xwe mohtacî gû lawê gû nekin!

Têbînî

¹ *Şear*: Bi erebî ye û di wateya rîsên reş ên ku konên reş pê dihat honandin de ye. (2) *Şear*: Kevirên reş ên li hêla Wêranşarê.

² Navê keştiya Nebî Nûh e.

³ Gor listikeke ku berê di nava gel de dihat listin: Her listikvanî/ê wê biçiya ji xwe re hêkeke peyda bikira û wê her yekê niqutek şêrani li serê hêka xwe kira û wê hêkên xwe li dû hev li erdê rêz bikira û wê listikvanan gîşa xwe bîda benda mîşekê da ku li hêka wan yekî/ê daniya. Ku mîşê li hêka kî daniya wê ew hêkên wê derê gîş ji wî/ê re bimana. Dema ku mîşê diçû li hêka yekî/ê datanî en ku têk diçûn digotin "Ma ji gîşan mîşa me çû xwe li wêya dani" ez bawer dikim wê biwêja ji bingeha xwe ji vî yekê girtiye.

*** **

DADWERIYA XWEDAYÎ (Çîroka Duyemîn)

Sevger Çiya

Bes bişarîne bêbextê

Vî dilê ketiye binxetê

An helalke cotpêşîrên têrtiam

An bikuje da rizgar be j'vî derdê

(Berken Bereh)

Dem nivê şevê ye. Li bajarê Enqereyê, mala xwendekarên zanîngehê ye ev der. Xortekî bejindirêj, esmer, hinekî jar li ser doşekê dirêj ketiye li qatîyên xanî dinêre. Ber doşeka wî xwelîdankeke tije xweliya cixaran, sê qatîyên birayê yên vala hene. Dûxana cixarê û bêhna araqê ketiye nava hev. Dengê muzikê heta dawiyê vekirî ye. Her gulpekê li cixara xwe dixê, weke şair dibêje 'cixara xwekustîne', di vî kîlîkê de hêviya ezraîl e ku bê ruhê wî bistîne. Her du çavên wî ji xwînê sor bûne. Weke ji ser hişê xwe biçê ne êşa ku dikişîne hîs dike ne jî haya wî ji der û dora wî heye. Li aliyê Mihemed Şêxo "ay lê gulê" distirê, li aliyê din çav tîr girtin, laş dîtêvîze, dinê, ku hê mirovan biryar negirtiye gelo qûnek e, bêbext e, hov e, yan tije êş e li dora wî digindire. Bi xwe re xeber dide; "Tu li dora min, ez li dora wê digerim. Ne ez ji te hez dikim ne jî ew ji min. Ez dizanim ku ne dê tu bisekinî, ne jî ez disekinim. Lewre tu peywardar î ku bizivirî, ez jî weke te. Ne mirovan ji te fêr kirin û wexta fêr nekirin dijmînên te dan, tu kirin bêbext, qûnek ne jî wî ez fêr kirim. Çiqas min got tu afirîndera min î, ez bîyî te nikarim debar bikim wî got na. Min got ez evdê te me. Hînî min bike ez ji te re îtaet bikim wî got tu nexweş î. Qey Adem rihet bû? Ji bo sêvekê wî em hemû hetikandin. Lê Rebê wî dilovan bû, îtaet hînî wî kir, rêya xilasîyê pê nişan da. Ew xwe dûrî min dide. Dibêje bi xatirê te. Min di nava dojhê de dihele. Dibêje ev dojhe dojhe te ye. Belê ez qayil im, heke di dawiyê de xilasî hebe."

Di kolaneke tarî de polês devedev li pey wî ne. Çiqas baz dide nikare ji nav polêsan xilas bibe. Polêsek çeka

xwe dikişîne, du caran berdide hewayê, dike qîrîn; "Kero ku min tu girtî ez dizanim çi tînim serê te!" dawîya kolanê weke şikefteke çiyayên welêt e, dikeve nava vî şikeftê. Dêrdikeve gundê xwe, hê zarok e. Diya wî wî dişîne ber pez. Di çentikê wî de pariyek nan, du serî pîvaz hene. Hê tarî li erdê ye, diricife, ji diya xwe re dibêje; "Dayê ez ditirsim!" Diya wî lê vedigerîne; "Kurê min, êdî tu mîr î, ka mîr ji tariyê ditirsîn? Bila deng neçe bavê te wele dê ji te bixeyde." Bêgav ew û keriyê pez ê li hember ber bi çiya ve diçin.

Pez ber dide dehlê, ew jî diçe li ser zinarekî bilind, li der û dora xwe dimeyzîne. Li wî aliyê zinar ji binê deviyekê inteint tî. Bi dudilî û bê pejn bi aliyê deng ve diçe. Keçikeke tazî her du lingên xwe ji hev vekirîye, li ser piştê dirêj ketiye kurikek ketiye nav her du lingên keçikê, di ser keçikê de diçe û tî. Di her çûyîn û hatina wî de keçik dike inteint. Lawikî berê xwe bi asmîn ve kiriye ji Yezdan re spasîyên xwe pêşkeş dike. Keçik di nav xwîna xwe ya ku ji nav ranên wê diherike de çavên xwe girtiye, li ser rûyê wê bişîrîneke qûnekî heye. Dîmeneke ji hezar sal berê ji me re maye. Çawa Hewayê bavê me Adem xapand û bû sedema qewitandina me ya ji bihuştê îro jî ev dîmen bû sedema kuştina lawik. Porê keçikê weke porên Nêrgîzê xirpûşkî, rûyekî spî, mijangên dirêj, birûwên zirav, destên nazik ên spî, her du lingên spî yên bêpûrt, her du memikên qasî sêvan, serê memikan şembelotî di devê lawik de. Belê ev keçik Nêrgîz e. Kevirê mezî bilind dike, bi hemû hêza xwe li nava serê lawik dixê. Lawik li wê derê di nav xwîna xwe de dixeniqe. Ji serê lawik heçko kanî ye xwîn diherike. Rûyê lawik spîloçkî dibe, laşê lawik hişk dibe nola qotekî darê. Wexta li keçikê mîze dike wey bavo ev çi ye? Keçik Nêrgîz nîn e. Lal dibe nikare bipeyîve. Keçikê û keriyê pez li wir dihele û dibeze.

Tê mala xwe ya Enqereyê. Ji hevalên xwe dipirse: "Kesî li min pirsî?", hevalên wî dibêjin; "Na!". "Ox!". Ox û çawan ox. Ji malê derdikeve. Li navenda bajêr golege mezî dibîne. Şaş dimîne, bi ramanên seyr li dora xwe mîze dike, mîrikek li ber qeraxê golê li golê dinêre, xwe nêzî mîrik dike ji mîrik dipirse; "Ev gol ji kîngê ve li vî derê ye?"

- Jixwe ev gol li vî derê ye.

- Na bû nêzikî çar salan ez xwendekar im li vî bajarî, min tu carî ev gol nedît, ji dîtîne wêdetir min qet seh nekir ku li Enqereyê gol heye.

Mîrik wîndî dibe, li peravê golê keç û xort cot bi cot rûdinên. Keç di hembêza lawan de, dev di nava devan de, dest li ser zik, li ser memikan, nava ranan de leqatê dikin. Tariyek li erdê ye fêr nake golev berbang e yan rojava ye. Simîtfiroşek diqîre; "Simît, simîtên germ, simîtên berbangê derketin. Simîtî!" heke berbang e çawa ew qas mirov hatine vî derê. Çawa ew qas mirov dev ji xewa şêrîn berdane, keçan çawa destûr jî dê û bavê xwe stendine? Çima qey çi bûye? Çi qewimiye?

Di pêşiya wî de keçikek û kurikek, keçikê destê xwe li newqa lawik lefandiye, lawik destê xwe avêtiye ser milên keçikê, keçikê xwe spartiye lawik her du bi hev re dimeşin. Belê saqoyê li keçikê kesk, tilmê keçikê vedişêre lê mirov bi baldarî binêre dikare têbigihîje ku keçik

xwediyê tilmekê gilover û hinek mezin e. Fistanê ku digihîje ser kabokan şîn e. Fistanekî Nêrgizê jî heye bi heman rengî, wexta vî fistanî li xwe dike mirov dikare hemû newal û girên laşê wê bihizire. Qîza kerê ew jî dizane ku ev fistan pir pê dikeve, wexta vî fistanî li xwe dike weke qîza padîşahan bi quretî, bi hêza xweşikbûna xwe, bi zanebûna ku dikare bibe sedema kuştina hemû xortên polê bi rê ve diçe, tevdigere. Porê keçikê weke porê Nêrgizê xirpûşkî, keçik kenekî dike. Ev deng dengê Nêrgizê ye. Dibe gulpe gulpa dilê wî. Gelo ev keçik Nêrgiz e? Nêrgiz û lawik di nava rê de devê xwe dikin nava devê hev dibe milçe milça wan. Hiş ji serê wî diçe. Çawan ew lêvên bihuştî, destên nazik, gewriya spî bibe para yekî din. Gelo ev kurik dizane ku ev lêv lêvên ji rêzê nîn in, ev dest, ev zend, ev pî, ev mil, ev ling, ev por, çav, birû, gewrî, memik, ran, teşk, tilm pîroz in. Tawanbariya herî mezin di dinyayê de tiştên pîroz weke tiştên rêzê dîtin û li hemberî van tiştan bêrûmetî ye. Xwedê bixwesta dikaribû mirovan hemûyan weke hev biafirîne lê Wî çi kir? Hinek ji me pîroz afirandin û em kirin muhtacê wan mirovên pîroz ku em têbigihîjin ku Ew heye. Ev dada Xwedayî ye. Di vê dadê de wekhevî nîn e, maf nîn in, azmûn nîn in, tenê li gora dilê xwe, bêyî pîvandinekê ji hinekan re xulamî, ji hinekan re pîrozî bû qismet ango hat dayîn. Bi kurtî Heq neheqî kir. Desthilatdariya xwe bi hinekan re parve kir. Hinek ji ne tenê kir evdê xwe, di heman wextê de kir evdê mirovên pîroz jî û bêyî ku azmûn biqede hinek bi destê şîrkên xwe avêtin dogehê. Hemû evîn ji ber vê yekê têk diçin. Mirovê dildar dixwaze bi xwedawenda xwe re evînekê bijî. Gelo ev tiştêkî pêkan e?

Nêzikî Nêrgizê bû, destê xwe avêt berîka xwe kêrek derxist, bi derbekê serê lawik jêkir, laşê lawik ê bêserî mîna qotekî darê li erdê ket. Laş pirpitî. Li gund wexta mirîşk serjê dikirin heke bi mirîşkê negirtina mirîşk dipirpitiya û car caran bi qasî pênc şeş gavan jî diavêt. Laşê lawikê bêserî nola wan mirîşkan dipirpiti. Serê lawikê jêkirî bilind kir bi Nêrgizê nişan da, devê xwe bir ber guhê wê; “Te xayînî kir, te pîrozweriya xwe hetikand. Te xwe û Ew tev de têk birin. Ev yeka ku min kir jî dadek ji dada Xwedayî ye.”

Heman polês lê peyda bû. Polês êdî ew ji xwe re kiribûn armanc. Polês dixwest wî bikuje. Bazda bi şerqîniya demança polês, laşê wî diteviziya, lê dişa divê baz bida û wî jî baz dida. Li hember daristanek hebû; daristaneke mişt ji darên mazî. Heyirî ma gelo di Enqereyê de darên mazî hebûn? Li navenda bajêr li ber qeraxê gola Enqereyê? Xwe avêt nav daristanê. Daristana tarî, bêpejn, xof lê çêkir. Dora wî tiştekî bûn. Ev kêzik bi qasî filan mezin bûn, her heba wan xwediyê dozdeh lingan bûn. Kêzikên reşik, bêhna kêzikên tûyan ji wan dihat. Li ser piştê kêzikan mirov siwarkirî bûn. Ji wan mirovan yekî got; “Tu çi dikî li vê derê? Ketina vê daristanê qedexe ye.” Bêyî ku bersiva mêrik bide got; “Ev çi mehlûqat e hûn lê siwar bûne?” mêrik bi tundî bersivand; “Em tîm in ev jî kêzikên me ne. Em li hember terorîstan êdî bi kêzikan şer dikin, lewre tanq û top nikarin bikevin nav daristanan û bikişin serê çiyayan.” Ji xwe re got li Enqereyê gerila li çi

digerin, daristan û gol? Mêrikê li ser kêzikê got; “Tu çima baz didî? Ev polêsên ku tên çima dixwazin te bikujin?” got; “Min tiştêk nekiriye. Polêsek heye dixwaze min bikuje. Ez jî nizamim çima dixwaze min bikuje.” Mêrik ferman da tîmên din ku wî bigirin teslîmî polêsan bikin. Qîrînek pê ket “Naaaaaa!”

Ji nav nivînen xwe pengizî. Di pacê de nihêrî derve hê tarî ye. Bajêr bê pejn li hêviya rojeke nû ye. Her kes di xew de ye. Tenê lampê kuçan pêxistî ne. Jiyana bajaran tam di van saetan de dimire, di van saetan de tu emareyên zindîbûnê nîn in. Ne dengê trêmbêlan têt, ne dengê muzîka cafeyan, ne jî dengê guftûgoyên cîranan. Şev di van saetan de sedî sed hikumdarê dem ê ye. Tarîbûn di van saetan de herî dijwar e. Dengê limêja sibê banga qedandina şevê ye. Dibe ku ev limêj şabaşek be ji bo Yezdan ku şevêk jî qediya. Dibe ku bêyî xwesteka Yezdan ev limêj têt kirin. Dengê mele mirovan haydar dike ku mirov di vê zilemata şevê de tenê nîn e.

Pey ew qas tîkçûyî, pey ew qas bêbextiya Yezdan careke din Yezdan li mirovan têt rehmê û banga îtaeta xwe dike. Lewre Yezdanê dilovan bi xêra şîrkên xwe yên pîroz dikare mirov bavêje dogehê, dikare mirov bike parsekê êşê, êşa ku karibe evîne bi mirov bide jibîrkirin.

Yên ku te ew pîroz selimand, dibe ku li ber dilê te pîroz bin lê îxanetê bi mirovahiyê dikin. Tu jî dizanî tu şaş î. Ez îro tîgihîştîm, te tenê dogeh afirand. Hêza te ya herî bi bandor evîn e. Ew hemû îşkenceyên ku te behsa wan dikir ji şikestina evîne wêdetir ne tiştêk in. Ez îro li hemberî te îtaetê dikim û evdê xwe dipejirînim. Lewre tu xwedîhêz î ku min ceza bikî. Îsa ji bo ku bi ya te nekir te hişt ew bê darvekirin. Wî jî fêm kir û ji bo vê yekê digot “Te çima ez terikandim” Îsa mirovperwer bû, digot yê ku bê guneh e bila kevirê pêşîn bavêje gunehkar. Lewre Mûsa bi te re bazarî dikir û cihûyan bi xebera te nedikir. Bi her daxwaze te Mûsa nerazibûna xwe bilêv dikir, tu bêgav bûyî ku bi Mûsa re bazariyê bikî. Vê yekê tu ditengizandî û te Îsa şiyand ku li hemberî te îtaetkar be. Îsa ne tenê li hemberî te li hemberî mirovahiyê jî îtaetkar derket. Ev yek dihat wê watêyê ku te îktîdara xwe dîsa bi mirovahiyê re parve dikir. Dawiya dawîn te Muhemed şiyand û te got “Min ev dinya ji bo cenabê wî afirand”. Bêyî parvekirinê, te îktîdar hemû girt destê xwe û te duh ez ceza kirim. Ev cezayên te, ev doheha te hemû bê mantiq in. Lewre tu jî dizanî afirandina mirovahiyê şaşiyeke pir mezin bû. Tu bi wê zanîna xwe ya bêdawî tîk çûyî. Tu li xwe mukir nehatî. Ji ber vê şaşiya te ya mezin mirovahî di nav êşên bîsedem de digevize. Te em bêgav hiştin ku cezayê şaşiya te bikişînin. Tu xwediyê îktîdarê yî. Bi hemû şaşiyan xwe ve tu hê jî Xwedayê mirovahiyê yî. Te duh ez gelek êşandim. Bes e. Ez îro li hember vê îktîdara te serî ditewînim û êdî ji îro pê ve ji te re îtaetê dikim. Ez dizanim ku hêza te ya mirovan ji şewata dogehê xirabtir bike û biêşîne heye. Ez êdî evdê te me. Şertekî min heye cardin bila evîn nebe mewanê min.

Çû serşoyê serê xwe şûst, destnimêja xwe girt. Hat secadeya xwe raxist “nîyet dikim du qamet nimêja sibê ji bo Xwedê. Xwedê tu qebûl bikî. Alahûekber”.

*** **

BEXTEWARÎ Û MIRIN

(Çîroka Sêyemîn)

Azad Ronakbar

Bayê germ ê hingorê wek pêlên deryayeke ji germê li rûyê wan dixist û dibihurî. Peyxam û Cebâr li ber qehwexaneyê devê rê, li ser rûniştokan, rûniştî û di nav sohbetêke tîr û kûr de bûn: Belavbûyîna çandê... Giringiya bîrmendiya dîrokê... Evîna xweşiyê... Dijwariya jiyana di bandora helbestê de û tahma wê ya berz ku devjêberdan ne gengaz bû...

Hema çî bigire saet û nîv, du saet bihuriye di ser rûniştin û dest bi sohbetkirina wan de.

Ji kuçeyê, du keçikên ciwan, ku li ser wan pantorên jênsê şîn ên teng û gomlekên tenik, porên wan ên vekirî li sermil, di ber wan re bi hejandineke şûx derbas dibûn. Çavên Cebâr ji keçikan nedibû, dûre bi dengêkî sivik, bêyî ku diranan ji ser hev rabike, deng li hevalê xwe kir:

Gidî, de were û nebe evîndarê xweşiyê!

Cibo, li xwe miqate be, evîna xweşiyê û qirdikiyê tevîhev nekî!

Bi van gotin û henekan mijar belav bûbû û piştî demekê rabûn û dane hevraz, ji xwêdanê kurtekê wan bi canê wan ve zeliqîbû... Çaxa ku ghiştin cihê ku Cebâr wê ji bo çûyîna malê jê veqetîya, sekinîn.

Cibo, di demeke ku ji serî heta pê bi bextewariyê hestbûyî de, di demeke ku te

lûtkeyên bextewariyê hîs kiriye de, hîç, bûye ku te daxwaz li mirinê kiriye?

Ma ev çî pirs e? Bi rastî, na, nayê bîra min, beriya vê demê li ser vê yekê qet

nefikirîbûm... Lê, bêhtir tu li xwe miqate be, wiha herî, tu yê dîn bibî! Dê, heta hevdîtineke dîn, bi xatirê te...

Gavên ku kurt û aram dihatin avêtin, nedixwestin ber bi mal ve herin... Nedixwest niha pêrgî tenêbûnê bê. Çend meh bû tenê dijiya. Tenêbûn pêwîst bû, ji bo xwejiyîne, ji bo vegotina jiyîne...

Dil feyz diviyabû, hiş zelalbûn... Dil tî bûbû... Dil û hiş feyz diviyabûn... Gav bi bêhnfirehî dihatin avêtin; çavan li rabirdûyê dinihêriyan, çav li dahatûyê vedigeriyan. Pêdiviya rabirdûyê xwe dida hîskirin û ev pêdivî bû ku hêla gavên ku bi bêhnfirehî dihatin avêtin, xuya dikir. Serî rakirî, nêrîn li pêş, li bergeh bi dilfirehî dimeşiya. Xaniyên li her du aliyên rê wînda bûbûn, xanî, mirov û hemû dar û ber wek ku wînda bûbûn, tune bûn... Tenê rêyeke reş a asfalt li ber wî dirêj dibû. Goristan ji dûr ve hema xuya dike. Goristan; girekî biçûk, na na, zêde biçûk nîn e, lê mezin ji naheşibe. Li aliyê çepê di nav baxçeyekî de camiyek ku minara wê tune ye û berê wê li rê dinêre, heye. Aliyê girê ku li rê dinêre û hêşinayî li ser pir kêm e, ji baranê maşiyayê û ji rê bi diwarekî kin, diyar e ku piştî çekirina pîrî goran hatiye ristin, hatiye jêkirin. Gor bêpergal hatine çêkirin. Ji ber ku pir zêde ne, heta ku li bin diwêr jî hene. Bi dû meşeke dirêj, bi gavên nermtir kete nav goristanê û bi baldarî meşa xwe domand. Çav li pêşî, nêrîn li ser axa goristanê bû; gavên nerm jixweber dihatin avêtin. Ji ketina wî ya goristanê vir ve çiqas wext bihuribû nedizani û çend gor ziyaret kiribûn... Hingî li ber gavên wî diwarekî mermer ku bilindahiya wî nêzî metroyekê hebû bilind bû, sekinî, nêrîn li pêşî, her wekî bi rêzdarî

û evîn, bi heyranmayîneke li rûyê mezinekî xwe binihêre serî rakir û li ber gora Seyda Mela Ebdulsemmed, kure Seyda Mela Osmanê Xorosî yê ku qadiyê milê rojhilat ê tevgera Azadî -tevgera ku serekê wê yê qedîm Şêx Seîd bi gotina "Azadî Evîn e!" stû dabû ber kap, bû, bejna xwe tewand, silav lê kir, piyê xwe yê rastê rakir ji ser diwarê mermerî re derbasî nav bû û li ber şaxeke dara gulê çok veda...

.....

Seyda westiya bû, hêdî hêdî çavên wî dihatin girtin. Dema Peyxam çavên xwe vekir pê hesiya ku demeke xweş bihuribû; nivîna wî ya yekem temaşekirina esmanan bû. Ewr sor bûbûn. Bi dilekî tijî û hişekî rehn û zelalbûyî, bi bédengî ji Seyda xatir xwest.

Dilekî hênîk, hişekî ji wext rizgarbûyî...

Yanê sivikahiya bextewariyê...

Pelînê bedena xwe ya şeng û bi viyan dirêjî ser textê kir û ji bo serê xwe yê ji ramînê westiyayî jî, bahlîf nexwest. Li her derê bêhna wî hebû. Nefesên kûr hildida û bi vî awayî bi navberên kin bêhna wî heta quncikên herî asê yên cergên wê dineqîşîya hundirê wê. Destê xwe yê çepê danî li ser sing, li ser memikan, li ser du kaniyên xweşiyê... Gotin û rêzên hozan û şairên evîndar ku li ser wan hatine gotin, hatin bîra wê... Lêvên sor û tije, di bandora rêzine û xeyalan de, bi bişirîneke vekêşîyan û xemzeyên ku dişibîyan du hîvokên nû, xuya kirin. Piştî demeke kin mijangên dirêj li ser çavên girê reş û belek ketin hev; raman veguherîbûn xeyalan: kembereke sor... hêstirên çavên şil, şênîyeke boş... kovaneke zirav... dengê dahol û zirnê... xêliyeke spî, wek kulîlkên darên mêweyan, bi xeml û serberz... Çav vekirin û bîskeke li der û dorê nihêrî, dûre dîsa xew, xewa sivik û şîrîn... Û îcar kena zaroyek, kena keçikek biçûk ku hema çî bigire yek û nîv angû du salî ye di nav xaniyê mezin de deng û şeqînên wê yên şeng olan dide... Pelînê her du mil heta dawiyê vekirine û li benda hembêzkirina wî ye. Lêv diliblibin, hema nîvdiyar:

- Qeb...Qeb... Qeb...

Peyxam dereng mabû. Ew şev, dê şîva şevê bi malbata wî re bixwarina. Pelîn ji bo alîkariya şivê li mal bû. Lê Peyxam hîn li sûkê bû. Li salonê bi hev re rûniştibûn. Dem zû bihuribû, şiv amade bûbû, ji bo sazîkirinê li hêviya wî bûn. Lê ew dereng mabû. Çima? Hem rîka wî jî ji derengmayîne dihat. Pelîn ketibû nav fikaran, dilê wê nerihet bû, gumanan bê sekin êrîşî dilê wê dikirin. Destê xwe avêtê telefona xwe ya destan û lê geriya. Telefona wî lêdixist, wê bêhneke din dengê wî bibihîsta. Telefona lêdixist, lê bersiv tune bû, telefon heta ku dengê meşgulê jê hat û hate girtin lêxist.

Li çavên dê û bavê wî nihêrî û piştî demekê, ku dê bikaribe hin tiştan bide jibîrkirin, bi dengêkî ku dixwest fikarên xwe jî di nav de xef bike got:

Bersivê nade...

Bi dû bêhnekê telefona xwe dîsa bire ber guhê xwe, dîsa lê dixist; yek, dido, sisê, çar...

- Alo!

Ev deng, dengêkî hişk. Ev ne dengê wî ye.

- Ez li Peyxam geriyabûm. Hûn kî ne?

- Ez polês im! Hûn çî yê wî ne?

- Ez... ez... Têlêfonê didim bavê wî.

Bûbû ku her wekî avekî kelijî bi ser wê de rijiyabû...
Dikir ku bigiriya; peyvên 'Hûn çi ye wî ne!' di hundirê wê de olan dida.

Hingî çavên xwe şidiyayî girt, xwe di tariyeke bê ser û bin de dît. Bi hêzeke nedîtî ber bi jêr ve dadiket.

Bi dengê derî veciniqî û şiyar bû.

Wexta derî li dû xwe girt, cotek pêlav li ber çavên wî ketin, Pelîn berê hatibû. Vê yekê hêvî nedikir, kêfa wî xweş, dilê wî hêniktir bûbû. Rahiştê cota pêlavan û bi cawekî ku ji refa pêlavan hildabû toza li ser wan paqij kir û paşê ew li ser refika jor bi cih kir. Li ser rû kenekî sivik û jidil ku ji hênika hiya dil û kêfxweşiyê xwedî dibû, hêdî hêdî nêzikî deriyê nîvalî yê salona rûniştinê bû, ji hundir ve dengê muzîkeke nerm dihatê bihistin; reng û tîrêjên êvarê diherikiya nava xanî, hundirê salon û odeyan tije dikir, bi hêminiya rengên xwe digonand... Û muzîk, li gor rengên êvarê, nerm û hênik, aram û dilinkî... Destê xwe da deriyê nîvalî û kete hundir, Pelîn li ser text, li ser pişt xwe dirêj kiribû. Bi hatina Peyxam hesiyabû, çavên wê li derî, dipêya.

- Pelîn... Tu bi xêr hatiyî...

- Tu jî...

Peyxam ber bi text ve diçe, her du jî li piyan in, li nik hev in, lêv li hev dikevin, carek, du car, sê car û hinekî din...

- Kengê hatî

- Nêzî saetekê heye.

- Çima te ez haydar nekirim?

- Va ye tu hatî...

Pelîn milên xwe li stûyê wî aland, lêvan danî navbera sermil û stûyê wî û bi nefeseke kûr bêhna wî kişand nava singê xwe, hundirê xwe û bêhnêkê bi milan ew şidand...

Piştî saet û nîv û du saetan, hingî bi birçibûna xwe hesiyar û qala çekirina xwarinekê dikirin ku, Peyxam sekinî, çavên xwe êxiste çavên Pelîn û bi dengêkî sist:

- Pelîn, dê û bavên te ew?

- Ez, ez ê îşev li vir bimînim, bi te re...

- Here lê, henekên xwe bi min dikî?

- Naa... Îşev li mala Şewal wan im...

Ev derya mezin, wek gumanên min

Kûr û peravê dûr

Hawîr çiya ne wekî dilê min

Pir xurt û sitûr

Şevê tarî û reş hemî kul û xem

Wek çarşefa yar

Şevê bi sewaneyên Seyda Cegerxwîn dest pê dikir. Ristên kûr û şeveke germ...

Du lembe ku şewqa wan li arikan dixê, ji du kuncikên cihê bi ronahiyeke zer û qels odê ronî dikin. Têkberên odeya ku gelek sade bû ji du text û refeke kitêban ku heta arikan radibe dihatê pê. Li erdê xaliçeyêke bi rengêkî nêzî şînekî vekirî û li ser niqte û xêzên kesk, şînê tarî, qehweyî û reş hene, ku hema çî bigire nivê odê girtiye. Û li diwarên ku di rengê eflatûnekî gelek vekirî de ye, dişibe morê vekirî jî, tenê tabloyek hilawestiyê; tabloyêke mezin û kevnare dixuyê

ku rengên hakim zer û keskekî kevnabûyî ye û tê de mîrekî navsal, ku porên wî hinekî dirêj, pêxwas û berda ji kirasekî dirêj heye ku bi vî halê xwe mîna feylesofên yewnanî yên dem ên berê dixuyê, li ber deriyê xaniyekî kevnare yê di nav baxçeyekî xweş de, kûz bûye, sekiniye. Di destê de lembeyeke destan û bi destê din li derî dixê, bi hêviya bersiva ku wê ji hundir ve bê dipê, qama xwe kûz kiriye û dipê, tiştê ecêp jî ew e ku destê derî ji derve nîn e...*

Peyxam laşê xwe li ser textêkî dirêj kiribû û bêhna xwe vedida. Ji şibakeya vekirî bi bêhna şevê re hewayeke hênik dişûjiya hundirê odê. Pelîn di dest de kitêba Seyda Cegerxwîn, hem bi gavên hûr û nerm di odê de digeriya û hem, hin beşên helbestên ku herî zêde jê hez dikir bi coşa dilê xwe dixwend. Mîna ku tenê ji xwe re dixwend. Bi dilşahiyeke resen bûbû weke rûbarekî ku bi hêrs diherike, dengê wê yê zelal mîna pêlên hîsan, li gor sewaneyên helbestan pêl hildihat, pêl dadiket...

**Tabloya William Holman Hunt a bi navê Tîrêja Gerdûnê*

Du sê qedeh, tu meyger bî.. li ber dengê te ê ez im

Di nêv destên te, ber çavên te, ez binrim û tîr razim

Mîna dengêk bi guhê wê ketibe, serê xwe ji nişka ve rakir:

- Peyxam.

- Lebê.

- Navê te kê daniye?

- Navê min, bavê min daniye, ji ber nêzîkbûyîna helbestê...

- Yê xwişka te?

- Yê wê jî bavê min daniye; di wateya ronahiye, zelalbûnê de. Bes, tu xwişka min ji ku nas dikî?

Pêwîst e ku her tişt vekirî be? Bila ev jî veşartî bime. Va ye şev, her tişt veşartiyê; dar, ajal, xanî, ewr, çiya û behr... Bes ba... tenê ba diyar dike, her dem, hem xuya û hem veşartî ye... Ma, mirov jî ne wilo ye, Peyxam; tu çiqas vekirî yî û gelo çiqas veşartiyên te hene? Dibêje Pelîn, bi peyvên xwe yên dawîn weke ku bixwaze gotinê li bin çengê wî bixe.

- Rast e, mirov her çiqas vekirî be jî, xwedî aliyên veşartî ye jî, ku hinên wan wek şevên bê hîv in; ji xwediyê xwe re jî tarî û girti ne.

.....

Demekê her du jî welê bêdeng dimînin. Peyxam bêtî ku çavên xwe ji ser kilîma li erdê rabike diaxive niha:

Pelînê, tîkiliya me neynika vekirîbûna min e jî û tîkiliya me neynika nava me ye, vekirîbûna me jî girêdayî tîkiliya me...

-

- Tu pîrsa min nabersivîni?

- Peyxam, tu bawer dikî ku ez ê xwişka te binasim û ji te re nebêjim!...

-

- Min henek kiribû, herê, hê, heta xwişka te jî nas nakim.....

Hêrseke xuya dilê wê daye ber pêlên xwe, êdî bi coş xwendina helbestan ne gengaz e; wê kitêbê deyne ser refê û ji odê derkeve biçe medbexê, piyalek av vexwe û bi rahiştina pakêta cixarê ya di çenteya xwe de cixareyekê bikişîne.

Dema ku dê kitab bibira û bi cih bikira, kaxeza çartakirî ku demeke berê jî di navbera rûpelan de li ber çavên wê ketibû, bi meraq ji nav derxist û vekir. Helbestek, halê dawîn a helbesteke ku bi destnivîseke bisemt hatiye nivîsîn, ku di bin de înzeyek nas heye; germahiyek ji dilê wê dibihure...

Avzêya Peyxaman

*Mîşext im
li jînê
gava nebe rengê te
spîbûneke tenê ye siba
ne bêhn e û ne reng
tariyek ji razên xwe veqetiyayî ye şev
ne ba ye û ne jî sedayek êdî
qebr e qebr bê te nivîn
mîna axa reş dikeve ser min lihêf
Pelînê
jana bêtêbûnê
mîna bê hizr û raman mayînê Pelînêêê*

*Pelînê
Mîşext im ji xweşiyê
bêyî rengê te
zînhar
nabe ev Peyxam li rûerdê*

Nefes lê diçike, singê wê bi lezgînî, bi nefesên kurt û bi lez hiltê û dadikeve. Bi çavên tijebûyî li Peyxam vedigere û zîq li nav çavan dinihêre:

- Xerabo!

- Dibêje, dengê wê dilerize. Bi kelegirî didomîn e:

- Çima min ji van hayidar nakî, qey mafê min jî nîn e, çima bi min nadî xwendin? Ev, ev rêzine, ma tê de para min jî nîn e?..

Bi gotinên dawî lerzeke kel di hundirê wê de pêl dide. Ji Peyxam çu deng dernakeve, tenê li ser rû beşîşîneke sivik û mehcûb, li nav bûbikên çavên wê dinihêre...

Pêşî, tenê çav, tenê nêrîn bi biriqînên evînê li hev dadîçikin; hewce bi deng û gotinan namîne, naveroka bêjeyan nîn e êdî, bêje tune ne -ziwa bûne. Çav ji heza evînê şil dibin, xwegirtin, hinek jî, dil jan didin, lê her weha hez, coş hildikişê, li dawiyê her du laş bi hêrs li hev dikevin, hev radipêçin, dest bi livên cirifok dibihure stûkurê dişewite, dest dikevin nav poran, porên bêhna xweş jê difûre û li dawîya dawîn dev, bi coşeke şet...

Di nav cihan de ne.

Saet bi lezgînî bûye dudu û nivê şevê.

Şev bi bîdengî û bi dangan re diherike, bi her deqîqeya ku dibihure re tîrtir dibe û di heman demê de deng, bêje, hest û pirsine jî, pirs êdî dikevin ser piştê hev, bes piranî mayîna di tariyê de tercîh dikin. Lê dibû ku - mîna ku pir caran dibe, hinekan serî hildida.

- Peyxam, ez çi yê te me?

- Tu... tu ne tişteke min î. Dem ên ez li cem te me ez bextewar im, hebûna te tê wateya kamiraniyeke bêpayan, tenê mirad.... Û tenê kesek nikare ev qas

watedar bibe... Di vê rewşê de tu pir kes î bo min. Lê ez naxwazim bi nav bikim. Gotineke Albert Camus heye: "Hingê navê tiştêkî lê bû, ma ew tişt nehatiye windakirin?" Weke vê demê, em bi hevdu re ne, ev yek jî bextewariyê dide min, min bextewar dike...

- Peyvên te... hem xweşik, hem tahl...

Hewl dide ku tijebûna çavên xwe bi revandina nêrînên xwe jê xef bike.

- Bi gotineke din, tu dibî jêderka bextewarbûna min, pirî caran, jêderka hest û fikran...

Hingê Pelîn Melayê Cizîrî bi bîr tîne; piştî ku Mîr Imadedîn pê hesiyabû ku Melayê Cizîrî, bi navê wê demê şêx Ehmed dil ketiye xwişka wî û bi xezelên ku li ser wê gotiye diwançeyek aniye pê, ewil bi îmtihaneke Mela diceribîne û dû re jî biryar digire, dê xwişka xwe bidetê. Lê Mela, herê Melayê Cizîrî, hostayê eşq û sewdayê, mêrê bi vîn û azwerî vê napejîrîne, "Na" dibêje, naxwaze... Çima... bes çima? Pelîn dil dike ku yên di hişê xwe de derbibire, lê na, na heşbûn çetir e...

-

Çirûsîna stêrkan û ronahiya heyvê bi reşahiya herfîrî ya şevê re direqise...

Peyxam ji nav cihan derdikeve, radiibe û diçe li ber şibakeyê, şibakeya ku di navbera çar diwaran da libek e, destê xwe davêje destikê deriyê şaneşînê, derî vedike û li ber disekine, demekê li derve dinihêre, derve hêj tarî ye, lê rê dixuyê, şewqa hîvê li rê, dûmahîk şev; tîr û reş... reşahiyeke sermed... wek çavên belek û kûr ên Pelînê... Vedigere û li çavên Pelînê dinihêre, dû re li şibakeyê û dîsa çavên wî di nav çavên Pelînê de, di nav xwe de dibihurîne, çendîn dişibîne hev, tîr û reş û şewqa hîvê...

- Belê, hingê ez hebûna te li cem xwe hîs dikim, nermahiya tenê te hîs dikim dil û mejiyê min bi bextewariyê tije dibe, her tiştî ji bîr dikim, tenê bextewarî... tenê tu... Û hingê, di nav wê demê de viyana mirînê, defdana mirînê, fikra mirînê...

Ji şevê nefesê kûr hildide. Çavên wî li stêrka sibê, li Nahê rewneqdar ku di heman demê de bi navê Kerwankuj jî têtê zanîn, digere. Herê, li wir, li cihê. Û ew, ku wexteke wek vê stêrkê xuya kiribû. Ew keşik dîsa dikeve bîra wî: Ew keşika ku di zîmanekî gewre û kûr ê rojhilatî de wateya strana şevê vedigot... Ew nêrînên tije bi zanebûn, ew nêrînên gihîştî ku bi bihîstiyariyên jinê tije. Û ew hevokên rêzgirtî, bijarte... Qasî vê stêrkê xweşik, kêşwer û şeyda bû, ku pêl vèdiket, pêl dîtefa...

Ew roj ku li ser çavên xwe bi keskekî vekirî, lèvên xwe dîsa bi pembeyekî vekirî ku xweşikiya wan berbiçavtir dikir boyax kiribû, cara pêşîn bû ku ew weha dîtibû; weke ku tenê ji bo wî bû ew xeml û spehîti... Ew roj, êvara wê rojê piştî ew siwarî texsiyê kiribû, bi wê xeml û spehîtiya xwe li dû sekinibû heta ku ew ji ber çav winda bibe... Belê ew dem bû ku wateya stêrka Nahê gewretir kiribû. Bi xweşikiya xwe re ew jî, wê êvarê mînanî stêrka Nahê diçirisiya... Belê ew êvara ku ew eş, ew êşa ku nedîşibiya tu eşan, ew êşa ku bandora wê hê têra xwe xuya nekiribû ew êvar, li wê derê tovê xwe çandibû, ketibû hundirê wî. Ew dem bû ku dê wî bikêşaya binê bîra bêhestbûnê, ew dema tije bi hest wê deriyên dem ên bêhestmayînan vekira.

Gava li xwe warqilî, li hestên ku tê de bû jî fesilî û bi vî awayî kete nav jixwenerazîbûneke kûr û tarî.

Pelîn li odê mêze dike. Çavên xwe li hundirê odê digerin, tariya şevê sê dîwar bi nîvenîv vexwarine, bi ronahiyeke tenik ku ji deriyê şaneşînê derbasî hundir dibe dîwarekî bûye parçeyek ji hîvê, nêrîn li dawiyê tîn û li sermilên Peyxam ên tazî vedinişin. Devê girtî, lêvên zirav û ziwa, bêvila mezin û çav; çav bi bandora tevîhevbûna hest û ramanên ecêb her wekî ku li alemeke din temaşe dikin, bi nêrînen ku nayêne xwendin noqê tariyê bûne.

Li hember vê dîmenê dilgiriyeke xef bi pêlên xwe dest bi lêxistina dilê Pelînê kiribû. Bi hestên tîkel piştî xwe ji nivînê kir û pala xwe da balgîfê, porên xwe yên reş û dirêj mîna sûlaveke reş ji sermilan rijande ser her du memikên şîrspi. Qasî serberziya wê kovaneke tenik dest bi nixumandina bedena wê ya nazik kiribû. Piştî biskekê rahişte pakêta cixarê ku berê danîbû ser sêpa ya ber serê text. Nêrînen wê li ser çarşefê, cixarek vêxist, pêşî mijên kurt, dû re bi mijeke kûr singê wê hilhat... Hîzrên Peyxam ên der barê cixarekişandina wê de hatin bîra wê; bi hêrs mijeke dîn ji kişand û cixare vêkuşt.

Peyxam bêhna dûyê cixarê hildabû, lê dîsa ji tu livek ku dê vê yekê xuya bikira, nekiribû.

Pelîn bê hemdê xwe:

- Ji aramiya rewnakdar a şevê çî pir hez dikî!

Dengê bi gazin tîkiliya wî ya ku bi tarîtiya xwe re danîbû, bi nîvenîv diqetîne.

- Herê Pelînê, mîna jinan...

- Bi gelemperî, gava neçarî bi ser te de tê tu xwe dispêrî singê wê?

- Herê, di wê gavê de, em pêdiviya xwespartina penayekê dibihîsin. Û hingê, yan paşîla şevê, yan jî ya jinê digihîje hawara me...

Gava Pelînê rahişte kaxezekî ser sêpê, bédengiyê dîsa dest pê kiribû.

Li ser kaxez xebateke helbestê hebû, "jiyan... te go emr... min..." Bala xwe dayê ku bikare baştir bibîne, lê na, nedibû, sewaneyên reşkirî ku hê nehatibûne duristkirin tevîhev bûn û ji ber ku tarî bû nedihatîn xwendin. Saeta xwe ya ku ji zendê xwe derxistibû û danîbû ser du kîtabên tenik ên li ser sêpê, hilda, bo ku bişê bibîne ka saet bûye çend ji nêz ve lê nihêrî, bêhna wê hinekî dîn ji teng bûbû. Saet paş ve danî cih. Xwezî qet sibe nebûbûya, xwe bi xwe got. Îcar nêrînen wê semitîn ser kaxez, li jêr mejûyek nivîsandî bû, hinekî ji nêzî çavên xwe kir, nezî çar saet berê niha... Li ser peyvên pêşîn ku diyar nivîsibûn, ramî... Lêvên wê diliblibîn, gotinên wê ne zelal bûn, tenê wê bi xwe xwe dibihîst: Jiyan... jîn... hestên germ, hilavêtina dil û defdanên ku pêşî nayê hildan... Gelo mirov bişev êdî rihet têdigiha têgehên jiyanê, êdî rihet digihîst tahmên mahrem ên jiyanê; êdî xwe rihet dibihîst, ango, şev mirov dikişand nav xwe, dikir parçeyek ji xwe û di nav xwe de diheland?

Destên Pelînê bala wî dikişîne, ber bi wê vedigere:

- Ew ê di destê te de çî ye?

- Xebateke te ya helbestê, li vir, li ser sêpê bû. Lê ji tariyê naşêm bixwînim.

- Dema gihîst û diyar bûn tu yê bixwîni.

Hewayaya odê gelekî hênîk bûye. Peyxam, dîsa li derve dinihêre, çavên wî dîsa li ser stêrkan e, stêrkên ku

êdî ber bi windabûnê ne...

Destê xwe datîne ser singê çepê, dengê dilê xwe dibihîse, li siberojê ku hatina wê nêz bû, fikirî, keserek kûr dikişîne...

- Çî bû?

Bi hêdîka berê xwe dide Pelînê, li çavan dinihêre, çavan hemû wesfên mîbûnê di navbera mijangan de civandine, di serî de jî şewqet tê ku bêhtir hewceyê vê bû, nêrînen wî dikevin li ser goştê spî yê dawetkar. Demeke bê lebat welê lê temaşe dike, giraniya xweşikiyê laşê wî dinixumîne û dilê wî diguvêşe.

- Tu çima evqas xweşik î?

Pelîn, di bin çarşefê de, sermilên tazî û memikek, memikê wê yê rastê ji bin çarşefê xuya dike.

- Dê were, ez tî bûm...

Û ramûsan...

Ramûsanên sivik, li ser tenê bêhnxeş vedinişin. Peyxam dest davêje porên dirêj ên reş î herîrî û qevdekê dialîne çar tiliyan, çena wê hildigire nav diranan, hinekî dişidîne û berjêrî gerdenê dibe... sermil, binçeng, sing û sermemik; du lib tiriyê reş ê şil, ku ji navbera diranan dişemitin... cirîfîneke tenik, axîneke zirav... dûre her du dev dikevin hev, lêv bi aramî hevdu dimijin... Niha Pelîn, wî li ser pişt dizivirîne, her du destên xwe datîne li ser singê wî, xwarî guhan dibe û tişteki dipispisîne, ji zora peyvên diranan dişidîne, sing pihê hiltê û dadikeve, çend peyv, çend peyvên ku êrişî dilê wî dikin, dilê wî didin ber xwe; hest hildikêşin, ber bi lûtkeyan ve. Bi çar peyvên şehwetê hişyar dike Pelîn, dixwaze ku her tiştî bişewitîne... Bayê van çar peyvên, bayê germ arê şehwetê dide ber xwe, pêt û gurî bi leza bayê hildikêşin, hingê êrişî dibe ser lêvan, gewrî, qirik, singê bi pîrç, pîrçan hildigire navbera diranan û dikêşe, hetanî ku deng ji Peyxam bilind dibe, axîn pê dikeve, dûre bi lêvan berzikê wî hişyar dike... Hişyarbûn, weke daristaneke agir pêketî...

Û yekbûna bi tarîtiya şevê re...

Bi tevgerên wan, kaxez ê ku li ser balgîfê ye dikeve...

.....

jiyan

te got emr

min got keva newalê

keva newalê

te got hêza bayê û sergêjî

min got ketin

te got mirin

min got jiyan

te got ramîn û hezkirin

min got sermedî

te got jiyan

min got mirin

*** **

BEŞA FABLÂN

MERGANÊ (Fabla Yekemîn)

Rezoyê Osê

(1)
Hebû, nebû salekê
Gundek li ber palekê
Hem mirîşk û hem jî dîk
Lê dikirin kîklûkîk
Wan şevê reş û tarî
Sa dikir nobedarî
Yek Deqo bû, yek Quto
Yek Devreş û yek Tito
Xurtê wana Deqo bû
Jîrê wana Quto bû
Devreşo yê geza ye
Tito jî yê noba ye

(2)
Bi vî kar û îşê xwe
Bi vilik û pişê xwe
Nedihiştin ti teba
Ne jî roviyên qeba
Werin dora anîşkan
Bixwin dîk û mirîşkan

(3)
Rovî tev mane birçî
Çi çare ye bê qirçî ?
Merganê yek ji wa ye
Xwedya fen û fûta ye
Wê ba kire Roviyan
Hemî li hev civiyan
Hatin gotin pêşniyar
Teva girtin yek biryar:
“Merganê, her cem Segan
Bêje wan mîr û began
Barê we pir giran e
Çavên we li destan e
Hûn birçî û tazî ne
Bê kes û bê xwedî ne
Werin em ê bi hev re
Peymanê bidin jev re

Yek xwe bike fermandar
Kes reyînê neke kar
Fermanê bidin destan
Bes e, em û we westan”

(4)
Peyman bi hev re danîn
Ji hev re dane zanîn
Tiştê hebe bibe par
Ne serdest û ne bindar

(5)
Segan, piştî peymanê
Xweş gotine Merganê
Werin vî gundê çeleng
Bê his û bê qîr û deng
Hene tiştên dixwazin
Mirîşk û dîk û qaz in

(6)
Roviyan bê serêşî
Merganê dane pêşî
Fermana wê bi dest e
Ji kêfa ew sermest e
Êrîşeke xwe berdan
Bi lez û bê serhildan
Tito, bi dengê bilind
Ba kir: xerîb ketin gund!
Segan li wî vegerand
Reyîn, bêtir wî kulan
Ew kî ne, ew çi Tat in?
Xwe bigre, va em hatin.

(7)
Van Roviyan tirsonek
Bêcegerên bizdonek
Ji ber êrîşa giran
Peymana xwe nehildan
Bi kazîn û bi zûrîn
Bi hev re, tev de revîn
Ew derketin derî gund

Xwe jimartin çak û rind
Li Merganê civiyan
Bi ser wê de giriyan
Çim pela PEYMANê
Nedaxiste meydanê !

(8)
Wê Mergana Serheda
Rabû, bersiva xwe da:
“Ne gotin û ne peyman
têne bîra van Segan
Tanî Quto bibîne
Wê Deqo, min dirîne
Ta peymanê bixwînin
Wê çavên min derînin
Ew Devreşê dîn û har
Û Titokê nobedar
Wê çermikê laşê min
Kom bikin li serê min!”

(9)
Wilo, Rovî û Segan
Peyman kirin bin lîngan
Navê pelka peymanê
Bû “Deftera Merganê”
Wilo, êdî tê gotin
Tê kirîn û firotin
“Ma wê kî wê derîne
yan jî wê kî bixwîne!”.

* - Roviyan xirbêkî û segên gundekî
peyman bi hev re girêdan. Navê peymana
xwe kirin “Deftera Merganê”. Li gorî bend
û rêzên vê “Defterê”, wê Rovî nêçîrê li gund
bikin û nêçîra xwe bi segan re par bikin.

Gerekiya vê peymanê jî ew bû ku
Merganê, di destpêka êrîşê de, “Deftera”
xwe pêş segan bike, da li hev ewle bibin û ne
her rovi desthilatê zîyanên gund be.

Ev çîrok, bi helbestî, ji zarokan re, Rezo
hûnaye û navê Merganê lê kiriye.

DARISTANA BÊQRAL (Fabla duyemîn)

Emîn Sari

Hebû nebû welatekî dûr û dirêj, dûmahîya dinyayê
hebû. Ew welat welatê Daristan, av û çiyayan bû, lê belê
daristan û çiya ber şerê salan tera bera bûbûn. Navê
Daristanê Esmânî bû. Daristana Esmânî ji ber ku pelgên
darên sedsalê rengên xwe yê xweşik digihîştin esmanan,
navê wê Daristana Esmânî bû. Şerê salan hê jî berdewam
bû, her roj şevatek mezin dar, giya û heywanên
daristanê diqeland. Dûkêla şewatê li welatên dûr û
nêzik belav dibû. Daristan di dîroka xwe de ji aliyê her
cure heywanan ve devlemend bû. Şêr û piling, xezal û
hespên azad tev de dijîn. Jiyana xwezayî wek avên
daristanê di rê û rêbazên xwe de diherikî, qesra qralê
darastîne bi nav û deng bû. Qesir li ser girekî bilind, di

nava darên sedsalî de pir xweşik û fireh bû. Qralê dawî
şêrê boz, gelek adil û bi merhemet bû, lewre hemû
heywanên

daristanê bi rûmetî behsa wî dikirin. Lê mixabin ji
ber şewat û mirina heywanan şêr pir qehirî, ji qehran çû
ber dilovaniya Xweda. Pişt re hemû şêr, piling, xezal û
hespên azad hêdî hêdî ji daristanê koç kirin, çûn welatên
dûr. Piştî koçkirina mezin daristan demek dirêj bédeng
û bêsebir ma, piraniya niştocihên daristanê pir xemgîn
bûn, hin heywanên wek gur û roviyan ji gelek kefxweş
û dîlşa bûn. Piştî Şêr û pilingan koç kir daristan ma bo
gur û roviyan. Wan jî li gor kêf û heskirina xwe daristan
xistin bin destên xwe. Piştî demeke kêma hejmara wan jî
pir zêde bû. Di daristanê de hê jî şer berdewam bû.
Niştocihên daristanê êdî hinî şer û şewatan bûbûn, le
belê zilm û zordestiya gur û roviyan jiyana wan pir

zehmet xistibû. Rojekê kûsela pîr gihîşt kîvroşkê. Jê re got:

- Hevalê kîvroşk jiyân bi vî rengî nameşit, hewce ye ku em çareseriyekê peyda bikin.

- Rast e mamoste, lê belê li dijî gur û roviyên hovane ji destê me çî têt!

- Rastî ez tişteki difikirim lê belê hewce ye em ligel hemû niştəcihên daristanê civînekê bikin.

- Baş e mamoste ev ayîdê min. Ez ê heta sibê her kesî li şikefta mezin kom bikim.

- Bijî, her bijî!

Kîvroşkê bi lez û bez dest bi xebatê kir. Kûsela pîr jî hêdî hêdî ber bi şikefta mezin ve meşiya. Kûsel berî hemû heywanan gihîşt cihê civînê. Pişt re jî yek û yek heywanên di jî hatin û şikeft teji bû, kûselê dest bi axaftinê kir:

- Hevalno! Wek hûn hemî jî dizanin ber gur û roviyan derfetên jiyana me nemaye. Di daristana me de çî qanûn û çî peyman nemanaye. Gur û rovi her roj zêde dibin, zordestiya wan jî hed û hesaban derbas bûye hewce ye ku em çareseriyekê peyda bikin.

Her kesekî bi yekdengî got:

- Rast e mamoste. Lê belê çareserî çî ye?

Çareserî Qralê Daristana dût e. Hûn jî dizanin derdora me çî daristan neman, tenê li Daristana Dûr jiyana heywanan heye û Qralê wan jî Şêrê Mezin e. Qraleki bi aqil û edalet e ez bawer im dê alîkariya me bike.

Her kesekî bi yekdengî got:

- Pîr baş e mamoste, em alîkariya wî bixwazin.

Piştî nîqaşan kîvroşk hat wezîfêkirin û bi çepikan derket rêya dût û dirêj. Kêm çû, zêde çû, dût çû, nêzik çû, gelek tehlike derbas kir û dawîya rojan gihîşt Daristana Dûr, derket hizûra Şêrê mezin.

- Qralê Mezin, Xuda emrê te dirêj û welatê te serfiraz bike.

- Spas Kîvroşk. Kerem ke tu ji ku de tîyî, bi ku ve diçî? Daxwaza te çî ye?

- Qralê min, ez jî Daristana Esmanî tîm û alîkariya te dixwazim. Bawer im hûn jî rewşa Daristana me dizanin. Gur û roviyan çî qanûn û peyman nehêlane. Daristana me bîyî ser û mezin e. Hejmara gur û roviyan her roj zêde dibe, ji ber zordestiya wan hevalên me çî hizûr û ewlekarî nemaye. Ez wezîfedarê Daristanê me û alîkariya te dixwazim. Tu Qral î, tu mezin î û tu bi edalet î, êdî tu dizanî ...

- Bi xêr hatî Kîvroşk. Daristana we cineta li ser dinyayê bû. Lê belê mixabin hêrsa mirovan wek hemû deran Daristana we jî kambax kir. Ez rewşa we jî dizanim, lê belê bawer bike rewşa welatê min jî nebaş e, ez û çend hevalên xwe berxwedaneke mezin nîşan didin. Qralê we yê dawîn jî gelek bi nav û deng bû, hema li ser xatirê wî ez gelek hez dikim alîkariya we bikim lê belê nîzanim çî bikim?

- Qralê min, çareserî bi destê te ye. Em bêcare ne.

- Qral ji ber vê gotinê gelek xemgîn bû. Hinekî fikirî û Şêrê bîxîret hat bîra wî û kêfxweş bû.

- Kîvroşk ez ê Şêrêkî bidime gel te, ev Şêr pîr bîxîret e, ew qas bîxîret e ku xwarina wî her dem aîdî malbat û

hevalên wî ye, lê belê gelek qurnaz e. Êdî hûn û Şêrê bîxîret bi hev re ne. Herin riya we vekirî be.

Kîvroşk destê Qralî maç kir û xatir xwest. Wezîr û kîvroşk bi hev re çûn mala Şêrê bîxîret. Şêr ji xewek kûr û ji nava xewnên teji xwarin hişyar kirin, wezîr kêr û zêde gotinên Qral bo Şêrî got û tîra riya wan xwarin jî da gel wan. Kîvroşk û Şêr derketin rê. Kêm çûn zêde çûn, dût çûn nêzik çûn, ji ber bîxîretiya Şêr gelek giro bûn û dişa jî gihîştin Daristana Esmanî. Niştəcihên daristanê bi dehan roj bû ku li benda Kîvroşkê bûn. Gava ew û Şêr dîtin gelek kêfxweş bûn, çepik lêdan, çûn ber Şêr û gelek qedrê wî girtin. Şêr ji ber vê pêşvaziyê gelek kêfxweş bû got:

- Hevalno! Ez gelekî westiyame, bi destûra we ez ê hinekî razê, hûn jî hêdî hêdî qesra Qralê xwe temîr bikin. Heta hûn qesrê xilas bikin ez ê jî hişyar bim em ê tev de gur û roviyan rateqînin.

Şêr çû odeyekê qesrê û raza, yê din jî dest bi xebatê kirin. Şêr bi rojan raza û yê din jî bi rojan xebitîn, qesr nû kirin, pişt re Şêr hişyar kirin. Şêr qesr gelek begem kir û jî hemwelatîyan re got:

- Hevalno! Dest û tiliyên we sax bin, qesr gelek xweşik çêbûye. Niha jî em ê civînekê çêkin, di serî de gur û rovi hemî kesî li ber derê qesrê kom bikin.

Kîvroşk û hin hevalên wê bi lez û bez ketin nava daristanê. Di serî de gur û rovi, her kes bi gotina; "Hevalno! Hişyar bibin, wezîrê Qralê Mezin teşrîfa daristana me kiriye û hemû niştəcihan gazî ber derê qesrê dike. Hişyar bibin, hişyar!" gazî ber derê qesrê kirin. Gur û rovi gelek nerihet bûn, lê belê ji ber tirs û meraqa xwe çûn ber derê qesrê.

Şêrê bîxîret li ser kûrsiyekî rûnişt, rast û çepên xwe bo gur û roviyan veqetand. Kîvroşk û kûsel wek alîkarên wî hemû gur li rexê rast, hemû rovi jî li rexê çepê rêz kirin, heywanên di jî belav kirin nava baxçe. Şêrî dest bi axaftinê kir:

- Rojbaş hevalno! Ez wezîrê Şêrê Mezin im. Hûn dizanin paşayê min paşayekî mezin û bi edalet e, pîr hez ji alîkariya xizanan dike. Paşayê min bihistiye ku daristana we bê ser û bê rêxistin e. Ma daristaneke bê ser û bê qanûn bi rê ve diçe?

Her kesekî bi yekdengî got:

- Na na!

- Pîr baş e. Ji ber vê çendê paşayê min, paşayê mezin ez wezîfedar kirim ku ez daristana we bi rêk û pêk bikim. Lê belê ez temaşe dikim ku di nava we de gelek heywanên bi rûmet, hêz û berketî hene wek gur û roviyên hêja. Cihê ku gur û roviyên hêja lê hebin behsa rêberiya min nayê kirin.

Bi van gotinên Şêr gur û rovi gelek kêfxweş bûn. Porê wan bilind û guhên wan mût bûn. Şêrî berdewam kir:

- Hevalno! Ne hewce ye ez axaftina xwe dirêj bikim, ji bo pêşeroja daristana we em mecbûr in qraleki hilbijêrin. Qraleki ji nav gur û roviyan. Lê belê ji nav guran gurekî, ji nav roviyan jî roviyekî.

Şêr zivirî gur û roviyan got:

-Hevalên gur û rovi ji bo we du roj muhlet, hûn di nav xwe de namzetekî hilbijêrin. Gur

gurekî, rovî roviyekî. Baş e!
Hemûyan bi yekdengî got:
- Pir baş e.

Civîn qediya. Gur û rovî kêfxweş, pozbilind ber bi malên xwe ve çûn. Her gurek û her roviyek di dilê xwe de namzetê herî baş bû û her yekî ji wan jî xwe di qesrê de xeyal dikir, hêviya her namzetekî ew bû ku hevalên wî, wî namzet diyar biket, lê belê heya malên xwe kesekî deng nekir. Gurê herî pîr neçar ma dest bi axaftinê kir.

- Hevalno! Ev şêr, şêrekî pîr bi aqil e. Di heman gavê de bo qraliyê em û rovî diyar kirin. Rovî ne mesele ne, cihê gur lê hebin ma behsa roviyan tê kirin? Lê belê ji nav guran gurekî! Kîjan gur? Ma we hemûyan jî dît Şêrî bi îşareta çavan ez nîşan dam. Lewra ez gurê herî xwedîterûbe û herî aqilmend im, ma qralî ne heqê min e?

Hemû gur hêrs bûn, çi kesekî gotina gurê pîr erê nekir. Ev car gurê ciwan dest bi axaftinê kir:

- Hey, hey, pîrese. Tu kî qralî kî? Tu here ser çemî masîvaniyê bike. Qralî gor kesekî şibî min ciwan û xwedîhêz e. Ma ji bilî min kesekî din heye layiqî qraliya daristanê?

Hemû guran bi yekdengî got:

-Ez, ez, ez, ez...

Gurê pîr û gurê ciwan bi hev ketin, dûre jî hemû gur bi hev ketin. Şêrekî mezin qevimî û du rojan berdevam kir. Dawiya du rojan gelek gur telef bûn, hin jî wan jî seqet bûn ketin bin dar û beran. Axîn û nalîna guran li hemû daristanê belav bû. Rewşa roviyan jî ya guran kambaxtir bû, dawiya şêrî hejmara wan jî pîr kêmbû û gelek jî wan jî bi giranî birandar bûn, dîsa jî gava dema wan xilas bû çar rovî û çar gur bi axîn û nalînan ber bi qesrê ve çûn cihê xwe girtin.

Şêrî dest bi axaftinê kir:

Hevalno! Dema me tamam bû. Lê belê gur û roviyên me hemû nehatine.

Zivirî gur û roviyan.

- Gur û rovî, hevalên we bo çi nehatine?

- Ezbenî qet nepirse. Nexweşiyek ket nava me. Hemû hevalên me di nava nivînan de ne. Lê ne xem e, em amade ne.

- Pir baş e. Ji nav guran kîjan gur hat hilbijartin?

Her çar guran bi yekdengî got:

Ez, ez, ez...

Her çar gur jî di şêrê navxweyî de birîndar bûbûn. Yek jî wan zikdiryayî, yek kor, yek topal, yek jî pozê wî şikestî bû.. Şêrê bexîret di bin simbêlan de kenî û jî gurê zikdiryayî re got:

- Gurê zikdiryayî, tu jî namzet î an ne?

- Belê ezbenî, ez jî namzet im.

- Guro zikdiryayiyo ma qet qralê zikdiryayî çêdibe?

Paşê zivirî gurê topal û got:

- Gurê topal ma qey tu jî namzet î?

- Belê ezbenî.

- Guro topalo ma qey te li çu deran qralê topal bihîstîye? Na na qralê topal qet nabe.

Şêrê Bêxîret, piştê gurê kor û gurê pozşikestî jî bi heman gotinan jî namzetiyê dûr xistin û zivirîn roviyên birîndar. Roviyan qurnaz jî ber ku halê guran ê bêhal bi çavên xwe dîtin hinek qurnazî kirin.

- Ezbenî cihê şexsiyeta we amade bit, ma qet behsa qraliya roviyên reben tê kirin! Jixwe qralî heqê we ye. Eger şexsiyate we ya mezin me layiq bibîne em namzetî wezîriyê ne.

Her çar rovî jî wek guran birîndar bûn. Yek didanên wî şikestî bûn, yek kilika wî qediya bû, yek guhek wî, yek jî her du guhên wî jêbûbûn. Şêrê bexîret jî roviyê qurnaz re got:

- Na na roviyên bi rûmet, heq heqê we ye, lê belê ez ji ber daristana we xemgîn im, ma daristana we qralekî wek hevalê te bêkilik heq dike?

Rovî kêfxweş bû:

- Ma qet çêdibe paşayê min?

- Ne we ye? Paşê qet qralê didanşikestî wek hevalê te yê din çêdibe?

- Qet nabe ezbenî!

- Pir baş e. Ma qey qralê wek hevalê te guhek wî jêketî çêdibe?

- Qet nabe paşayê min.

- Ê roviyê xwelîser! Ji ber ku her du guhên te jî qetiyane qraliya te qet qet nabe.

Rovî jî ber germahiya bedena xwe haya wî qet jî guhê wî tune bû. Destê xwe bir serê xwe, fam kir ku her du guhên wî jî qetiyane. Pir şermezar bû, qet dengê wî derneket. Şêrê bexîret ev car bo hemû heywanan axivî:

- Hevalno! Min xwest ez qraliya daristana we bixim destê we, lê mixabin kesekî/e ku qraliya we biket nemaye. Ji ber vê çendê qraliya we ez ê bikim.

- Her bijî qralê me, her bijî...

- Spas hevalno. Hûn dizanin her qralekî wezîrên wî hene. Min jî bo wezîriyê kîvroşk û kûsel hilbijartin. Gur u rovî jî piştî niha jê berpirsiyar in xwarina Qesrê...

- Bijî paşayê me, her bijî...

Hemû heywanan destên xwe dane hev û du û stran gotin. Sê şev û sê roj şahî kirin. Gur û rovî jî ketin malên xwe, axîn û nalîn berdan ser dilên xwe. Ew negihîştin miraza xwe ma em çi bikin?

MIH Û BIZIN (Fabla Sêyemîn)

Îdrîs GOKSUN

Rojek ji rojên biharê
Danê bervî êvarê
Li herema Têrkani*
Çil mih û şeş beranî
Diçêriyan li çiya
Dixwarin çilo û giya
Gav nivtêr gav ji birçî
Roj bi roj li wan diçî
Lê nedikirin tu gazî
Şivan ji wan pir razî
Pez dihêla li çiya
Diraza li bin siya
Hebû bizinek bêxwedî
Ji dûr ve koma pez dî
Dît û dilê xwe bijand
Lê rika wê erd hejand
Jimart çil û şeş serî
Behcî û qeherî
Qebûl nekir dilê wê
Şeytaniyek hat hişê wê
Got 'ez ê biqetînim yek ji pez
Bibim têxim nava rez
Bixwin bi hev re em mêwan
Ta ku dibîni rezvan
Gava rezvan berdame
Ez ji mih jêhatî me
Wê hilkişim bi benda
Bifirim wekî kunda
Mihê bigre wê rezvan
Yan ê qelîke yan qurban'
Bizin rabû ji ciyê xwe
Tev şeytaniya di serê xwe

Bi fesadî û kêfxweşî
Ber bi miha ve meşî
Dît ku razaye şivan
Wê ji xwe kir nav mihan
Çû cem miha stûreş
Bi devê ken qisê xweş
Got 'xwişka miha belengaz
Min dît tu bûyî lewaz
Dilê min pir şewitî
Kezêba min peritî
Min got ev ne qeder e
Tu bide dû min were
Biqetî ji nav pezan
Herin têkevin rezan

Em ê bixwin bi dilê xwe
Wê bigerin bi serê xwe
Bila cejn ke hûrê te
Kes nedoşe ji şîrê te
Li vî çiyayê rût û zuha
Ê bimrî heta çend meha
Dîsa tu û dilê xwe
Min gote hevaltiya xwe'
Bizinê mih xweş xapand
Hişê serê wê revand
Rabûn her du hêdika
Qetiyên ji pez dizîka
Hatin ji xwarê ji çiya
Çûn nav rez ên Bûtalbiya**
Mih ji tirsan dileyizi
Yekem car diket nav rezî
Ne dixwar ji pelên mêwan

Diricifî wek kewan
Bizinê mih dît wek çûkan
Ji kêfa da lotikan
Dît ku rezvan tê ji jor
Hate revê îcar dor
Mihê hêla di nava rez
Bo ku rezvan bike gez
Ber bi bendê ve revî
Ne got kevir ne devî
Hat ber bendê çav zît kir
Hêz da xwe û xwe çit kir
Lê lingê xwe bend negirt
Ser piştê erdê vegirt
Bend ser wê ve hat xwarê
Xwe xelas kir bi zorê
Lê nikaribû bilivî
Rezvan tê ew birevî
Mih hat sera bihurî
Hinek çû li paş nêrî
Got 'te min derxist ji nav pez
Hanî kirim dizê rez
Paşê pişt da min revî
Nizanibû wê bikevî
Te bi dubendî û şeytanî
Dawîya emrê xwe hanî
De hadê xatirê te
Way hate celadê te'

*Têrka: Eşîr û herêmeke li ser erdnîgariya Amedê ye.

**Bûtalbiya: Gundekî Têrkaniyê ye.

BEŞA HELBESTAN

DILOPEK
(*Helbesta Yekemîn*)

Şevger JAKAW

(Û ji wê rojê de Eyûbek im ez...)
Çend roj derbas bûn?
Çend guleyên demê li pêşeroja min ketin?

Her rojekê bi diranên wek çiyayan mezin min dicût.
(aş nedibûm)
Zilika giyanê min hindik maye biqete. Dûr û dirêj li ber xwe dikevim.
Dem mîna zîbeqê ji nav lepê min diherike. Ne ku ez nabînim, bê çawa digindirim, difirfirim. Çavê min vekirî li meytê xwe dinêrim. Bêhna kurmên ducanî jê difûre.
Barebara gêrîkan e, bi serkeftina xwe şa dibin; serê min wek qûtê salê bijartine, li pey xwe dikişkişînin. Gêrîkek di neynika çavê min de porê xwe şeh dike,

xuya ye ku qehpik e; du doxînsist di lûleya pozê min ya çepê re bi awiran rahnên wê dialêsin.
Demûşeke zingari ji ferqa serê min diherike, çend saetên xurde bi xwe re kaş dike.
Ez aniha talana welatekî me. Siwariyên demê li cerda min xistine. Bi postê berxika min a herî biçûk û xweşik ji xwe re berçavkek çekiriye mîrê siwaran.
Mîna berîkeke qul bê bir im. Hebên tizbiya pîra min, (ku min bi wê roj diguravt) welat bi welat teriqîne.
Nexşa nasnameyê kovî, bi hestiyê demê yê herî pîç û pûç, di keviyekî hişê xwe de dikolim: min qet niyet tune vê şivanxapînokê ji bir bikim.
(bê sebir li hember teqteqa kenê şaristaniya devkox sebir dikim!
Bê nasname, bê ziman, bê diran...)
Ji dûr ve daholek lê dikeve. Dengê wê yê ker di kertîneka guhê min de, di şikeftên mêjiyê min de olan dide. Çend berbû li ber direqîsin: betilî û şerpeze. Nigên xwe li daweta şaristaniyê ji bir kirine.

Dem ji nişka ve felqe dibe. Çavên min ji navika xwe ya herî biçûk dirjên erdê. Di nav tozê de neynikeke şikestî ye çavê min. Zarokek bi tifa xwe wê bi hev dizeliqîne û soz daye ezmên ku wê ji şivanekî re wek xelata zavatiyê bibe.

Hîn ji neynikeke şikestî ye çavê min, zarok li ber xwe ketiye.

Û di perçê wê yê herî biçûk de qublenameyek çav li min dişkîne. Digirîm.

Hûn li ser çi digirîn?

Dema ku hêlînên we di dîlana agirê wan de difetisîn, hûn giriyan.

Dema ku pezê we dabeliandin, hûn giriyan.

Dema ku bûkaniya we gulebaran kirin, hûn giriyan. Darên we sersewrkî çandin.

Devê kaniyên we girêdan, bi mîza xwe rojîya wan şikandin.

Hirmiyên we bi xweliyê seyinandin.

Sêvên we bi fisagur re mehr kirin.

Hûn cardin giriyan.

Serê we li ser tekerê dîrokê.

Nigê we li hewa.

Hûn çûn.....

Li pişt we tevrikekî mezêlê xwe dikola, we nedît.

Çend tenûran xwe bi dûxana xwe fetisandin, we nedît.

Çend teyrikan şaxên bin xwe bi baskê xwe jê dikirin. Qederê girêk li qirika xwe dixist; ew kepira we bû

We cardin nedît.

Zimanek...

Bi hezaran darên xwe

Bi milyonan pelên xwe

Bi hezar barên qantiran rehên xwe

Li pey we

Ji bo we li ba dikir,

kelogirî dibû, yek bi yek bêjeyên xwe dicût û her ku dicût tewla we kintir dibû...

Ma çima we nedît?

Ma çima hûn nabînin?

Bihostek zemîn ji ji bo wî naherimînin?

(diramim, di xewnekê de tixûbê kerba xwe nas dikim: hestiyê şaristaniyê diran û çermê wê benîşt e di devê min de)

HEBÛN Û TUNEBÛN

(Helbesta Duyemîn)

Xecê Omerî

Bi bawerzîna ba re, ji hêlîna li serê dara berûyê

Bi firê ketin xewnên me yên baskokirî

Qirînên ji tîna ketî

Li ser rûbarên çikiyayî li hev dicivin

Ji helkehelka giyana me ya westiyayî

Murxên şînê belav dibin li ser daristana şewitî

Stembar in teyr û tûr

Bê cî û bê war in dengbêj, fafik in îro

Di dîwanxaneyên xirbe de veşarî man

Meselok û xemşok.

Di heqîba dîrokê de lînûska qedexê ye hebûn!

Serî hildide pênûsa lal,

Û vedireşe bi ser rabirdûyê ve

Dineqîşîne gîzê bûkê

Dinahwirîne klamên Zeynikê

Lê naqedîne.

Naqede strana lehengên raperîna hebûnê

Naqede koça ku bê wext di dilê axê de diseride

Va ye hehecîkên zarokatiya me ji bi firê ketin

Û silavan li xewnên me dikin...

NETIRSIN

(Helbesta Sêyemîn)

Welat DILKEN

Netirsin, çirayên xwe vêxin

Perdeya tariya tirsê bidin alî.

Netirsin, ta dawiyê vekin deriyên xwe

Û

Sofreya mêvanperweriya netirsîyê raxînin.

Netirsin...

Netirsin, hevsarê dilsoziya xwe berdîn

Û

Bi hembêza kenên xwe

Û

Bi zimanê nezî dil germ bikin

Rûyê min î serqot

Û

Bi gotegotan bitamijînin nîvşevê.

Netirsin, tûrikê min bi bermahiyên xewnên xwe dagirin

Û

Min bi wêrekî di şefaqê de bi rê kin.